NÛDEM

No 29 1999

Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

❖

Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor
Firat Ceweri

❖

Hejmar 29, sal 8
Bihar: 1999

❖

Şerdên abonetiyê (salek)
Swêd: 240 Sek
Skandînaviya: 280 Sek
Ewrûpa: 100 DM
Amerîka, Australia,
Kanada: 50 $
Institution: 290 Sek

❖

Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964

❖

Wêneya bergê: Bahram Haco

Çapa bergê:
Jakobsbergs Tryckeri

❖

Pergala bergê û rûpelan:
Nûdem

❖

Adres: NÛDEM
Box: 177
177 23 Järfälla-Sweden

❖

E-mail: nudem@telia.com

❖

Tel û Fax: 8-580 131 62
8-583 56468

NAVEROK

4	Zimanê kurdî nasnava kurdan e ❖ **FIRAT CEWERÎ**
8	Çar şiîr ji ❖ **SABAH KARA**
13	Keçika Misilman ❖ **IVAR LO-JOHANSSON**
	Werger: **SERDAR ROŞAN**
28	Guno! Guno! ❖ **ROJEN BARNAS**
29	Jan ❖ **RÊNAS JIYAN**
35	Edebiyat an ji kultur ❖ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
50	Du şiîr ji ❖ **OSMAN MEHMED**
55	Du kovar ❖ **HAFIZ QAZÎ**
58	Mitirbekê bajar da hev ❖ **KAWA NEMIR**
59	Nemir ❖ **HUSEIN MUHAMMED**
63	Xwe bibexşîne ❖ **UMAY UMAY** Werger: **DILDAR ŞEKO**
65	Bahram Haco ❖ **MEDENÎ FERHO**
76	Piştî çûna te ❖ **CEMÎL DENLÎ**
77	Êş ❖ **MUNZUR UZUN**
78	Dilşewitiyê kultura kurdî ❖ **SILÊMAN ALÎ**
85	Êşa kevin ❖ **REMEZAN ALAN**
86	Nivîskarê swêdî yê ku zimanê kurdî afirand ❖ **MÛRAD CIWAN**
90	Generalê bênefer ku xwe tiştekî dihesibîne ❖ **MEHMED UZUN**
97	Bipê ❖ **ZEKÎ SEYDA**
98	Jiyan û ramanên Celadet Bedir-Xan ❖ **N. ZAXURANÎ**
114	Peyxamberê Ummetê Hz. Muhemmed ❖ **Z. ZINAR**
118	Kurdên Stenbola kevin ❖ **MEHMET AKTAŞ**
122	Granatäppelblomning ❖ **INGMAR BJÖRKSTÉN**
125	Bi kurtî danasîna hin weşanan ❖ **NÛDEM**

ZIMANÊ KURDÎ NASNAVA KURDAN E

FIRAT CEWERÎ

Gelî kurdan!
Eger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin û bi hevaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Dr. N. Zaza

Niha, gava ez van çend rêzan dinivîsînim, hê jî Abdullah Öcalan li Girava Îmraliyê girtî ye. Em nizanin bê ew di çi rewşê de ye, lê wêne û dîmenên ku ji aliyê karbidestên dewletê bi riya çapemeniyê hatine belavkirin, ji ber çavan naçin. Dewlet bi girtina Öcalan payekê dide xwe û dixwaze wilo bide bawerkirin ku bi girtina Öcalan ew agirê gur vemirandine. Lê piştî girtina Öcalan agir gurtir bûye; her kurd, çi nêzîk çi jî dûrî nêrînên Öcalan, bi wan wêne û dîmenên Öcalan êşiyane û xwe dixin şûna wî. Vê yekê kurd ber bi hev anîn. Ez nizanim bê ev berbihevhatina kurdan wê çiqasî bidome, lê tiştê ez dizanim wê ev çîrok hê jî bidome. Herçiqas serê vê çîrokê ji bîra nivşê nû çûbe jî, lê dawiya wê dirêj e. Ev çîrok rastiyek e, ev rastî jî pirsgirêka kurd e. Îro, aktorên ku di vî fîlmî de rola sereke lîstine, dixwazin bi girtina Öcalan kevirekî deynin ser vê meselê û dîsan vegerin salên destpêka avakirina Komarê. Ji ber ku van demên dawî ez bi dîqet bala xwe didim televizyonên tirkan, ez li nûçeyên wan temaşe û guhdarî dikim, loma ez tu hêviyê di tu kategoriyên tirkan de nabînim. Hemû kanalên televizyonên wan bi zi-

manekî dipeyivin, hemû rojnameyên wan bi zimanekî dinivîsînin, hemû partiyên wan yên siyasî xwediyê eynî nêrînê ne. Nêrîn jî ya eskeriyê ye. Îro, di bin navê pluralîzm û demokrasiyê de welat ji aliyê eskeriyê ve tê îdarekirin, eskerî jî hêza xwe ji îdeolojiya kemalîzmê digire. Herçî kemalîzm e, bûye mîna fanatîzma dînî, hemû rê xetimandine û li pêşiya demokrasî û pirdengiyê bûye bendek. Tiştê ecêb ew e ku piraniya tirkan dixwazin vê bendê biparêzin û ji bo parastina vê bendê jî azadiya xwe didin ber lingan. Mirovê ku li hemberî azadiya xwe ya fikrê bêhurmet be, ew dikare zû bi zû koletiyê qebûl bike û guhertinên civakî û siyasî jî bi mirovên ruhkole naçin serî. Îro, desthilatdarî di destên ruhkoleyan de ye û loma ew nikarin û naxwazin rastiyê bibînin. Nizanim, dibe ku jî ew rastiyê wilo dibînin. Dibe ku jî ew bawer dikin ku miletekî bi navê "kurd" tuneye. Kurd jî tirk in û neyarên Tirkiyeyê her tim vê belayê bi serê Tirkiyeyê de tîne. Ger ne wilo bûya, gava di çavîkên televizyonan de, gava li hemberî mirovan dipeyivîn diviyabû rûyê wan sor bibûya. Ji ber ku gava yek dereweké bike rûyê yekî sor dibe. Û înkarkirina miletekî, kulturekê, zimanekî dereweke mezin e. Îro, şûrkêşên van derewan pirtir bûne û ji bo ku çend rayên zêde bigirin bi hev re ketine qayişê. Li gora wan problem ne problema kurdî ye. Ev lîstikeke neyarên wan e û niha dawiya lîstika neyaran hatiye, piyonê vê lîstikê hatiye girtin û di destê edaletê de ye. Bi cezakirina wî re wê ev mesele vemire.

Sibe dora yên din e. Ew ne hazir in, ew kesî qebûl nakin. Ew li dûv dawîanîna vê pirsgirêkê ne. Loma dixwazin dest bi projeyên aborî bikin. Rast e, welatê me, li gora beşên Tirkiyeyê yên din, ji aliyê aborî ve li baş maye. Fabrîqe lê kêm in, bêkarî pir e, feqîrî zêde ye. Dema ku pêwîstiya welêt bi rastî jî ji alîkariya aborî û pêşketinê re hebû, karbidestên Tirkiyeyê guh nedidanê. Heta, gava mirov li weşanên kurdan yên berî salên heftêyî dinêre, mirov dibîne ku rewşenbîrên kurdan ji dewletê gazinan dikin û jê dixwazin ku ew li "Rohilatê" riyan çêbikin, fabrîqeyan ava bikin û insanên welêt ji belengaziyê rizgar bikin. Dewlet îro dixwaze van xwestekan bi cih bîne, ew jî bi tenê soz in; wê bi rastî bike neke, ne diyar e. Lê bike wê bi kêrî çi bê? Ya ku ew bi rastî dixwazin bikin ne projeya aborî ye, lê seferberiya asîmîlasiyonê ye.

Ev seferberiya asîmîlasiyonê herçiqasî nû xuya bike jî dîsan ne tiştekî nû ye. Ew bingehê Komara Tirkiyeyê pêk tîne. Komar li ser înkarî û bi

înkariyê ve girêdayî asîmîlekirina gel û neteweyên cihê pêk hatiye. Bi slogana nijadek, neteweyek, zimanek, alek; hemû nijad, netewe, ziman û alên gel û miletên din hatine qedexekirin, ji wan hemûyan nijadê tirk hatiye holê. Ya rastî ji nijadê tirk wêdetir îdeolojiya tirkîtiyê bûye desthilat. Û ev îdeolojiya tirkîtiyê ji destpêka avakirina Komara Tirkiyeyê ve bûye çeka Komarê ya herî xurt. Komarê bi vê çekê endamên gelek gel û neteweyan di nava xwe de helandine, yên mane jî li ber helandinê ne. Li ber helandinê ne, lê hê jî kurd neheliyane û bi xurtî li ser lingan in. Ji bo helandina kurdan, ji bo nehiştin û jinavêrakirina ziman û edebiyata kurdî, karbidestên dewletê her tim polîtîkayeke nemirovane meşandine. Kurdên ku cih bi cih serî hildane ji aliyê dewletê ve hatine temirandin, serok û birêvebirên serîhildanan hatine bidardekirin û piştî temirandina her serîhildanê dewlet dîsan vegeriyaye polîtîkaya xwe ya bingehîn. Polîtîkaya dewletê ya bingehîn jî polîtîkaya asîmîlasiyonê ye. Yanî qedexekirina zimanê kurdî yê bi devkî û nivîskî ye, qedexekirina weşanên bi zimanê kurdî ye, girtin û zîndankirina gerînendeyên weşanên bi zimanê kurdî ye. Ji ber ku li gora desthilatdarên dewletê miletek bi navê "miletê kurd" tuneye, zimanek bi navê "zimanê kurdî" tuneye û her kesên ku di nava sînorên Tirkiyeyê de dijîn "tirk" in. Ev gotinên ha ne bi tenê ji devên desthilatdariya leşkerî derdikevin, lê herweha ji aliyê zimanzan, profesor û alimên Tirkiyeyê jî tête îdiakirin. Wan di vê derheqê de bi sedan kitêb nivîsandine, bi sedan programên televizyonan çêkirine û dîsan bi sedan civîn û semîner li dar xistine. Ew dixwazin li gora xwe, yanî bi ilmî bidin isbatkirin ku zimanek bi navê zimanê kurdî tuneye. Ew dibêjin zimanê kurdî devokekî zimanê tirkî ye û ji ber ku kurd li çiyan mane zimanê wan xerab bûye û wan li gora xwe zimanekî herêmî ku ji çendsed gotinan pêk tê, ava kirine. Ew, entelektueliya kurdî jî bi jariya zimanê kurdî ve girê didin û loma kurdan wek mirovên hov û lipaşmayî dibînin. Rast e, entelektueliya komekê, an jî ya miletekî dikare bi zimanê wê komê an jî wî miletî were pîvan. Ger bi gotina wan zimanê kurdî tenê ji du sed, sê sed gotinî pêk were, zanebûn û têgihîştina kurdan jî wê bi qasî wê be. Yanî wê întelîgensiya kurdan bi qasî ya zarokekî yek salî, du salî be. Erê, min bi xwe wê êvarê ji televizyona tirkan TRTê, ji devê profesorekî tirk bihîst ku zimanê kurdî ne ziman e û ew bi tenê ji çendsed gotinan pêk tê. Niha, gava ez di ferhenga tirkî ya "Türk Dil Kuru-

mu" de li gotina kurd digerim, ez pêrgî vê şiroveyê têm: "*Kürt: Soyca Türk olup dillerini değiştirerek bozuk bir Farsça konuşan, Türkiye, Irak, İranda yaşayan bir topluluk adı ve bu topluluktan olan kimse.*" Kurdiya wê ev e; Kurd navê komikeke ku bi eslê xwe tirk in, zimanê xwe guhertine, bi farisiyeke xerab dipeyivin; li Tirkiye, Îran û Iraqê dijîn û navê endamên ji vê komikê ye."

Gotinên ji van gotinan sosrettir ji bo kurdan û zimanê kurdî hatine gotin. Celadet Bedir-Xan di nameya xwe ya ji serokkomarê Tirkiyeyê Mustefa Kemal re bi mînak behsa zimanzan, alim û profesorên wî dike û cehalet û rebeniya wan radixe ber çavan. Di wê demê de, wezîrekî Mustefa Kemal gotina "kurd" tîne maneya "cahil, çiyayî û rêbir." Herweha li ser zimanê kurdî alimekî Mustefa Kemal van rêzan dinivîsîne: "Dîroka zimanê kurdî ne diyar e. Ew di dîrokê de, di demên cihê de di bin tesîrên cihê de maye. Di nava hemû êl û eşîran de gotinên hevbeş gotinên tirkiya kevin û farisiya nû ye. Herçî gotinên ku ji zimanên din hatine girtin, li her herêmê cihê ye... Divê mirov ecêbmayî nemîne ku devoka tirkên çiyayî ewqasî hatiye guhertin. Heta ev hindik e jî. Ji ber ku ev tirkên çiyayî bi donzdeh nifşan di bin tesîra medeniyeta farisan de mane."

Li gora ku Celadet Bedir-Xan bi lêv dike, ev alimê xwediyê van gotinên li jor, Dr. Frîçê alman -dibe ku jî tirk be- ji xwe re bingeh digire û bi niyeta înkarkirina kurdan dibêje ku zimanê kurdî bi tenê ji 300 gotinî pêk tê.

Ji ber ku îdiayên bi vî babetî gelek in û piraniya van îdiayan ji aliyê we xwendevanên birêz ve têne zanîn, ez naxwazim bi mînakên weha serê we biêşînim. Lê ez dixwazim di bîra we de bînim ku karbidestên Tirkiyeyê -yên ku demekê behsa realîteya kurdan dikirin jî- îro, bi taybetî piştî girtina Öcalan, wan gotinên xwe inkar dikin û li îdiayên inkarkirina kurdan û zimanê kurdî vedigerin.

Kurd jî dikarin tiştekî bikin; li her derê, li kuçeyan, li qehwexaneyan, li mehkemeyan, di nava xwe de, di weşanên xwe de, di jiyana xwe de zimanê xwe bi kar bînin û bi vê riyê bigihîjin şexsiyet û nasnava xwe.

Bi hêviya di her warê jiyanê de bikaranîna zimanê kurdî, ez cejna we ya Newrozê ji dil pîroz dikim. ✍

Çar şiîr ji Sabah Kara

Min hesretê kûr ajot erd çiriya

Min hesretê kûr ajot erd çiriya
Ji başûr heta bakur
Ji rojhilat heta rojava
Ez ji Îsa pênc sal pîrtir
Ji Muhemmed ciwantir im
Di nav dêr û mizgeftê de
Û ne li vir im
Ne li wir im
Ji çar hêlan çarmîxkirî
Bi dilê xwe
Bi mêjiyê xwe
Bi piyê xwe
Bi destê xwe
Min dilê xwe kûr ajot
Min mêjiyê xwe vekir
Ji belayên taybetî re
Ax ji bin piyê min herikî
Min çermê xwe jixwekir
Bi zanînê
Bi dîtinê
Bi bihîstinê
Jiyan qaşûlê xwe jixwekir
Çilmisî û hişk bû di cihê xwe de
Min evînê kûr ajot
Li dora dewlemendan digeriya
Li dora heykelên bêdil û bêmêjî Leyla
Bi şox û şengî ez wêran kirim
Ez hiştim di vê çola bêbinî de

Evîn çermê xwe jixwekir
Çilmisî û hişk bû
Di nav qûma vê çolê de

Min jiyanê kûr ajot
Îdeolojî teng bûn
Mûsa ez ji behrê derbas nekirim
Riya Misrê bi xwe re biribû Yûsif
Min jî nedît mîna Îsa
Hilweşîna dîwarê Romê
Dibe ku hinek Yaqûb
Lê bêyî Yûsif
Hinek Eyûb
Mubtelayê kurmên hebûnê
Ez bi vî şiklî
Ji Mekkê qewirîm
Û bicih nebûm di Medînê de
Bi tenê
Bayê azadiyê ez rapêçam
Weku Leyla
Di vê çola lal û bêbinî de

12. 3.1998, Stolberg

Dîroka wehşetê

Şev bi ser me de girtibû
Em di tarîtiyê de
Li benda mirina xwe bûn
Hin ji me mirin
Hin reviyan
Bûn berrî
Ji wehşeta behrê

Paşê hin ji me
Tirsiyan
Ji bilindahiya daran
Reviyan erdê
Hin ji tenêtiyê tirsiyan
Hatin cem hev
Agir derkete holê
Ji vê tevgerê

Me gund ava kirin
Gund bûn bajar
Me pirçê xwe
Li berberxanê jixwekir
Cilên spehî wê veşartana
Vê wehşetê

Mixabin nebû
Cardin rêz rêz in
Cesed di bin piyê me de
Em ê birevin kû
Kîjan stêrk
Kîjan kakêşan
Dê bibe sitargeh
Dê me xelas bikê
Ji vê wehşetê

Şev bi ser me de girtiye
Em di tarîtiyê de
Li benda mirina xwe ne
Hin ji me dimrin
Hin li benda mirinê ne
Li vê wehşetgehê

14. 5.1998, Stolberg

Min jî bi xwe re bibin

Min jî bi xwe re bibin
Çûkên koçber
Bi diyarê xewn û xeyalan
Min jî bi xwe re bibin

Bi wî diyarî
Ku her gul
Mîna heyva çardehan
Li dora min digere
Ji Zîn heta Şêrîn
Ji Leyla heta Zuleyxa
Li wî diyarî
Yarê min çiqas zehf in

Min jî bi xwe re bibin
Min jî bi xwe re bibin
Çûkên koçber
Bi wî diyarê xewn û xeyalan
Min jî bi xwe re bibin

25.7.1998, Stolberg

Telqîn

Delal bi rastî
Telqîneke baş e
Konçertoya Rodrîgo
A gîtarê
Li ser mezel
Bi destê gîtarvanekî baş

Lê di vê kambaxiyê de
Teybek jî dikare
Bi wê konçertoyê
An qe nebe
Bi Bolero
An bi sênfoniya Mozart
A çilî
Dilê min germ bikê
Di mezel de

23. 10.1997, Essen

SABAH KARA

Keçika Misilman

IVAR LO-JOHANSSON

Greta Djerv, di rojeke xweş de, bi şêweyekî dilgerm zewicî; piyê xwe avêt hundirê xaniyê kirê yê nuhavakirî da ku bi xweşî û bextewarî heya dawiya jiyana xwe bi paşnavê Sanderson bimîne. Ne ji mêj ve, wê li derekê xwendibû ku heke bixwaze tehmekê ji jiyanê bistîne divê bi mêrê xwe re nesadiq be. Lê xanim Greta wisa ne difikirî.

Mala nûraxistî mîna ku mirov hatibe pêşangeheke mobîlyeyan sar û bêrih bû. Wek hemî kesên nûzewicî vê malbatê jî bi dijwarî xwe hînî jiyana nuh dikir. Rewşa malbatê baş bû. Standartek bilind û statuyeke qedirgirtî ya malbatê hebû. Diviya mobîlye û hemî tiştên din li malê hêdî hêdî bihatana germ kirin û bîranînên jiyanê xwe, li malê bi cih bikira. Wê hêvî dikir ku ew jî ji nermbûna xweşiya jiyanê şop hildin. Bengt Sanderson, mêrê wê, mi-

hendîs bû; yekî bejindirêj, li hev û hertim bêhna xweş jê difûriya. Cilên herî sipehî bi rêkûpêk li xwe dikirin. Wek ku wê bi xwe hêvî dikir, maleke bi rêkûpêk û mêrekî hertimî.

Gava cara yekemîn wek kesên zewicî ew li eywanê li koltuxên nû rûniştin, Greta ya ku li derekê xwendibû û herweha pê re nerehetî çêbû bû, ji mêrê xwe yê ku berê ev tişt destnîşan kiribûn pirsî:

– Ma ez mecbûr im bi te re nesadiq bim?

– Himm. Em herdu jî azad in. Dilê me çawa bixwaze em dê welê bikin.

– Heke ez nexwazim çawa dibe?

– Ez kesî mecbûr nakim. Lê ez bi xwe dixwazim xwe serbest his bikim. Ji xwe ev tişt di çarçoveya lihevkirina me de ye.

Wî mesele girîng nedît lê wê girîng didît.

– Ez jî dixwazim azad bim, lê di çarçoweya ku ez divêm de.

Wê hewl dida da ku bi hilma xwe mala nû germ bike, vejîne.

– Hehal ev tişt hema ne bi carekê ve dê biqewime. Ka bila hinek wext bibihure. Bala xwe bide, heke tu aciz bûyî wê gavê?

Wî mesele besît didît.

– Min berê jî gotibû, bi gava pêşîn re ez serbestiyê wek şertekî dibînim.

Wê jî ewil gelş ewqas cidî negirt. Difikirî ku bi tenê axaftinek bû. Ji hêla xwe ve, dida aqilê xwe ku dê pêwistî bi wê azadiyê nebe.

Bêşik berî ku bizewice bi gelek kesan re raza bû. Bi gotina wê, ew "di dibistana berî zewacê" re derbas bû bû. Wê berpirsiyariya xwe zanîbû. Gava ew panzdeh salî bû, dê û bavê wê, jê re bi tecrûbeya xwe gotibû: – Hayî li xwe hebe. Lê wê serê xwe ne êşandibû. Hayî li xwe hebû. Xwe parastibû.

Pir eşkere his dikir ku ji kesên berî zewacê yên ku ew kêfxweş kiribû bêtir ji Bengt hez dikir. Ya herî girîng ev bû; yê ku destê xwe bi dostanî dirêjî wê kiribû, xwestibû bi wî re bizewice, serî deyne ser balîfekê Bengt bû, ne kesekî din. Û wê jî daxwaza wî qebûl kiribû.

Bawer dikir ku bi zewacê re dê bêtir ji wî hez bike. Digel ku ji xwe gelekî jê hez dikir. Divê mirov xwe fêrî rewşa zewacê bike. Heta niha rewş baş bû.

Helbet wê dizanîbû ku zewac nayête maneya koletiyê. Lê zewac maneya pevgirêdanê, iskeleyek, bender û erdek qewî bû. Herweha dizanîbû ku bi zewacê re dê bi mêrekî tenê razî be û di destê pêşîn de dê rê ji bo mêrên din girtî be.

Bi rastî jî ji bo Gretayê manedar bû ku wê dev ji paşnavê xwe, Djerv, ber-

dabû û Sanderson hildabû. Pê re jî çarçoveya serbestiya wê hinekî teng bû bû. Ji axaftina li ser serbestiyê bêhizûr dibû. Wê ne dixwest ku di destê pêşîn de nesadiqbûyînê wek şertekî deynin; û her tişt hema welê bête sînor kirin. Gava şertekî weha wek mecbûriyet dihate pêşiya wê, wê xwe neçar his dikir. Ev tiştekî dijî serbestiyê bû, gava di destpêkê de wek daxwazekê dihate pêşkêş kirin.

Gava Greta, ya nûzewicî bi dilgermî ji malê derket, bihar bû; nêzîkî ceşna hêkesorê bû. Bengt çûbû karê xwe. Di cihê karê wî de zêdeyî 500 jinan wek sekreter kar dikir. Berê wê jî wisa dikir, ango zû diçû kar; herçiqas gelek caran xwestibû ji vî halê bifilite. Temamê hevalên wê dilbijokê rewşa wê bûn. Ji lewre bi zewacê re rewşa wê baş bû bû.

Wê ji ber zewacê bi kûrahî nefes girt û berda. Çawa berê serbestbûyîn jê re normal dihat welê biryar da, da ku ne serbest be, bête girêdan.

– Ez bi rewşa xwe baş dizanim. Ji berê ve hayî li xwe bûm. Min xwe li ber ba berneda. Min li dijî vê yekê tiştin kirin.

Çû, li camekana dikanekê mêze kir, paşê kete hundir. Ev dikana Lofsko bû. Li ser camê camekanê "Piyên Sivik" nivîsandîbû; mîna ku temamê reklamê ji bo nesadiqbûyînê hatibû danîn. Ji bo malê tiştin kirîn. Ji ber ku ji bilî navê xwe paşnaveke nû hildabû; wê gavê jê pirsîbûn:

– Em kîjan navî binivîsin?

– Xanim Sanderson binivîse, wê got.

Ew bi xwe ne difikirî lê çarçoweya jiyana wê mîna kêzxatûnekê, biharmonî û bêfantasî bû.

Greta Sanderson bi milmilandina stranekê dimeşiya.

– Min dixwest ez bêm girêdan. Girêdan, ne serbest.

Heya ku bi raxistin û têkûzkirina malê ve mijûl bûn rewş baş bû. Çûyîna dikanan, cawê herî baş peydakirin, pîvan, neqandina rengên herî baş, bi Bengt şêwirîn û gava êvaran ew ji karê xwe dihat, bi hev re ev tişt kirîn, tehmek dida jiyana wê ya rojane. Pê kêfxweş dibû.

Bi hezaran sal berê, di demakevir de, jinên hovan kevir didan ser hev. Jinên medeniyan jî tiştine ji dar, metal û porselen didan ser hev. Kêm zêde wek hev bûn. Heta ku raxistina malê xilas bû ev tişt bi kêfxweşî pêk hatin.

Wê digot:

– Van tiştan bişîne mala xanim Sanderson, navnîşan ev e.

Gava wê ev gotin digotin pê kêfxweş dibû, sîng lê dinepixî. Dida aqilê xwe ku tam li paşnavê xwe germ bûye.

Mal, hema çi bêje hatibû raxistin. Êvaran, wan nizanîbû ka çi bikin. Bi hev re radiketin, lê piştî mideteke têr dibûn. Dest pê kirin birîç lîstin, nas û dost vexwendin malê. Di destpêkê de gava ew lîstikvanên bi tenê bûn, ji wan re ecêb dihat, lê belê dost û hevalan jî di rewşa wan de guhertineke zêde peyda nekir.

– Ma xelk çi dike? Wê pirsî.

– Diçin derve û kêfê dikin.

Wê gavê em jî wek wan bikin, erê?

Bi hev re çûn restoranên dansê, li wê derê eşkere xuya ne dibû ku ew jin û mêr in. Cilên Bengt yên herî sipehî bûn û herweha ew mêrê herî lewend bû. Li derve jî wê her dixwest bi wî re bireqise, tehma jiyanê li gel wî pev bikelîne û xezîna bîranînan dewlemendtir bike.

Lê wî, berevajî, dixwest bi keçikên din re bireqise. Wî digot, heke em bi hev re heşt caran bireqisin dê herkes fam bike ku em zewicandî ne. Wê jî digot, ma çi di vê de heye ku wisa bifikirin. Lê wî ne dixwest eşkere be ku ew jin û mêr in.

Êvareke roja şemiyê wî got:

– Em dikarin gustîlkên xwe ji tiliyên xwe deynin da ku kesên em bi wan re direqisin ji hêla wijdan ve neêşin?

Lê wê dixwest, ew keçikên ku bi wî re dans dikin bila ji vê hêlê ve biêşin. Wê got:

– Ez dixwazim tenê bi te re bireqisim.

– Tu ecêb î. Madem wisa ye me dikarîbû em li malê jî bireqisiyana, an na?

Lê ew welê ne difikirî. Bi Bengt ve girêdayî bû û dixwest herkes pê zanibe ku ew jin û mêr in, bi hev re bextewar in.

Gava duyemîn ku bû sebebê bi Greta re livandinek peyda be, ew bû ku Greta çû cem dostên xwe yên zewicî. An li qehwexaneyên ku bêhna çîkolatayê jê difûrî rûdiniştin, an li barekê an jî li malekê diciviyan û qasî saetekê an diduyan ji vir û wir diaxifîn. Tiştekî girîng ne dihate gotin. Lê li gel vê yekê jî Greta difikirî ku vê carê jî ew diçû "dibistana zewiciyan". Wê dix-

west bizanibe ka xanimên din pirs û gelşên xwe çawa çareser dikin û herweha ji dil dixwest û pêwistiya wê hebû ku çêlî gelşa xwe bike.

– Ez ji halê xwe razî me. Bi tenê ji mêrê xwe hez dikim.

– Ev nîşana xeşîmiya te ye. Çu jin nikare bextewar be heke xwe azad his neke.

Ji wan jinan yk jê ji yên din bi emirtir û navê wê Gerda Wintzell bû. Ew ne dirêj, ne kurt, bi tenê piçekî qelew bû. Dixuya ku gava bibe yeke navsere dê gelek mêr xwe lê bigirin. Ji rewşa wê xuya dibû ku ne hewce bû guh bide bejnûbala xwe. Tiştê ku bala mêran dikişîne di rihê wê de hebû; tam wek jinekê hatibû afirandin.

Di vê mijarê de, demê tiştek ne guhertibû. Zilamek li hev li kêleka wê bû, ew dostê wê bû. Ji xwe wê jî ev yeka ha ji kesekî venedişart. Berevajî pesnê xwe dida. Bi jinên ciwan re digeriya, herçiqas ji wan biemirtir bû jî; ji lewre yeke radîkal dihate hesibandin. Ciwanan berê xwe dida wê.

Gava ji hevalên xwe aciz dibû, diçû cem dostê xwe yê pelewan, ku wê jê re digot Atlas. Wî ew di nav destên xwe de diguvaşt. Wê ji dil behsa wî dikir gava li sîrkusê, wî bi destê wê girt û ew bir bihuştê. Gotina "hezkirinê" di devê Gerdayê de hertim maneyeke jîndar werdigirt.

– Çu jin, ku bi rastî jin be, nikare di temamê jiyana xwe de bi mêrekî tenê razî be, ev gotin ji devê Gerdayê wek remilavêjekê der diketin. Di dilê jinekê de bêşik carine diqewime ku mêrê wê bersiva daxwaza wê nade. Wê gavê divê jin serî hilde. Nîşan bide ku azad e.

– Ma azadî çi ye? Gretayê got. Ma azadî ne ew e ku mirov daxwaza dilê xwe bi cih bîne?

– Azadî ew e ku tiştê dinuqute dilê te tu bikî.

– Ma heke ez his nekim û nexwazim ku nesadiq bim? Ma wê gavê jî mecbûr im nesadiq bim? Ez naxwazim...

– Wê gavê kêmasiyek bi te re heye. Xwe wek xwe qebûl bike.

Zanîna Gerda Wintzellê tesîr lê kir. Gava cih li Gerdayê teng dibû nimûneyeke weha dida: "Segekî zindî ji şêrekî mirî çêtir e."

– Belê, yên din digot. Lê kî kî ye? Gerdayê ji xwe razî weha digot: "Tu bi xwe tê derbixe." Carinan dida navê. Wê gavê weha digot: Ji mehîneke re siwarî pêwist e. Divê karibe wê tîmar bike.

– Çima zilamekî biemir dixwaze bi jineke ciwan re bizewice, belê, bersiv eşkere ye; digot. Zilam karexezalê dixwaze. Lê belê çima jineke ciwan dix-

waze bi yekî biemir re bizewice, belê, ji lewre ew ewleyiyê, parastinê dixwaze: ji berpirsiyariyê direve, dixwaze li ser qûna xwe ya keçika misilman wisa pêçayî rûne û çu awirekê nede mêrekî din. Di xwe de taqetê nabîne ku bifikire, aktîf be. Mêrê xwe wek sîgortayê dibîne. Mimkin e yekcaran ev tişt baş be. Lê divê jin nebe sebebê pêşketina xwe. Bi rastî ez ji jinên welê şerm dikim. Herhal tu naxwazî yeke wisa bî, yeke ku bi xanimî rûne û mêr wê biparêze?

– Berî ku ez bizewicim heta tu bêjî serbest bûm, Gretayê got û li ser fikira xwe ma. Lê niha ez naxwazim û baştir e ku ez xwe girêdayî his bikim.

– Rebenê!

– Ez dixwazim welê bim.

– Xuyaye taqeta te ya xwe li ser piyan girtinê tune ye.

– Ez ji jiyaneke ewle û demdirêj hez dikim.

– Tu rebeneke Xwedê yî. Tu bi xwe ne bawer î. Yeke ji piştgirên Gerdayê got.

– Wê gavê tu keçeke misilman î, Gerdayê got û minaqeşe bi dawî anî.

Gerda Wintzell ji devjengiyê westiyabû, lê piştgiriya ku dixwest bi dest xistibû; rabû çû cem dostê xwe, pelewanê ku bersiva dilê wê dida.

Pirs di serê Gretayê de peyda bû bûn, çû malê. Serbestbûyîn wek mecbûriyetê his dikir.

Piştî salekê, şevek ji şevên biharê, Greta Sanderson pê hesiya ku mêrê wê, Bengt, ji lihevkirina wan ji beşê serbestbûyînê îstifade kiriye. Herdu çûbûn derve ji bo bireqisin; bi gustîlkên xwe ve. Wî xwe nêzîkî keçeke ciwan kiribû. Welê eşkere ku Greta jê hayîdar bû bû. Êvarê ji bo şîvê nehat malê. Telefonî malê kir û got ku nikare were. Dê keçika ku pê re reqisîbû bidîta. Roja yekşemê serê sibeyê hat malê. Kêfxweş û bextewar dixuya.

– Min his dikir ku pêwistiya min pê heye. Min ev tişt kir da ku ez bêtir ji te hez bikim.

Dê li dij lihevkirina wan bûya heke wê acizbûnek nîşan bida. Lê wê li dijî serbestiyê serî hilda.

– Ez dixwazim bi te re rakevim û vî tiştî nîşan bidim, Bengt got. Lê wê nexwest.

– Ez ji berê bêtir ji te hez dikim, ji lewre min bêhna xwe berda; û ne hewce bû derewan bikim.

Lê wê nedixwest bi wî re raze.

Bengt pirsî:

– Ma sînorê têkiliyan çi ye? Ma bi destê yekê girtin ne têkiliyeke nêzîk e? Heta mirov li ba mazûbaneke henekar be û piştî şîvê û hin yariyan, mirov mazûbanê ji lêvan jî ramûse xem nake. Dibe ku canê mirov li hin cihan ji cihên din naziktir be, lê ev ne ferqeke ewqas mezin e. Ma gelo ferq di hundir de ye? Lê mimkin e ew his ne ewqas xurt bin. Û wek min berê jî got, ez niha bêtir ji te hez dikim; ji ber ku ez niha dikarim te bi yeke din re miqayese bikim.

Wî digot qey ew dixwaze bi bûyerê bihese. Lê ew xelet difikirî. Wê ne dixwest tişt zêde bêne zelal kirin. Gelekî dijwar bû ku bersiva pirsên wî bide, ji ber ku kirina wî li gorî lihevkirina wan bû. Greta gelekî tirsiyabû ku wek kesên bi kevneşopî girêdayî bête qebûl kirin. Lê ji destê wê ne dihat, hema bi çi awayî be jî, bê qeydûşert xwe biavêje hembêza wî.

Greta:

– Bihêle bila hinek wext di ser re bibuhure. Dibe ku tu ya din biecibînî! Ez bi xwe jî hewcedarê lêfikirînê me.

– Na, wî got. Ji dil digot. Ez te dixwazim. Ez nêzîkbûyînê di te de dibînim. Ya din bi tenê seyranek bû.

Greta ji bo ku bimeşe bi tena serê xwe çû derve. Hewl dida ku hewaya paqij a biharê bikişîne nava xwe. Hewa mîna mistdanekê nerm bû. Lê digel vê yekê jî Greta bêmirûz û aciz bû.

– Ez him girtî him jî azad im. Lê ez nikarim ji serbestiyê îstîfade bikim. Ez ê bi azadbûyînê çi bikim?

Heçî neserbestbûyîn bû, wê dizanî sînor çi ye.

– Mirov dizane ku ka mirov xwediyê çi ye; û dizane ka dê çi winda bike. Lê bi azadiyê hertişt bêsînor dibe. Tişt nayên fesalê. Wek cilên ku ji bedenekê dakevin xwarê.

Bihar ji bo hiskirinê dema herî bi talûke bû. Hemî rihbar digihîştin hev. Tebîet, çûk, kulîlk, heta bi çîçekên li ber şibakên malan, bi biharê re gêj dibûn. Kevokan li ber pencereyan, li ser banan cot bi cot xwe digihand hev. Mêkevok bi kurk diketin. Heta kêzik jî digihan hev. Bi kulîlkên teze, çêlikên çûkan, kêzikan heya bi kelmêşan ve vejînek nuh peyda dibû.

Greta gava bi serê xwe bû dîqet dikir da ku bi hemil nebe. Li gorî dê û bavan ducaniyaberî zewacê xelet bû. Ji lewre ew mêrên ku Greta bi wan re razabû ji bo wê bi tenê nesneyeke cinsî bûn. Di têkiliyan de wekhevî hebû.

Wan mêran jî bi awayê wê lê nêrîbûn.

Lê wek keseke zewicî rewş cida bû. Berê zarok ne dixwest, niha dixwest; lê îcar jî Bengt ne dixwest. Wî ji wê bawer ne dikir gava wê digot ez bi tedbîr im. Wî dizanîbû ku çawa jin mêran dixapînin da ku wan bi xwe ve girê bidin. Ji ber vê yekê wî bi xwe tedbîr girtibû da ku ne keve faqeke welê.

Ji hêla hisan ve rewş hinekî hatibû guhertin. Lê wê zêde gazind ne kir. Difikirî ku bi tenê ji bo kêfa xwe ducanî bimîne dê neheqî be. Bi ya Bengt dikir. Lê bi hevalên xwe jî dişêwirî.

– Mêrê min bi min re nesadiq e. Wê welê vekirî mesele eşkere kir.

– Herhal ne tiştekî ecêb e? Ma bi dizî vî tiştî dike?

– Na. Eşkere dike.

– Ma we li hev kiriye ku hevûdu serbest bihêlin?

– Belê.

– Wê gavê mesele çi ye? Tu jî wek wî bike.

Bi fikira Gretayê jin hebûn ku ji sadiqbûyînê zewq distendin; û wê xwe jî di nav refê wan de dihesiband. Lê da aqilê xwe ku divê xwe biguhere. Ji bo vê yekê jî alîkarî ji hevalên xwe, bi taybetî jî, ji Gerda Wintzellê xwest.

Greta:

– Ma şert e ez nesadiq bim? Heke ez nexwazim jî?

– Navê vî tiştî ne nesadiqbûyîn e. Ji lewre we li hev kiriye.

– Lê ez naxwazim.

Gerdayê ji jor ve li wê mêze kir.

– Ez xwe tevî karê we nakim. Heke rojekê jin ber bi azadiyê ve bimeşin jî, ji wan re serokekî mêr divê. Ew bi xwe ne bawer in. Heke şoreşeke jinan pêk bê jî divê bi pêşengiya mêrekî be.

– Ez bi tenê rewşa xwe fikirîm. Ez bi xwe dizanim.

– Heke tu li Erebistanê bizewiciya tam li gorî rewşa te bû. Tu keçeke misilman î. Tu ji dil dixwazî li hundir girtî, bi çarşefê pêçayî, di bin çavan de bî û li hêviya mêrê xwe bimînî heta ku kerem bike were malê.

Gerda paşê rabû çû cem dostê xwe Atlas. Wê ev tişt bêî dudilî bi rehetî dikir. Wê nîşan dida heke mirov bixwaze azad be rê çi ye.

Lê Greta çû malê.

Greta Sanderson di nav tenêbûna xwe de li ser gelşên azadbûyînê difikirî. Wextê wê pir bû. Mobîlyeyên malê hîn tu şop hilnedabûn. Wek berê nuh û sar bûn, dibiriqîn. Li gel ku mîna sihûriyek ji bo zivistanê çawa dendikan

dide ser hev welê mal raxistibû jî; lê sar û vala bû.

Bi tesadufekê re fikirî ku çawa civat bi şert û qaîdeyan hatiye çarçove kirin. Qaîdeyên trafîkê, xanî kirêkirinê, qeydkirina insanan, zekat, qeydkirina segan ûhwd. Di derbarê weşanan û azadiya fikir de jî çarçoveyek hebû. Bi tenê ji bo ka mirov çawa aşiq bibe an jî xwe bikuje çarçove ne hatibû danîn, di vê mijarê de mirov serbest bûn.

Ricifî. Cara pêşîn bû difikirî ku bi tenê di van waran de serbestî hebû û dibe ku têkiliya van herdu tiştan bi hev re hebe.

Azadbûyînê li pey xwe valahiyek hiştibû. Mîna ku serê sibeyekê mirov şiyar be û nizanibe ka çi bike. Dê roj çawa bibuhuriya, gava çu tiştek ku wê bi xwe ve bigire tune be? Ew li xwe mikur hat ku dixwaze pê ve girêdayî be, neserbest be, lê hiştibû ku bête xapandinê; ango azad e an jî bi kêmasî wê welê milahaze dikir.

Herçî Bengt bû wek berê yekcaran jinin din didîtin û bi wan re radiket. Hercara ku diçû cem yeke din û dihat malê ji jina xwe re digot ku ew ji berê bêtir jê hez dike. Ji tevgerên wî li hember jina xwe wisa jî dixuya; mirov digot rastiyê dibêje. Lê hîn jî ne dixwest ku zarokek ji wan re çêbibe.

Greta pirsî:

– Ma ez jî mecbûr im herim cem hin din?

– Kes ne mecbûr e, em heryek xwediyê serbestiya xwe ne; û azadiya me heye ku em wê bikar bînin.

– Lê heke ez nexwazim?

– Ev çi ecêb e? Çi bêje ku ez ji rewşa te şerm dikim.

Te digot qey Bengt dibêje: "Tavil rabe, here bi yekî re raze."

– Helbet. Lê divê azadiya mirov hebe ku mirov xwe mecbûr jî nebîne.

Çêlikên çûkê ji hêkan derketibûn. Li hêlînê wîç wîça wan bû. Mêkêzik herhal niha bû bûn pîrikên pîrikan. Kulîlkên li ber şibakê gul vedabûn.

Gretayê dîtibû ku bi wextê re çu tişt baştir ne bû bû. Berevajî ji wê re dijwartir bû bû ku şertên azadiyê pêk bîne; gava ku serbestî bû bû mecbûriyet.

Wê gavê ji cihê xwe rabû, xwe mîna ku ji bo seyaheteke hin tiştan bide ser hev, his dikir. Ew lê baş fikirîbû ku ka ji kê dest pê bike. Kesê ku wê biryara xwe li ser dabû ji zûde nas dikir. Navê wî Bert bû. Dişibiya navê Bengt. Dida aqilê xwe ku ji ber xwe ve, mîna alîkariyekê, ev tişt qewimîbû.

Bertê ku wê ji kevin de nas dikir zewicandîbû, wê jina wî jî nas dikir; wê gavê jinik li nexweşxaneyê li beşê zayînê dima. Dibe ku wî jî tiştin wisa di-

kir. Ji lewre wê ew ji bo vî tiştî minasib dît.

Wê hinekî meraq dikir. Gelo jineke bimêr çi difikirî, gava bi mêrê hevaleke xwe re radiket? Ma mimkin bû ku mirov zewqeke zêdetir bistîne? Her çi be jî serbestî û guherîn bû.

Tenê ji bo zêdekirina kelecanê difikirî. Gava ku ev tişt pê re çênebû, xwe bi fikira ku herdem rû nade qanih kir. Diviyabû ew jî wek yên din ba, li meseleyê yek alî mêze nekira.

Şemiya ku wê dê daxwaza xwe bi cih bianiya, Bengt telefonî malê kiribû û gotibû ku ew ê bi şev neyê malê. Ji lewre diviyabû wê xwe bi temamî serbest his bikira. Wê bi kelecaneke mezin telefonî Bert kiribû û jê pirsîbû ka mimikin e bi hev re şîvê bixwin, an na. Wî erê gotibû. Li restoranê li hember wê nazik bû û şerabeke xweş xwestibû. Piştre Greta bi wî re çûbû malê.

Wê di dilê xwe de digot ev macerayeke ku dijî. Wê dê kêfxweşî û zewq bistenda. Dê xwe bi dilxweşî biavêta nav deryaya zewqê. Ev fikir jê re dibû hêz da ku ji derî bikeve hundir.

Bert ji Bengt cidatir tevdigeriya. Wî cilên wê bi lîstikên guhertîtir, yên xwe jî bi awayeke din danîn. Hertiştê wî ji Bengt cidatir bû. Mistdanên wî yên destpêkê guhertîtir bûn. Mideteke mîna kesên nezewicî jiyabû. Pêlên kelecan û zewqê lê rabû bûn.

Ew xwediyê wê bû û zewqeke mezin dabû wê. Ew spasdarê wî bû. Pêşîn çengên wê li paş wê dirêjkirî mîna erdekî bejî zewqa hênikbûyînê wergirt. Paşê wê piyên xwe li pişta wî gihandin hev. Bi tirsa ku ew dê ji nav destên wê here.

– Ez dixwazim bi vî awayî em hevûdu bibînin. Wê bi kêfxweşî got.

– Digel ku em herdu jî zewicandî ne? Wî got.

– Belê. Ma em ne azad in?

– De ka em bibînin bê rewş çawa dibe.

Gava roja yekşemê serê sibeyê bi şêweyekî bextewar hat malê, wê jî xwe kêfxweş his kir, ji lewre di dawiyê de wê jî cesareta azadbûyinê di xwe de dîtibû. Wî ji wê tiştek pirs ne kir. Lê Greta difikirî ku qet ne be diviyabû wî ji wê şik bikira.

Wê got:

– Ma tu ewqas bawer î ku ez jî wek te nakim?

– Ne mimkin e ku ez ji te bipirsim.

Hêviya wê şikest.

– Bi kêmasî tu dikarî pirs bikî?

Wî got:

– Dê bête maneya hesab dîtinê ku çu heqê me tune ye wek insanên modern em ji hev daxwaz bikin.

Tiştê ku rû dabû çend car hate tekrar kirin. Hertişt xweş û rind dixuya. Lê ji nişkê ve wê tê derxist ku Bert ji wê aciz bûye. Wî xwe dida alî. Herçiqas ew hîn jî ji jina xwe dûr bû, wî tu nêzîkahiyeke germ nîşan ne dida.

Wan li mala Greta hevûdu didît. Wê bawer dikir ku tirsa ji nişkê ve bêne eşkere kirin dibû sebebê bêhewesiya wî. Wê dida aqilê xwe ku mimkin e li mala wê di nav mobilyeyên wê de wî xwe serbest his ne dikir. Di dawiyê de wê texmîn kir, ew ne ewa ku wê hizir dikir bi dilê Bert dilive. Digel vê yekê jî wê ji Bengt zêdetir bi ya dilê wî kiribû.

Wê hewl dida ku hemî astengan ji ser rê rake da ku Bert xwe kêfxweş his bike.

– Bengt li cem jinekê ye û heya sibeyê nayê malê, xwest ber dilê Bert bigire. Heke ew bê jî çu tişt naqewime, ji bo wî okey e. Ez dikarim bêjim ku wî bi xwe ez fîtî vî tiştî kirime. Çawa yekek bi wî re ye tu jî bi min re yî. Tiştekî eşkere ye.

– Ne ewqas hêsan e.

– Ma ez têra xwe li hember te ne nazik im? Wê got, lê ji bersivê ditirsiya.

– Çî tiştê ku ji destê te tê tu texsîr nakî.

Wê bêtir ji xwe şik kir.

– Ma tiştek heye ku ez heq jê dernakevim? Ji min re bêje ka ez çawa bim, ez dê hewl bidim ku herî baş bim.

Bert bişirî û fikirî.

– Na.

– Ma tu bawer dikî ku gava jina te pê bihese dê gelekî hêrs bibe?

Wî bersiva vê pirsê bi hêsanî da.

– Na, na. Me herduyan li hev kiriye ku em bi temamî azad in. Heqê wê jî heye ku ji xwe re dostekî bibîne, gava ku bixwaze.

– Ma ew naxwaze?

– Ez nizanim. Min jê ne pirsiye.

Ji cihê xwe rabû, cilên xwe li xwe dikir.

– Wê gavê mesele çi ye?

Wî cil li xwe kiribûn û qerewata xwe girê dabû.

– Ez dixwazim sadiq bim, ne serbest, wî got.

Bert li ber çavên wê mîna zilamekî xerîb dixuya, heya gavek berê jî wê digot qey wî baş dinase.

– Sebeb ev e?

– Di temamê jiyana xwe de ez li pey vî tiştî bûm. Ji lewre ez poşman im. Ez naxwazim ev tişt dubare bibe.

Wê xwe dilşikestî his dikir. Wê şerm dikir ku Bert nema bedena wê dixwaze. Difikirî ku çi bêsiûd e. Hêrsbûyî û di kûrahiya rihê xwe de, xwe neçar û birîndar his dikir.

– Dilê te çawa dixwaze wisa bike, wê got. Ji wî nefret dikir.

Gava deriyê derve hat girtin wê his kir ku wî ew diziye, hêviya dilê wê bi xwe re biriye. Ev diziyeke wisa bû ku lê ne dihate gilî kirin. Dê tu polîs pê mijûl neba.

Bi çi awayî be jî salek bihurî. Geh li vî alî geh li wî alî wê ji xwe re dostên nû peyda kirin. Heke ji berê zêdetir nebe jî hîn jî Bengt li hember wê pir nazik bû. Wî tucar ji wê ne dipirsî ka li ku bû, çi dikir. Berevajî mîna ku ji ber serpêhatî û macerayên wê kêfxweş dibû.

Lê belê ji bo wê êdî ne macera bû. Ew difikirî ku hema xwe wisa di dest xelkê de berdide. Mêran ew mîna tiştekî tebiî didît. Carina wê tiştek bi dest dixist, carina jî na. Yekcaran hema çi bêje ji wan tika dikir. Dostên zîrek û nazik kêm peyda dibûn.

Te digot qey hemî hewldanên wê ji bo nîşan bide ku azad e. Mêran dixwest ku macera û jirêderxistin her bimîne. Lê wê hewl dida ku bibe ducanî, bi kê re dibe bila bibe; lê mîna ku zarokê ji dil xwestî hayî lê bû bû û ber ne digirt.

Hevberdanê difikirî. Dida aqilê xwe ku ji nû ve ji xwe re karekî bibîne. Lê fêrî betaliyê bû bû. Çu sebeb ne didît. Berevajî keçikeke xizmetkar peyda kir. Pêwistiya wê tune bû lê ji bo hevalên xwe bibehecîne, wisa kir. Hevalên wê mecbûr bûn ku karê malê bi xwe bikin.

– Mêrê min dibêje di kara me de ye heke ez ne xebitim, herweha divê em yeke bi meaş bigirin; wê got; gava ku hevalên wê ew mecbûrê bersivekê kirin.

Zewaca wê li gorî lihevkirina wan berdewam bû. Kesî ku wê bide ber gotinan, jê gazindan bike tune bû.

Gerdayê û hevalên din şîretên berê lê dikirin.

– Tu jî meseleyê ewqas girîng nebîne. Li derûdora xwe binêre, yekî baş peyda bike. Yên welê hindik bin jî hene.

Rojekê ji fersendekê istîfade kir û dostê Gerdayê bi dest xist.

– Ez hevala Gerdayê ya herî nêzîk im; ew hertim pesnê te dide, wê got.

Atlas jî mîna hemî mêran poz bilind bû.

– Ez ji Gerdayê têr bûme, ji xwe qelew jî bûye.

Gretayê bi awireke ber bi jêr li xwe nêrî:

– Ez narîntir im.

Atlasê Gerdayê, Greta xiste nav lepên xwe. Mîna ku li sîrkusê û Greta jî halterek be, welê bi wê girt. Pêşîn ew avêt ser textê razanê. Masûlkeyên wê firikandin. Te digot qey dixwaze parsûyên wê bişikîne. Paşê kelemçe anîn. Piştre devê wê girt ku nikaribe biqîre. Di dawiyê de li ser textê razanê ew bi cih kir. Mirov digot qey li pêş çavên temaşevanan van tiştan dike. Tiştên ku wê ji wî hêvî dikir, wî bi hemî huner û taqeta xwe wek atlet û pisporkî hezkirinê nîşan dida. Di dawiyê de wê xwe jihevketî his kir.

– Ma bi rastî jî navê te Atlas e?

– Gerda bi vî navî gazî min dike.

– Tu dibêjî dê Gerda çi bêje?

– Ne tiştek. Min li gel wê peymana jiyanê çênekiriye. Heke bêjim tu ji wê baştir î divê ew vekişe. Gava tu hewce bibînî were.

Wê di xwe de cesaret dît ku bipirse.

– Dostên te yên bi vî awayî gelek hene?

– Bêşik. Min gelek hene.

Wê pêşnihad kir ku dê diyariyekê bi xwe re bîne heke ew dev ji yên din berde.

– Diyariyê ez dikarim qebûl bikim lê tiştê din na.

Gava Gretayê fêm kir ku serbestî çi ye, mêvaneke jin ji gund hat cem wê. Jineke zirav û esebî û hertim bi tiştine mijûl bû. Bi nîvçemêrekî re zevicîbû. Ji ber ku ji wî bi zarok mabû, ji mecbûrî pê re zewicîbû. Bi giştî dihate gotin ku wê xwe bi dest wî ve berdaye. Bi mêrê xwe yê qirqirok re li kêleka daristanê li xaniyekî piçûk dima.

Ew herdu jin ya bajarî û ya gundî rûniştin û ji vir û wir axifîn.

– Xwedêyo, çi rewşa te xweş e; ya gundî got. Ma rojên te yên dirêj çawa dibuhurin, tu çi dikî?

– Ez azad im û ji bo karê malê jî xizmetkara me heye.

Çavên mêvanê biriqîn.

– Azad? Çu carî ne bûme. Miheqeq tiştekî ecêb e? Ez bi xwe girtî me, wisa ku ez pê diêşim.

Greta mîna ku bextewar be û azad hatibe dunyayê xwe nîşan dida. Ji dilbijokiyê kêfxweş dibû. Mêvan rabû li hundirê malê geriya, lihêf û perde sehandin.

– Û bi ser de jî tu bi mêrê xwe re bextewar î?

Gretayê biryara xwe dabû,da ku heya mimikin be rola xwe bilîze.

– Em wek kesên azad dijîn.

Gava ev tişt gotin girêkek di qirika wê de peyda bû.

– Mebesta te ji vê çi ye?

– Dilê min kê bixwaze ez pê re dimînim.

Ya mêvan fam nekir. Careke din pirsî.

– Mêrên din? Ma dibe?

Hindik mabû ku Greta xwe devûrû bavêje ser xaliya şîn û bigirî.

– Lihevkirina me ye. Mirov nikare hema çawa be lihevkirinê betal bike.

Gava mêvanê mesele fam kiribû, pêşîn mirov digot qe şerm dike. Jinik ji herêmeke ku ji hêla kulturê ve feqîr bû. Li wê derê insan ewqas bibawer bûn ku ji sadiqbûyînê bawer dikirin.

– Bifikire? Wê got.

Greta dixwest hinekî din jî bipeyivin lê mêvanê cesaret ne dikir tiştekî din biperse. Mazûbanê fam kir ku mêvan dilbijokê wê ye.

– Ez meraq dikim gelo kal û pîran çi dikir? Çawa dikarîn bi hev re bimînin?

Kirasê ya din ev sala çaremîn bû ku ji pêş ve kurt dibû. Mêvanê bersiva pirsê nedizanî.

– Herhal karê wan hebû.

– Mebesta min wek mêr û jin e.

– Ew mecbûrê hev bûn?

Di dawiyê de gihaştin niqteyeke hevbeş. Behsa yeke nas kirin. Greta meraq dikir.

– Brit yeke sivik bû. şêrîn bû. Çi bi wê hat?.

– Dêlika gund bû.

– Û niha?

– Nema heye...

Roja şemiyê bû, Bengt telefon kiribû û gotibû ew dê dereng bê, mimkin e serê sibeyê bê. Dengê wî nerm bû. Ev nîşana vê yekê bû ku kêfxweş bû û gava bihata malê dê kêfxweşiya wî pê re ba. Gava bihata malê sedî sed dê bigota ku ew ji berê bêtir ji wê hez dike.

Greta jî bi Atlas re ji bo hevûdudîtinê li hev kiribû. Wext ji bo wê jî pir minasib bû. Wê û Bengt dê paşê mîna du kesên azad û wekhev hevûdu bidîta.

Ew jî rabû çû. Diyariyek jî bi xwe re bir. Atlas li Stastgordenê dijî. Li kolanê insan dido dido dimeşiyan. Çend kes tenê bûn; lê mîna ku hedefeke wan jî hebe. Êdî dunya tarî dibû.

Çavên wê, bi mêr û jinek ku li qorziyekê sekinîbûn û tiştek minaqeşe dikir, ketin. Wê jinik berê jî dîtibû. Dizanîbû ku ew yeke fahîşe ye. Lê zilam yekî nû bû.

Gava nêzîkî wan bû, ji axaftina wan tiştine bihîstin

– Min ji te re gotiye ku ez ji bo temamê şeva şemiyê pere didim û divê tu bi kesekî din re ranezî.

Jinikê li dijî wî tiştine digot lê tu argumen peyda ne dikir. Mêrik wextî lê bixista.

– Bi tenê îro welê bû. Ez soz didim ku dê ev tişt dubare nebe.

Mêrik mîna ku jê bawer bike pê re meşiya.

Mêrik:

– Madem wisa ye... Greta didît ku jinik çawa alîkariya wî dike.

Taqeta Greta ne mabû. Azadî bi wê giran dihat. Gava gihaşt perê avê, skeleyê, dît ku cihek ji botan xalî ye. Li derûdor kesek nedixuya. Di nav pêlên avê de masiyek mirî dît.

Şala xwe li dev û bivila xwe baş şidand; ku heke biqîre jî kesek wê ne bihîze. Û xwe avêt nav avê. Wê nedît ku Atlas di wê êvarê de bi Gerdayê re bû. Bedena Greta Sanderson, keçeke misilman, yê mirî li ber Danvîkstrandê derket ser avê. ❑

Wergera ji swêdî: **SERDAR ROŞAN**

IVAR LO-JOHANSSON (1901-1990) yek ji nivîskarên Swêdê yê bi ber bû. Wî di zik hev de salê kitêbek nivîsandiye. Di edebiyata swêdî de ew mîna nivîskarê karkeran tê binavkirin. Ew bi xwe ji malbateke karker dihat û tema kitêbên wî jî li ser rewşa karkeran bû.

Guno! Guno!

Xewnên min di qumatkê de pêçandî man
Hin çivîtî, hin pembe bûn
Hêla dibûn d' hêlekana xweziyê
Bi hêviya ku mezin bibin
Azad bibin
                    ji pitikiyê
Lê,
Xwe j' bîra kirin
Li wê,
Li ber ava ro.

Riya azadiyê ne wisa kurt,
Ne wisa hêsan e mezin bûyin,
Niha têdighêm.
Min nedizanî hingê
- Nizanim ku minê bixwesta, gelo?-

Ji hêlekê ve xuşîna j' guliyên biyê
Û lerzîna pelên narîn ên keskezîvîn
J' alîkî ve lemelema ava biharê
Di hêlekana xwe ya li gulyê darê
Serxweş bûm
        û min xwe
                ji bîr kir
                        wilo!

Xewnên min di qumatkê de pêçandî man
Givrik nebûn
Tiheeee!
Û
        guno!
                gunooo!

ROJEN BARNAS

JAN

1
Li xirbê pêsîrên min
dûvpişkên kumêd
bi kevokên min ên li ser hêkan vedidin.

Li kêleka skelêtê çena min
ku hema ramûsan bixuyin
gur û wawîk li ser şer dikin
Xwedê bi gepê mezin dixwin

bi barana werza 5an
bişom vî mêjiyî
nizanim,
ez ê bibim xwedîderûneke çikî sayî
cilêt di dest de
xeratê mêjiyê xwe me
jêkirî dijîm di hundirê kalaneke şûr de
rûxuyane zagonên hişmendiyê ji bin ve
serî mîna rojhilata navîn tevlihev
wekî Raskolînkov hey bi tayê me
hemû evîndarên min,
di bedewiya Qûasîmodo de
awiqîne xew li min
kaprîsên min ên mirinê çêbûne
zayîn trajîk mirin erotîk bûne
(ez)...
(hemû jiyana min di navbera kevanekê de asê bûye)

2
mirovahiya xav û şil li ser riha xwe
ya min ji şînê berdaye

dibe qerqîtik ji
naşibe tu camêrî
ji girêza mêrkujan
gav nayên avêtin li kuçan
... û Kurdistana min rakişandine çarmîxê
mîna kurê Xwedê Îsa...
bi sê telaqê bêfitwe Kurdistana min
ez ê gemara li ser te
bişom bi xwêdana eniya helbestên xwe
heke heyverona bûk
di şeva xwe ya ewil de bakîre dernekeve jî...

3
min hêrs ajotine devê lûla demançê
tiliya min li ser nikilkê qahrê, jahrê
dikim bi hewa xim
jan, jîn, jin!..
dêl im di saygonên fîraûnan de
hemû pîramîdan bi tena serê xwe ava dikim
tu yê bêjî qey ez ê di wan de bimirim
serê xwe bi wan re zahf diêşînim

bêyom im
ji kê hez dikim,
di torên masîdaran de "pif" fanosê çavên xwe dikir
bêyom im
ji kê hez dikim,
dibe rêwî di hundirê rêviyên xwe de
li devê devê xwe rêwîtiya wan bi verşiyê bi dawî dibe
ne bi xêr û ne bi ahlen
van rojan min dest bi xwe jî hezkirinê kiriye

4
bêhna pîşo dihat ji zaroktiya min
bûme mêr,

di nasnava min de
"şewat" hate nivîsîn
navê min
navê te
ala hatiye çirandin
ka navê te
ka navê, ku di golên bi wêrdek de
di avêtina kevirekî de (n)avên xelek xelek dinepixe.

5
stûneke keserê me
hogira min a herî dilovan
tava rûniştiye li ser tutukan
dirêj
dirêj digavînim kolanan
minareyên bêmele me li sûkan
bi te tişt im
nîn tişt im
bê tişt im
ji xeynî;
derzî û pênûsa min a di ber serê min de
hemû bajar ji min re gewende
paşila te
ketiye çalakiya derabegirtinê ji min re

6
li ser atomên evîna te kurk ketime
li ser atomên evîna te kurd mirime.

7
Pêpelûkan çêdikim ji mermerê hestiyê parsûyên te hildikişim parsû bi parsû sînga te. Li lûtkeyên bêdawîbûna xwe digihêjim hêza tîrêjê, molekulên min bela-wela dibin li gerdûnê, ku nabim gerestêrkek jî, dibim meteoreke tolaz li valahiyê.

-çermê wextê digurim-

nîra tu tê de dijî qirneke cih ji min re vekî. Di rastiya xwe de tenê cîhaneke
nîqaşî veke. Di nav zeryayan de ne di kêfxweşiya "hêêêêy!... li bergehê hawa reşahî xuya bû" de me, xwelîreng ruyê te, ji min re parzemên e
/Ka ruyê te,
ka ruyê keça ferx, ku porê xwe dikir porçê ji bûka lîstoka destê xwe re/

8
hûr dibim li xalek valahiyê
ji jiyanê tirsiyame
ziq dinihêrim
mîna peza çav li gur keve
dengan dimêjim
wekî zarokekî nû fêrî zimên bûye pir dipirsim
mijangên xwe dirûçikînim
çavên min pelçimok
û çavên te di ruyê te de hilnayên
devê min kêm dibe
monologiya min a kurdî di civatan de dest pê dike
birûsk li kenê nuquçkan vedidin
kevirekî pahn im li ser avan
bêhnçikiyayî
bêrex
her dipengizim

9
li ramanên beyar nivîsên biyar çandibû min
ji payizan
divê bûbûna roman havînan
hîn kîtşitil in
nivîs hew regl dibe
kîjan têgînên qelew
dimiçiqin

di binê bîrên bêhnçikiyayî de
canê te yê bi qorzî
li ser kendalên kubar
bû krîstal
kengî tu ji hev veçirî bêjeyên watenewal
hîngê ezê bi teşiya te re bibime heval
ji vejena sosinên te yên nêromê
vejiyan 365 mêrkujên hestedar
û pîrebokên dilsoj û dilovan

te hîn pêsîrên xwe kişf nekiriye
tu hîn li simbêlê min varneqiliyî

10
li xortaniya min heram kirin qîzaniya te
di cihê pêwendiya me ya herî tengav de
berê "Ez û Tu" yek hebû
û di okyanûsan de şopa meşê me
(dolfîn çavdêr)
tahma xeydên te
aramiya hêşinahiya rehên te
nifireke me
û axirê mirineke me

navê xwe dikim belavok li stasyonan
navê min hilde
li giravên te xwe bi masiyên lal dorpêçaye
gunehkar im ax!
destên min bi destê Meryem bûye
Min biricimînin!..
bila Beatrîce
bimîne bê Dante
min biqijilînin...

RÊNAS JIYAN

GELÎ ABONEYÊN HÊJA!

NÛDEM di riya xwe de berdewam e. NÛDEM di riya vejandina ziman û edebiyata kurdî de bi biryar e. NÛDEM di weşana xwe ya bi kurdî de bi înad e. NÛDEM hê jî li ser riya pirdengî û cihêrengiyê ye. Loma NÛDEM bûye dengê bi hezaran huner û edebiyathezên kurd.

NÛDEM li fikir û ramanên kesî nanihêre, NÛDEM guh dide naverok û kalîteya nivîsan; NÛDEM bi Kurdistanîbûna xwe li dûv gerdûniyê ye. NÛDEM ne ya fikir û îdeolojiyekê ye, ew ya her kurdî ye, dengê her hunermend û nivîskarên kurd e. Di vê weşana heyştsalane de bi sedan nivîskarên kurd xwe bi riya NÛDEMê gihandine xwendevanên xwe, NÛDEM jî bi xêra wan li ser lingan maye, bi alîkariya abone û dilxwazên ziman û edebiyata kurdî heta îro jiyana xwe berdewam kiriye.

Niha, di demeke ku dewleta Tirkiyeyê bi xurtî dest bi asîmîlekirina kurdan kiriye, dest bi inkarkirina nasnav û zimanê kurdî kiriye, berdewamiya weşana NÛDEMê bi manetir bûye.

Kurdino, dilxwazên ziman û edebiyata kurdî, NÛDEM ya we ye, ya ziman û edebiyata we ye; destê alîkariyê dirêjî NÛDEMê bikin, bibin abone, aboneyên nû peyda bikin.

Edebiyat an jî kultura devkî



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Ziman beriya hemû tiştî çalakiyeke devkî ye. Di dîroka mirovantiyê de şitexalî berî nîvîsandinê çêbûye. Mirov pêşî sitexilî ne û dûra jî fêrî nivîsandinê bûne. Şitexalî xwediyê dîrokeke dirêj e. Lê belê nivîsandin weke çalakî xwediyê dîrokeke çend hezar salan e. Heger mirov zimanê şitexaliyê û zimanê nivîsandinê bide ber hevdû, ewê ferqên gelek mezin derkevin holê. Helbet ev ferq ne tenê ji aliyê ziman, lê belê ji aliyê gelek çalakiyên civatî de xwe nîşan didin. Çalakiyên kulturî hene ku tenê dikarin bi devkî bibin û çalakî jî hene ku tenê dikarin bi nivîsandinî bibin. Roman divê nivîsandî bin. Stran divê bi devkî bin. Ew dikarin werin nivîsandin jî. Şano divê him devkî û him jî nivîsandî be. Helbest jî wilo ne. Name divê nivîsandî be, ûhw. Heger mirov li babetê huner û edebiyatê baş temaşe bike, ewê zû hinek realîtên sosyal, kulturî û fizîkî derkevin pêşiya mirovan. Ji bona mînak; nivîskar dikare tikîtenê berhemê xwe biafirîne û xwe di dema nivîsandinê de jî, ji derdora xwe îzole bike. Piştî nivîsandina pirtûkê, berhem û nivîskar ji hevdû têne veqetandin. Xwendevan dikarin bêyî nivîskar berhemê wî bixwînin û li ser şirovan bikin. Lê belê ew rastî ji bona dengbêjekî ne

wilo ye. Dengbêj hunerê xwe rasta rasta bi guhdaran re, li cimetekê dibêje. Ew hewcedarê guhdaran e. Hunerê devkî hergav di hinek danûstandinên civatî de, derdikeve pêşiya mirovan. Gava ku hunerê devkî xwe realîze dike, di navbera hunermend û guhdaran de, gelek haweyên komûnîkasyonê çêdibin. Di mercên normal de, hunermend ji xwe re stranan nabêje, çîrokan nabêje û helbestan naxwîne. Lê nivîskar pêşî tenê ji xwe re dinivîsine û dûra berhemê xwe derdixîne pêşiya xwendevanan. Berhem û xwendevan dikarin bi serê xwe bimînin. Di hunera devkî de, hunera ku dûra tê miqabilî guhdaran tuneye. Hunera devkî niha ye û ew li vir e. Hilbet ev realîta sosyal û kulturî, bi pêşketina teknolojiyê re hate guherandin. Teyp, plaq û televizyonê ev rastî ji navê rakirin. Bi alîkariya teknolojiyê çîrok, stran û helbest niha dikarin werin hilanîn û tamorkirin, ji bona demeke din, ji bona cimeteke din, ji bona mirovin din, heta ji bona civakek din (bi alîkariya wergerandinê) werin realîzekirin. Lê di hunerê ku bi nivîskî de jî, hergav demeke ku dûra tê heye. Nivîsandinên ku beriya sê hezar salan hatine nivîsandin, piştî sê hezar sal dûra dikevin destên mirovan. Lê em hemû baş dizanin ku dengbêjên beriya çend sed salekî ku hebûn, îro qet nayên zanîn û naskirin...

Huner heye ku tenê dikare bi alîkariya hinek alavan (tiştan) were afirandin; weke mermer, kevir, dar, reng, kaxez, cam û ûhw. Ev haweyên huner bêyî ziman û şitexaliyê çêdibin. Lê edebiyat, stran, şano û film bêyî ziman û şitexaliyê qet çênabe. Huner heye ku bi alîkariya guhdarîkirinê pêk tê. Huner heye ku bi alîkariya dîtinê pêk tê. Di hinek çalakiyên hunerî de, tenê fonksiyonekî gewdeyî dikeve navenda tevgeran. Hinek fonksiyonên din î gewdeyî dibin alîkar, ji bona ku navenda gewdê mirovan xebata xwe hîna baştir bikin. Bi kurtî qomando dikeve destê fonksiyonekî gewdeyî û fonksiyonên din jî dibin alîkar ku komando zû karê xwe bike. Di her çalakiyên hunerî de hişmendiya mirovan hemû sînyalên pêwîstî, li cem xwe kom dike. Sînyalên înformasyonê ji aliyê hinek fonksiyonên gewdeyî têne afirandin û kanalîzeyî hişmendiya mirovan dibin. Di çalakiyek hunerî de, dikarin hinek fonksiyonên gewdeyî pir aktîftir bin û hîna zêdetir sînyalan bişînin hişê mirovan. Carna çav, carna hîs, carna

guhdarîkirin, carna deng, carna tahm, ûhw zêde aktîf dibin...

Li ser problemên huner, ziman, gotin, şitexalî û nivîsandinê nivîskar Walter J, Ong bi navê "Kultura devkî û bi nivîskî, teknolojîzekirina gotinê" pirtûkek nivîsandiye. Ong di vê mijarê de balê dikişîne ser gelek probleman û dixwaze li bûyeran, ji pir aliyan de temaşe bike û li ser wan raweste. Ne tenê ji aliyê edebiyat û çalakiyên hunerî de, lê belê ew her dixwaze ku pirsgirêkan ji aliyên dîrokî, sosyolojî, zimanzanetî, antropolojî, fiziyolojî û komunîkasyonê de jî, vejîne. Di navenda lêkolîna Ong de ziman heye. Helbet ev ziman jî ne zimanê nivîsandinê, lê zimanê şitexaliyê ye. Ma ne berê li dibistanan ji me re gotin ku dîrokê, bi nivîsandinê destpêkiriye? Li gora vê dîtinê medeniyetê jî bi nivîsandinê dêstpêkiribû. Bi vî haweyî jî nivîsandin ketibû navenda pêşketina dîroka mirovantiyê. Gelên ku ne xwediyê zimanên nivîsandî bûn, ew weke gelên li paşmayî dihatin pejirandin. Kultur bi mana fireh dibû kultura nivîsandî. Kultura nivîsandî, bi alîkariya nivîsandinê dibû netewî û dûra jî dibû gerdûnî. Nivîskarekî çînî ku nivîsandinên xwe dixistin ser kaxezê, dikaribû li Amerikayê bibata xwendin, bi riya çapkirina pirtûkan berhem zû belav dibûn. Lê dengbêjekî an jî çîrokbêjekî ku zimanê wan hîna nehatibû nivîsandin, çiqasî hêja bûna jî, ew nikaribûn weke tiştên ku nivîsandî, zû bihata belavkirin. Ji ber vê yekê jî kultura nivîskî zû dibû gerdûnî û ya ku nenivîskî bû jî, hergav heremî dima. Şitexalî û gotin di mala xwe de dima û nivîsandin jî ji xwe re, ya li welatê xwe yan jî li welatên cîhanê digeriya. Eynî weke ku li ser rastiyê jî hatiye gotin; heta ku rastî li Bexdayê li çaroxê xwe geriya, derewan xwe ji Bexdayê gîhandine Stenbolê. Ev şibandin ji bona şitexalî û nivîsandinê jî derbas dibe...

Di navbera ziman, edebiyat, raman û kulturê de, tevgirêdaneke xurt heye. Hinek formên kulturî weke wêne, heykel û hunera destan, heta niha tucara, bi haweyekî aktîf hewcedarê ziman nebûye. Ji bona mînak em bêjin; wêneçêkerekî kurd, ji bona hunera xwe zêde hewcedarê zimanê kurdî nabe. Ji xwe alavên wî yên hunerî jî, ne ziman bi xwe ye. Lê belê di hunerê edebiyatê de, ziman alavê hunerî ya yekemîn e. Bêyî ziman edebiyat ne mimkun e. Di hunerê edebiyatê de ziman him armancê û him jî dibe alavê çalakiyê bi xwe. Ji ber vê yekê jî ziman dike-

ve navenda xebata edebî. Helbet ew ziman zimanê nivîsandinê ye. Jixwe mana edebiyatê bi zimanê latînî tê mana tiştên nivîsandî. Ango lîteratûr. Helbet ew mana edebiyatê hinekî teng dimîne. Li ser vê mijarê pir lêkolîn hatine kirin, gotûbêj hîna berdewam dikin...

Weke ku min got; li ser peyva edebiyatê, ango lîteratûrê dîtinên cihê cihê hene. Ezê niha hinek ramanên ku li herema me hatine meyandin, rehê xwe berdane nava hişmendiya mirovan û bersiva realîta kultura Mezopotamya û Enedolê didin, li vir derxînim pêşiya xwendevanan: Dîrokvan Mihemed Arkoun di pirtûka xwe ya ku li ser Dîroka Ramana Erebî(1993) hatiye nivîsandin, ji bona peyva edebiyatê wilo dibêje; "Edebiyatê temsîlî hemû zanebûnên cîhanî dikir ku mirovên perwerdekirî dikaribûn him ji aliyê entellektûelî, him jî exlaqî û estetîkî de, jê fêde bibînin. Bi vî haweyî jî edebiyat dibû navê hemû çalakiyên ku zanebûn belav dikirin... Him çalakiyên zimanî, dîrokî, cografî, zanyarî û him jî kultura felsefî dibû aîdê edebiyatê. r. 52." Min pirtûka Arkoun bi zimanê Swêdî xwend û werger jî, ji zimanê Swêdî hatiye kirin. Li vê derê Arkoun edebiyatê bi mana fireh û ne bi mana teng tîne zimên. Edebiyat bi mana teng dibe tenê roman, çîrok û helbest, lê bi mana fireh ew dibe dîrok, zanyarî û kultura felsefî jî. Wexta ku mirov van çalakiyan hemûyan bi ser hevdû de bihesirîne, wê gavê ew ê sentezeke kulturî derkeve pêşiya mirovan. Helbet ew sentez li hemû civata ne wek hevdû ye. Li gora pêşketina dîrokî, konteksta sosyal û realîtên madî, haweyên vê sentezê dikarin werin guherandin. Çalakiyên zimên li gora civatan formên cihê cihê digirin. Li hinek deveran nivîsandin derdikeve pêş. Li hinek deveran bêtirîn şitexalî bi pêş dikeve û dibe çalakiya serekî. Ji bona mînak mirov dikare bibêje; li Kurdistanê ji nivîsandinê bêtir şitexalî bûye çalakiya serekî. Helbest û stran li ba kurdan bi haweyekî xurt pêşketine. Ew herdû çalakî jî, ji nêzîkayî de bi şitexaliyê ve giradayî ne. Wexta ku şitexalî weke çalakiyeke kulturî û formekî edebî giraniya xwe li ser civatê datîne, wê gavê helbest, stran, qesîde û qerf dibin çalakiyên yekemîn. Ev babetê ku me niha li vir hemû hejmartin, dikarin bi hêsanî di hişên mirovan de werin tamorkirin. Lê mirov, çiqasî jêhatî bin jî, nikarin bi hêsanî romanekê sax di hişê xwe de tamor bikin. Mirov çi-

qasî jêhati bin jî, xebateke ku li ser mijareke felsefê an jî dîrokê hatibe nivîsandin, dîsa nikarin hemî di hişê xwe de tamor bikin...

Welatên ku edebiyat û kultura devkî lê pêşketiye, şitexalî roleke xas dilîze. Li vê derê karakterên komunîkasyonê têne guherandin. Danûstandinên di navbera mirovan de rengên xwe diguherînin û dikevin haweyekî din. Rola hunermendan û nivîskaran, ji gelek aliyan de tê guhertin. Di vê tevgirêdanê de, li şûna dîtinê (çalakiya çav) guhdarîkirin (çalakiya guh) qomanda dixe destê xwe. Dîtin dikeve plana didûyan. Mirov li şitexaliyan guhdarî dikin û pirtûkan jî dixwînin. Li gora vê rastiyê rola kesên hunermend, ji aliyê komunîkasyonê de têkilhev dibe. Stranvan, helbestvan û çîrokvan, bi guhdaran re di cihekî berbiçav de, çalakiyên xwe pêk tînin. Lê ji bona ku mirov pirtûka nivîskarekî bixwîne, ne pêwîst e ku xwendevan û nivîskar di cihekî berbiçav de werin cem hevdû. Xwendevan dikarin pirtûka xwe li oda xwe, an jî li serê girekî, li nava bexçayekî, li tenişta riyekê, rikîtenê bixwînin. Xwendevan bi berhemê hunerî re ku di nava destê wî de ye, herdem dikare bi tenê bimîne. Ew û berhemê xwe, bi serê xwe ne. Wê gavê xwendevan û nivîskar hayê wan ji hevdû tuneye. Ew hevdû nasnakin. Lê di berheme kultura devkî de, çîrokvan, stranvan û helbestvan, bi guhdaran re di danûstandineke xuyanî de ye. Ew li miqabilî hevdû tûniştîne. Bi kêmanî şikil û şemalên wan ji hevdû re eşkere ye...

Helbet ev rastiyên jorîn bi pêşketina teknolojiyê re, hatin guherîn. Bi alîkariya elektronîk gelek deng, stran, muzîk û çîrok, ev nêzîka sed salan e ku dikarin werin tamorkirin. Em dizanin ku bi alîkariya teyp û sêlikan mirov dikarin îro gelek tiştan hilînin. Ev hilanîn çawa be jî dibin mobîl, ango dibin seyar. Cîh wê gavê nema weke berê rolekî sereke dilîze. Em îro bi hêsanî dikarin, bi hezaran kîlometre ji Kurdistanê dûr, li dengbêjên xwe guhdarî bikin. Li şûna dengbêj û çîrokbêjan bi xwe, îro mirov dikarin tenê dengê wan guhdarî bikin. Beriya heyamê teknolojiya elektronîk dengbêj an jî çîrokbêj diviyabû ku fizîkî li hemû deveran hazir û nazir bûna. Stran û çîrokên wan, tenê bi hebûna fizîka wan ve girêdayî bûn. Dengbêj û helbestvan diviyabû bi xwe li civatan bûna. Yan na komunîkasyon di nav wan û guhdaran de, tu cara pêk nedihat...

Li ser mijara kultur û edebiyata devkî, weke ku min li jor jî got, gelek xebatên hêja hene. Bi taybetî li herema me, nivîskarên ereb li ser vê yekê berhemên baş afirandine. Nivîskarên ereban li ser dema berî îslamê, ku jê re dema cahiliyê dihate gotin, lêkolînên hêja kirine. Di pirtûka xwe ya ku bi navê "Destpêka Helbesta Erebî" de, helbestvan Adonîs (Elî Ehmed Seîd), li ser kultur û edebiyata devkî disekine û bi taybetî li ser helbestên erebî ku berî îslamê hebûn, dûr û dirêj radiweste. Ev adeta devkî li ba ereban xwediyê hunermendiyeke dewlemend bû. Ev li ba kurdan jî wilo bû. Di vê adetê de jêhatbûna helbestvanî bi dewlemendbûna gotinan, bi keşfkirina tevgirêdanên nû û li ba guhdaran hiştina şopan ve, dihate pîvan. Ji ber vê yekê jî helbestvan dixwast ku helbestên wî, bersiva daxwazên guhdaran bidin. Guhdaran çiqasî helbestvan baş fahm bikira, ew jî evqasî dibû xwediyê cihekî bi rûmet. Zanebûna guhdaran û naveroka helbestan hevdû timam dikirin. Heger naverok li gora dilê guhdaran ba, helbestvan dibû gelerî û di çavên gel de mezin dibû. Helbestê ku li gora zanebûn, tecrûbe, qîmet û psikolojiya gel dihatin gotin, ew zû dibûn beşek ji kultura vî gelî. Ne tenê helbestvan diviyabû ku gelê xwe fahm bike, lê belê gel jî diviyabû ku helbestvanên xwe fahm bikin. Helbestvan û gel, an jî stranvan û gel, an jî çîrokbêj û gel diviyabû hevdû fahm bikin. Ev fahmkirin ne tenê ji aliyê ziman de bû, lê belê ev ji aliyê jiyanê de bû jî. Jiyana ku hemû tije qîmet, norm û serpêhatiyên mirovanî bûn. Hilbet em li vir ne qala jiyana biyolojîk dikin, lê belê em qala jiyana sosyal û kulturî dikin. Jiyana ku heyvanê mirovan bû, mirêka kulturan û cewherê sosyal bi xwe bû. Ev jiyan ji aliyê helbestvanan û dengbêjan ve dihate formûlekirin. Di formûlasyonên xwe de hunermend çiqasî biserketî ba, li ba guhdaran jî evqasî hezjêkirin li miqabilî berhemên wan zêde dibû.

Adonîs li ser vê kultura devkî wilo dibêje; "Di destpêkê de devkî bûn, qet nebe dihate mana guhdarîkirinê, ji ber ku deng pêşî û berî hemû tiştan bangî guh dikir. Adeta devkî bi vî haweyî jî dibû xwediyê hunera îfadekirina helbestvaniyê. Ev yeka hanê jî wilo dihate fahmkirin; hunera xweîfadekirinê ne di çi gotinê de bû, lê belê di çilo gotinê de bû. Ev yeka pir girîng bû, ji ber ku di dema berî îslamê de, dengbêjan tiştên ku

guhdaran dizanî bû, di stranên xwe de digotin. Weke rabûn û rûniştina (urf û adetên) civatê, şer û mêrxasî, talan, serfirazî û neserfiraziya mirovan...Wezîfa dengbêjan ew bû ku ji kolektivîta xwe re, ji moralê wan î rojana re û ji hebûna exlaqê grûba xwe re, fotografekî baş bi zimanekî helbestvanî bidin grûba xwe. Ji xwe bêtirîn dengbêjan qala grûba xwe dikirin, ji dengê xwe bêtir dengê grûba xwe dianîn zimên. Mirov dikare vê yekê wilo jî îfade bike; bi riya ku ew qala grûba xwe bikin, wan di rastiya xwe de qala xwe dikirin, wan bi vî haweyî jî xwe îfade dikirin. Helbestvan şahidekî dengbêj bû. r.16" Dengbêjên ku şahidê dema xwe bûn, diviyabû serpêhatiyên gelên xwe, mêrxasî û xaîntiya di nava mirovan de, derbasbûna gelî ya dîrokî, şerê navxweyî, evîna trajedîk, bûyerên girîng di dîroka gel de, nasnama grûb û kesên xwe, şerê grûba xwe bi grûbên din re ûhw, bîanîbana ser zimên. Ev mijarên ku min li vir hejmartin, mijarên sereke bûn û ji bona hemû babetên edebiyatê derbas dibûn. Mirov bi kurtî dikare wilo bibêje; di nava mijara dengbêjan û mijara edebiyatê de, tu dîwarê mezin tune bûn. Tenê formên xweîfadekirinê dihatin guherandin. Dengbêjên helbestvan mijarên xwe bi stranî digotin. Di stranan de deng û herk gelekî girîng bûn. Bi taybetî qafiye roleke mezin dilîztin. Weke dengê ava çeman, gotinên bi qafiye bi dûv hevdû de diherikîn. Di konteksta kulturî de, ew dibûn weke golê, dibûn weke derya û di stewandina xwe de jî, ew dibûn weke Okyanûsê...

Zimanê stranan diviyabû xweş bihata guhên guhdaran. Di vir de him gotin û him haweyê gotinan, him bûyer û him jî herka bûyeran, diviyabû bi hawayekî estetîkî hevdû timam bikin. Dengbêjên ku li ba wan estetîk kêm bê an jî qet tuneba, ew nikaribûn bibûna dengbêjên gelerî. Estetîzekirina gotin û bûyeran, ji bona populerbûna dengbêjan xala yekemîn bû. Tevgirêdana bûyeran, mantiqê pêşketinê, herka zimên, dengekî neqandî, dramatîzekirin an trajedîzekirin, an jî komedîzekirina serpêhatiyên gelerî, zelalbûna hevokan, zimanekî hêsanî, naverokek xurt û neqandî, jêhatbûneke kulturî; erê hemû bi hevdû re estetîka edebiyat an jî kultura devkî pêk dîanin. Ma edebiyat û kultura nivîskî, kêm an jî zêde ne wilo bû? Mirov dikare bibêje ku ev sixletên estetîkbunê, ne tenê ji bona edebiyatê, lê belê ji bo

hemû haweyên hunerî jî derbas dibin. Ji xwe hunermendî di vê rastiyê de ye. Tiştên ku huner ji tiştên rojane û normal cihê dike ev yeka ye. Hunermend zor dide xwe ku yekalîbûna rojane, herka normal ya civatê, şitexaliya mekanîk, jiyana bêyî kûr fikirandinî û mînakên ku li civatê berê hebûn derbas bikin û tiştên nû biafirînin. Azadiya huner di vê xebata tov de bû. Tenê wilo pêşketin dikarîbû çêbiba. Heger hunermendî li ser vî mantiqî nemeşiya, xebata xwe li gora vî mantiqî tekûz nekirbûya, ewê mirovan ji aliyê hunerî de, di şûna xwe de derziyî bihejmartina. Wê gavê kalîta hunerî nikarîbû pêş de biçûya. Di rewşeke wilo de, wê gavê gûv gûv û leq leqa rojê ewê zêde bibûya, ewê li şûna kalîtê kvantîte pêş de biçûya...

Hilbet li ser gotina "edebiyata devkî" dîtinên cihê cihê jî hene. Piştî 1960î li ser fenoma"edebiyata devkî" gelek lêkolîn hatine kirin. Lêkolînvanan dixwastin ku balê bikişînin ser mijara gelên ku hîna nebûbûn xwediyê zimanekî nivîskî. Bi taybetî gelek gelên ku li Efrîqa bûn, heta roja îro jî nebûbûn xwedî alfabê û zimanê nivîsandinê. Vê rastiya ha dikir ku lêkolînvan berê xwe bidin problemên gelên ku bêyî kultur û edebiyata nivîskî bûn. Ne tenê li Efrîqa lê belê li hemû cîhanê bi hezaran gel û ziman hebûn ku hîna ew nebûbûn xwediyê zimanekî nivîskî. Li gora rastiya ku li cîhanê hebû, gelek grûbên etnîk, gel û neteweyên ku hebûn, weke gelê ku bêyî edebiyat dihatin naskirin. Ji ber ku edebiyat, weke ku di zimanê latînî de hatibû pejirandin, diviyabû ku bi nivîskî bûya. Ev xeyala (tesewira) Ewrûpayî, bi xwe re gelek problemên metodîk pêk dianîn. Di praktîkê de, bi vê têgihiştinê tenê ewrûpayî, çend netewên Rojhilatê û emerîkanî dibûn xwediyê edebiyateke nivîsandî. Lê belê gelek edebiyatzanan, antropologan, dîrokvanan û sosyologan çewtiya vê dîtinê zû dîtin. Piştî pir lêkolînên zanyarî, lêkolînvanan îcar qala "edebiyata devkî " kirin. Ji wê rojê û vir de gotina "edebiyata devkî" tê munaqeşekirin. Li ser rastî û çewtiya vê gotin û vê tespîtê bi sedan lêkolîn hatine nivîsandin: Hinek dibêjin ku ferq di navbera edebiyata devkî û edebiyata nivîsandî de tuneye. Edebiyata nivîsandî li ser edebiyata devkî bilind bûye, ew weke model ji xwe re girtiye, eynî ziman bi kar aniye û li ser eynî realîta sosyal û kulturî pêş ketiye. Hemû kes dizane ku şitexalî beriya nivîsan-

dinê çêbûye. Di edebiyata devkî de, bermayên çalakiyan, bêyî hunermendan nikarîbûn hebûna. Lê belê di edebiyata nivîsandî de, bermayên çalakiyan li derveyî jiyana hunermendan jî hebûn. Ew jî nivîsandina berhema bixwe bû. Bi pêşketina teknolojiya elektronîk re ev ferqa ha jî ji navbera herdu formên çalakiyê niha rabûye. Ji ber wilo jî ferqeke mezin di navbera edebiyata devkî û ya nivîsandî de nemaye. Wilo dibêjin hinek lêkolînvan... Hinekî din jî dibêjin ku edebiyat, çawa jî be divê nivîsandî be. Edebiyat û nivîsandin weke goşt û nenûkê bi hevdû ve girêdayî ne. Di navbera nivîsandin û şitexaliyê de, ferqên bingehîn hene. Mirov nikarin vê realîta ha nebînin, ev yeka bi serê xwe weke dîwarekî di navbera herdû çalakiyan de disekine, tê gotin...

Min li jor qala pirtûka Walter J, Ong kiribû. Ew li ser gotina "Edebiyata devkî" xwediyê dîtineke pir cihê ye. Ong di pirtûka xwe de, li ser vê mijarê wilo dibêje; "Nabe ku mirov li ser adetên devkî, an jî mîrasekî ku devkî heye, an jî babetên ku devkî ne, an jî stîlên ku hunerî ne, weke ku ev yeka 'edebiyata devkî ye ' bifikire. Ev tiştê ha eynî dibe weke ku mirov hespekî weke erebayekê ku nexwediyê tekeran e, ango bêyî ling e bifikire. r. 24-25". Ong dûra mînaka hesp û erebê ji aliyê semantîk de, vedijenîne. Li ser ferqên di navbera hesp û erebê de, ferqên fizîkî, ferqên biyolojîk, heta xwarina wan disekine. Ji bona mînak; hesp ceh û kayê dixwin û erebe jî bi benzînê dimeşin. Hesp xwediyê mû ne, erebe tê boyaxkirin, hesp zindî ye, erebe jî mirî ye, ûhw. Lê bi raya min hewildana wî, ne gelekî bi serketiye. Ong di vê mijarê de hinekî dogmatîk tevger dike. Li vir Ong du tiştên fizîkî bi hevdû re muqayese dike. Naveroka van herdû tiştan ne yek in, materyalên van herdû tiştan ne yek in, li vir yek canê mirî û yek jî materyalê mirî ye. Ji hespê re, beriya hemû tiştan pêvajoyên biyolojîk bûne sebeb, lê ji erebê re pêvajoyên fizîkî-kîmyewî bûne encam, erebe bi taybetî berhemê xebata mirovan e, ûhw. Ji ber vê yekê jî mînaka hesp û erebê, di vê kontekstê de derbas nabe. Em dizanin ku ziman her ziman e, çi nivîsandî û çi jî nenivîsandî be. Wexta ku ziman nenivîsandî be, ew dîsa bi hemû avaniya xwe ziman e. Wexta ku ew nivîsandî be jî, ew dîsa bi hemû avaniya xwe ziman e. Ev realîta ha rola ziman di edebiyatê de zêde nikare biguherîne. Di vir de te-

nê formalîta zimên dikare were guherandin, lê belê naveroka zimên hergav heye û ew çilo be jî, ziman hergav bi mirovan re ye...

Em hemû baş dizanin ku ziman û edebiyat nikarin ji hevdû werin veqetandin. Edebiyateke bêyî ziman, li tu deveran tuneye. Lê dîsa em dizanin ku li cîhana me zimanên bêyî edebiyata nivîsandî hene. Zimanên wilo xwediyê edebiyateke devkî ne. Ev edebiyat pir dewlemend e û dîroka vê jî ji edebiyata bi nivîskî pir pir dirêjtir bûye. Ji ber wilo jî gotina edebiyata devkî, bi dîtina min rast e. Lê belê di vê navê de, tiştekî din jî heye; di navbera edebiyata devkî û edebiyata nivîsandî de, hinek cûdayiyên formel hene. Di edebiyata devkî de stran, çîrok, epop, metelok, qerf ûhw, malê kolektivîtekê ne. Ew bi xwe mîrasa gelekî ne. Bîr û dîroka gel, di vê kolektivîtê de ye. Berhemên ku di vir de têne afirandin, netîca xebata hezar salan e. Ew ne tenê malê dengbêjekî, çîrokbêjekî an jî qerfokekî ne. Lê di edebiyata nivîskî de, berhemên hunermendan netîceya xebatake şexsî ne. Rastiya sosyolojîk wilo ye. Nivîskarê wê edebiyatê xuyayî ne. Nabe ku mirov berhemên wan biguherînin. Lê di edebiyata devkî de, berhem dikarin gelek caran werin guherandin. Her dengbêj li gora jêhatîbûna xwe dikare hinek tiştan li stranan, çîrokan, epopan û qerfan zêde bikin. An jî jê kêm bikin. Lê ev îmkana hanê di edebiyata nivîsandî de, qet tuneye. Edebiyata nivîsandî xiliqandî ye, lê edebiyata devkî vekiriye. Wexta ku berhem tê nivîsandin, ew di eynî wextê de, tê xiliqandin, lê belê edebiyata devkî çiqasî bê gotin jî, ew dîsa hergav vekirî ye. Edebiyata devkî mêvanan dawetî mala xwe dike, comerd e, heta mirov dikare bêje ku; ew ji edebiyata nivîsandî hîna demokratîktir e. Gelek hunermendan baskê xwe li vê mîrasî ceribandine. Lê di edebiyata nivîsandî de, ew îmkanê ha tune. Tu çiqasî bixwaze jî, weke hunermend tu nikarî berhemê nivîskarekî din biguherîne, an jî bi xebata xwe re wê bike yek. Hinek mirov dikarin wilo bikin, lê ku mirov ev kir jî, wî çaxî mijara sextekarî û duristiyê derdikeve rojevê. Ji ber ku wê gavê mirov dibe diz. Dizî jî di warê hunerî de ne karekî zêde biserketî ye.

Di edebiyata devkî de, berheman hîna serbixwebûna xwe bi dest xwe nexistiye. Berheman qedera xwe hîna tayîn nekirine. Berhemên devkî xwediyê otonomiyeke relatîf in.

Hefsarê vê otonomiyê hîna di destê hunermendan de ne. Heta ku berhem carekê neyêne nivîsandin, tixûbên vê otonomiyê, hergav dikare were guherandin. Tixûbên vê otonomiyê li gora jêhatîbûna hunermend, dikare bi rastî têkeve formên tevlihevî estetîkî an jî bibe mînak ji bona estetîka formên hunera zelal û berbiçav. Heger hunermend bi mijara xwe ve baş girêdayî be, hilfa xwe baş bide bûyera ku mijar li ser ava bûye, heger bixwaze ku her kevirekî avaniya xwe bi hosteyî daniye cihê wî, gotinan di berhemê xwe de, li gora edeba konteksta mijarê bi kar bîne û avaniyeke harmonîk ava bike, wê çaxê hunermend otonomiya berhema xwe bi haweyekî pozîtîf bi kar aniye. Na, heger hunermend bi haweyekî sîstematîk li ser mijara xwe nesekine, xwe li ser mijarê hûr û kûr neke, gotinan li gora kontekstê bi kar neyîne, mijarê ji aliyê hunerî de pîne bike û di warê form de bêtefsal be, wê çaxê berhem him ji aliyê ziman, him ji aliyê kontekstê û him jî aliyê hunerî de, ew ê gelekî qels bin. Ji ber vê yekê jî otonomî dikare gelek caran çewt were bikarînin.

Di edebiyata devkî de çarçik ji berhem re tuneye, lê di edebiyata nivîsandi de berhem hatiye çarçik kirin. Ev çarçikkirina berheman dibe nuqta dawî, lê di edebiyata devkî de nuqta dawî tuneye. Di edebiyata nivîsandî de, gramatîka ziman tenê formel e. Lê di edebiyata devkî de, gramatîka formel ne xala yekemîn e. Nuqta ku di edebiyata nivîsandî de li deverekê hatiye danîn, dikare di edebiyata devkî de li devereke din bi cih bibe. Di edebiyata devkî de, cihê nuqta dawî ne diyare. Nuqte li gora jêhatbûna hunermend an jî qelsbûna hunermend, dikare cih biguherîne. Heta mirov dikare bibêje ku nuqte, dikare bêyî cih be jî. Li gora daxwaza hunermend nuqte, di edebiyata devkî de cih diguherîne. Lê belê ev di edebiyata nivîsandî de ne wilo ye.

Mirovên kurd gelek caran bihîstîne;"Kurd evîndarê şitexaliyê ne". Hilbet ev gotin ji pir aliyan de, gotineke rast e. Rastiya vê gotinê di rastiya rewşa edebiyat û zimanê me de ye. Edebiyata ku devkî be, hilbet ew zimanê devkî jî pêşdixîne. Ji ber vê yekê jî, şitexalî li ba civata kurdan pêşketî ye. Her kurdek dikare bi hêsanî bibe dengbêjek, her kurdek dikare bi hêsanî bibe şairek, lê bêle her kurdek bi hêsanî nikare bibe nivîskarek. Nivîskarê civata kurdan bi ti-

liyên destan dikarin werin hejmartin. Lê şair û dengbêjên kurdan pir in!

Aliyekî vê mijarê yê din jî heye; zimanê kurdî li welatê me heta niha bi haweyekî fireh nebûye zimanê birêvebirin û perwerdekirina civatê. Li Kurdistanê perwedekirina bi zimanê kurdî, di gelek heyaman de, ya qet tunebûye ya jî gelekî qels maye. Zimanên biyanî li ser kurdan hergav hatine ferzkirin. Di civata kurdan de dînê mezin (misilmantî) û zimanê wî biyanî bûne, perwerda dînî û felsefî biyanî bûne, gelek deman polîtîka biyanî bûye, piraniya edebiyat û zanyariye biyanî bûye, bi kurtî hemû pêvajoyên ku zimanê nivîsandî pêşde dibin, li Kurdistanê biyanî bûne. Di bazara Kurdistanê de pir caran zimanê biyanî hatine bikaranîn. Di bazirganiya derve de zimanê biyanî hatiye bikaranîn, ûhw. Di rewşeke wilo de, hilbet zimanê kurdî yê nivîsandî pêşde nakeve. Ma di rewşeke wilo de ew ê ziman çawa pêş de bikeve?

Ev realîta ku min li jor qal kir him ji aliyê civatî de û him jî ji aliyê psîkolojîk de, bûye weke dîwarekî û ketiye pêşiya ku zimanê kurdî ji aliyê nivîsandinê de, gavên mezin biavêje. Li miqabilî wî dîwarê ku him psîkolojîk him jî kulturî ye, weke reaksiyon li ba kurdan zimanê şitexaliyê pêşketiye. Ne ji ber ku azadî li welatê me hebû, lê belê ji ber ku desthilatdariya li ser zorê li welat hebû, zimanê şitexaliyê ji xwe re hinek rê û derfetin din dîtin. Pêşketina zimanê şitexaliyê li Kurdistanê ne ji kêfê re bûye, lê belê ev ji ber mecbûriyeta civatî bûye. Heger wilo nebûya, ango heger zimanê şitexaliyê pêşneketa, ew ê zimanê kurdî heta niha zû winda bibûya. Şitexaliya zimanê kurdî, di bingeh û rastiya xwe de, xweparaztina zimanê kurdî bi xwe bû. Di vê tevgirêdanê de şitexaliya bi zimanê kurdî, bi hemû haweyê xwe helwestgirtineke welatperwerî bû.

Li aliyê din mirov dikare bibêje ku gelê kurd, di hemû dîroka xwe de, ji hêzeke ku bi riya desthilatdariya polîtîk, ji zimanê şitexaliyê derbasî zimanê nivîsandinê bibe jî, hergav mehrûm hatiye hiştin. Zimanê nivîsandinê beriya hemû tiştan hinek dezgehên gelerî, kulturî, dînî an jî dewletî dixwaze. Bêyî dezgehên newî û gelerî zimanê nivîsandî nikare pêşkeve. Ma ne divê hinek kes bi vî zimanî bixwînin û binivîsînin? Heger ku ev çalakiya xwendin û nivîsandinê roj bi roj berhemên nivîsan-

dî neafirîne, wê gavê zimanê nivîsandinê xurt nabe, lê belê ziman di gelek waran de jî qels dimîne. Heger em îro zimanê kurdî bidin ber zimanên cîran û ne bidin ber zimanên hinek eşîrên Efrîqayî, wê gavê mirov ê baş bibîne ku zimanê kurdî ji aliyê nivîsandinê û berhemên nivîsandî de, îro di gelek waran de qels maye... Bi taybetî di mijarên zanyarî de.

Li Kurdistanê edebiyata devkî, ji aliyê çînayetî de mohra zehmetkêşan bi xwe re hilaniye. Her çiqas edebiyata devkî, piraniya mijarên xwe ji jiyan û serpêhatiyên arîstokratên eşîran, axan, began û mînakên xwe ji çîna serdestan bigire jî, edebiyata devkî bi xwe ji aliyê çîna zehmetkêşan de hatiye afirandin. Hunermendî ji aliyê sosyal de, li Kurdistanê hergav bûye karê zehmetkêşan. Di hunermendiya kurdan de, bi hemû haweyî zimanê gelê kurd hebû. Çîna serdest li Kurdistanê hergav berbervan û şervan bûn, lê ew tucara nebûn hunermend. Di civata eşîrî de hunermendî weke karekî zêde bi rûmet ne dihate pejirandin. Li gora serdestên kurdan hunermendî mitirbî û qeşmerî bû. Li gora exlaqê eşîran karê çîna serdest tenê şer û birêvebirina civatê bû. Em hemû baş dizanin ku axayên mitirb tunebûn, lê di nava eşîran de mitirb hebûn. Ne mitirb dikaribûn bibûna axa û serokeşîr, ne jî axa û serokeşîr dibûn mitirb. Ji aliyê sosyal de, di nava eşîrê de kar bi xetên qalind ji hevdû hatibûn cûdakirin. Avaniya civatê ji aliyê sosyal û kulturî de gelekî zelal bû. Wê zelalbûnê bi xwe re, dîwarên psîkolojîk ava dikirin. Ji bona mînak mirov dikare bibêje; tu cara dengbêjên kurdan nikaribûn bibin serokên eşîran, nikarîbûn bibin axa, bibin beg, bibin mîr, lê belê ew hergav zarokên gelê xwe bûn. Normên civatê wilo bûn. Dengbêj li ba gelê xwe bûn. Ew ji nava kûraniya gelê xwe hatibûn. Bi edeb û kultura gelê xwe mezin bûbûn. Heger çiqasî wan li ser axa û serokê eşîra stran bigotina jî, dîsa wan di vê mijarê de jî, hest û exlaqê gelê xwe dianîn zimên. Qala karekterên gelê xwe dikirin, sixletên wan dipesinandin. Qala sempatî û antîpatiya mirovên kurd dikirin. Evîndariya kurdan, dilbijandin û pîvanên kurdan bilind dikirin. Welatperweriya ziman û welatê xwe dikirin. Dîroka gelê xwe jê re digotin. Ew hişê gelê xwe bûn. Di tarîtiyê de ew ronahî bûn. Di bêdîrokiyê de ew dîrok bûn. Di ecemîtiyê de ew hoste bûn. Di bêgotiniyê de ew kaniya go-

tinan bûn. Ji hemû tiştan girîngtir jî, wan zimanê kurdî pêşdixistin û diparastin!

Li Kurdistanê rehên hunera devkî (çi kulturî û çi edebî be) ji nava hêzên zehmetkêş derketine holê. Çîna serdest dikarîbû carna hunera devkî tenê, ji aliyê sosyal û ekonomîk de bihimîne. Serokeşîran, axayan, began û mîrekan ji hunera devkî re, dikarîbûn hinek fersendên pêşketinê peyde bikin. Gelek serdestan wilo dikirin. Lê hinek beşên çîna serdest, fersendên ku ji bona hunera devkî di civatê de hebûn jî, carna bi hêsanî ji navê radikirin. Di dîroka Kurdistanê de ev yeka gelekî eşkere xuya dike. Di demên wilo xerab de jî hunermendan, berê xwe didan gel û di nava gel de, ji xwe re li cihê parastina ziman û kulturê digeriyan...

Bi kurtî mirov dikare wilo bibêje; edebiyat û kultura devkî li Kurdistanê kaniya hunermendiyê ye. Ev mîrasa devkî pêwîst e bê parastin, pêşdexistin û modernîzekirin. Lê belê ji hemû tiştan girîngtir jî, divê ev mîrasa ku bi devkî ye, hema niha û zû derbasî ser nivîsandinê bibe. Ji ber ku nivîsandin xelaskirina vê mîrasê ye. Bê nivîsandina vê mîrasa bi devkî, ewê gelê kurd perçakî ji dewlemendiya xwe winda bike. Keda ku bi hezar salan hatiye komkirin, ewê ji ber nezantî û zexeliya mirovên kurd bertelef biçe. Ma ewê gelê kurd çi bike ji welatekî bê kultur û edebiyata xwe, welatekî bê ziman û dîroka xwe, welatekî ku hişk û vala be? Ma hema çiyayên Kurdistanê tenê besî me ne? Ma emê tenê çi bikin ji çiyayên tût û ziwa? Di rewşa îro de, edebiyat û kultur, ziman û dîroka kurdan, bi qasî erda welatê wan, ji wan re girîng e...

Di nava rewşenbîrên kurdan de, di mijara nivîsandina kultur û edebiyata devkî de, pir dîtinên çewto mewto hene: Hinek weke pelê Quranê nêzîkî vê mîrasa devkî dibin. Li gora wan pêwîst e tiştek di vê mîrasê de neyê guherandin. Divê mirov dest tiştekî nede. Divê mirov bisekine. Lê divê mirov jî îcar ji xwe bipirse; em ê li benda kê bin? Em ê li benda çi bin? Em ê li benda kîjan demê bin? Ma ne divê ku mirov rojekê dest pê bike? Li gora hinekan divê hemû herf û gotin, mînak û devok di cihê xwe de bimînin. Lê belê em hemû baş dizanin ku tenê versiyonek, tenê devokek, tenê çîrokek, tenê heremek li welatê me tuneye. Di vî warî de welatê me dewlemend e. Her hunermendekî li herema xwe û bi devoka xwe, li gora zanebûn û

jêhatbûna xwe, ji xwe re paleyiya edebiyat û kultura devkî kiriye. Ev paleyî ne tenê ya genima ye, lê belê di vê paleyê de nîsk û ceh jî heye. Di vir de zîwan û qirşik jî hene. Di warê nivîsandina edebiyat û kultura devkî de, ji ber vê rastiyê, dogmatîzma metodîk karê xeraban û nekirkêran e. Bi raya min ev metod, di bingehê xwe de metodê melatiyê ye. Mele li Quranê û Hedîsên Pêxember, bi vî hawayî dinerin. Di vê xalê de tiştê helî girîng bi raya min ew e; hemû kes li gora herema xwe, devoka xwe, zanebûna xwe, versiyonên ku ew nas dikin, dengbêj û çîrokbêjên ku li ba wan hene ji xwe re bike bingeh û tekstên nivîsandî zû biafirîne. Ev tekst dikarin roman bin, çîrok bin, çîvanok bin, helbest bin, metelok bin, şano bin, stran bin, ceribandin bin... Erê, pêşî divê dewlemendiya ku li welatê me heye, bi hemû formên ku pêwîst be, bi hemû formên ku hene derkeve meydanê. Em divê dewlemendiya welatê xwe ku di warê edebiyat û kultura devkî de heye pêşiya pêşî, bi hemû haweyê wê baş nas bikin. Hemû form, naverok û versiyonên ku hene, divê bi hosteyî werin xelaskirin. Di vê tevgiradanê de, xala helî girîng xelaskirina skelet û avaniya me ye. Ji ber ku tiştên helî girîng skelet û avanî ye. Tiştên biçûk dikarin dûra jî werin munaqeşekirin û nivîsandin. Lê mixabin îro tiştên biçûk ketine pêşiya tiştên mezin. Mirov dikare ji bona vê yekê wilo bibêje; wextî aşê me ji destê me here, lê belê kes hene ku di vê mijarê de bi dû çeqçeqê ketine. Di vê navê de jî, gayê me yê zer ji sibehê de winda bûye, em jî rûniştine bi bêhnfirehî çermê wî munaqaşe dikin! Ji xwe hinek ji me hene ku ya star, Xwedê mirovan ji wan bisitirîne; rûniştine li malê xwe û qiloçê gayê me yê windayî munaqeşe dikin... Ew dibêjin: "Ma gelo qiloçên gayê me yê zer rast bûn an jî xwar bûn? "... ❑

Qonaxek şev e yek...

OASMAN MEHMED

Bo apê min Evdilmecîd

1.
heyvê rahişt miskê
bi serê xwe dakir;
şev heliya û çû...

dîlana heyvê kirin;
şev weke diyekê giriya:
hêsirên wê bûn lat li devê şikeftê
di şikeftê de ew bû dîsa

heyv çû ber mirêkê;
şev û zarûyên xwe weke kavilekî û hejîreke berrî giriyan
û bêriya sermayê kirin
-di sermayê de
bêhtir bi xwe dihisin sin-
melkes dan destê heyvê
û gotinê, "ji lîwanê û wê de neçin piyên te!"

> (lîwaneke berazî bû;
> ewqasî ji hal û wextan re bi laş dibû
> bi pirpirînekên mizgîniyê re bi laş dibû
> derdor jî pê bi kêferattir dibû!)

anî bîra xwe
roniya her du çavên wê:
li Dehkê Kewa bû riya min hingê
belê, min bi xortekî gomlegzer vedabû
lê niha...
li lîwana wî kuştiyî me

şev, ey şev, tu ê kengî bê bi me ve?
ez ê kengî li qesra ayetan
qîza herî delal bim dîsa?

(bi hilma tarîxan vedibû û asê dibû
deriyê bakûr yê qesrê...)

ez a li ser axa ku heft şaristanî
lê ava bûne û xera bûne bûme piçik û parî
de ka kengî ez ê bi vê melkesê
xwe rêş bikim êdî?

(kevirê di navbera heyv û şevê de,
ew kevirê ku ji axa sar hez nake
didît, latên ku dihatin ajotin
ber bi xwîna genimî ve
û bi prengê agirê Xwedayan
çavê xwe dax dida..
guhê xwe bi yê wan ve kir carekê
û zemanekî qufilî danî ser lêva xwe:
ku behsa nebî bû
wê ew axîna sor tevî xweliyê bike...)

"şevê evîn jî terikand"
wilo digotin evîndar
û ji dilê xwe diketin...
êdî wê ne mexelê şahiyên laş ba şev,
wê ne hêlîn ba ji bo refê dilîniyan
wê ne perestgeh ba ji qalk û sîsalkên dil re

ku heyv jî giriya
rengê wê tefiya û çû
ez ê li şînê bim dîsa

2.
piştî ew gomlegê zer î bi xwîn
li navbera du qesrên ava
hejiya di destên girî de,
hûn ey gir û mehserên ku vê carê bê ba û baran man
di vê şîna zû de,
we jî yekcar xwe bi dilê tariyê de berda xwar
nezanîn,
lê dîsa hawar bi hawar...

Qudbê, her kevirekî wê
li aliyê şopê ditefiya
û hemû darberû li milê meşê
hewce nedikir, pel ji zû ve weşiyane
û hemû miştexişt û awaz jixwe reş girêdane.

ku bi meşa te ve nedihatin stêrk
yan jî ji berê ve nebûn
qey ji axê re jî hewce dibû lihêfeke din

jixwe niha milekî wê sar bû ax;
li Erbeta ku çartêl li pişta xwe şidandibû
Memekî din diket ser bêxewiya demê de
û bi firmêskên ku tevî avika sosinê dibûn,
Em yên dest li ber rû
        wek hêt
didîtin.

        (kêl, ev çend car bûn
        ku henekê xwe bi dest û rûyan dikirin?!)

kul, dikarîbû xwe bigihîne Zînê
di binê erdê re,
li pişt çartêlê;
ew birîna hê nû dikemilî...

25.05.1998/Stenbol

Gêre

1.
govend e
li qesra ba ye
tebax e
hejik li milê dilan e,
û bi miştaxan re
li benda zirnê ne çiya:

> (her du dûrayiyên ku ba
> bi laş dikin û bêriyê dikin.)

2.
ji ber nebûnê;
ya dest û piyên tengezarî û xerîbiyê...
va ye li çûnê ne
-çûna giran-
gul-genim
rû-zevî

niha fîkefîka wargehê kelê ye
û şûnwaran xefka xwe li çavên Şahmaran vedaye:
li tevna milê rastê dê ye,
û ya li milê diêşe
    kevir:

> (her du şûniyan jî
> xwe bi ser sûravka dil de
> dil, dimsa xwe
> tirş dike dîsa
> û meya şor,
> bi ser sînga
> kevirê bêsî de
> dirije û ditefe

ronahî ditefe
û tefîn, barana reş dihêle
li şûna xwe

ez bi firmêskan re li erdê dikevim
teşiya felekê
gêreya vî dilî
li mirinê dirêse...

19.04.1988/Nisêbîn

OASMAN MEHMED

Serpêhatiya derxistina du kovaran

HAFIZ QAZÎ

Di sala 1957an de, li bajarê Bexdayê kilubeka rewşenbîrî û civakî ya kurdî bi navê "Yaney Serkewtinî Kurdan" hebû. Wê demê ez di komîteya kargêr ya wê kilubê de endam hûm.

Me ew sifeta rewşenbîrî û civakî ya kilubê ji bo derxistin û weşandina kovareke edebî û civakî ya mehane kir behane.

Piştî komîteya kargêr biryar da ku ez bibim sernivîskarê kovarê, me daxwazek pêşkêşî wezîrê navxwe kir, bona ku destûra derxistina kovarê bide me. Wezîr kurd bû û endamê kiluba me bû.

Piştî çend rojan bersiva wezîrî gihaşt û qebûl nekir ku îcazeyê bide me. Min telefona wî kir û min pirsyar jê kir ka "çima cenabê te daxwaza me qebûl nekir?" Wî di bersiva xwe de got "ez ditirsim ku tu rûpelên kovarê bikî mînbereka siyasî. Min gotê: "Qanûna rojnamegeriyê rohnî û aşkere ye, eger hat û serpêçiyek ji kovarê xuyabû wê çaxê hûn dikarin qanûnê li hember kovarê bi kar bînin. Piştî çend hatin û çûnan

wezîr hate rayê û îcazeya derxistina kovarê da me.

Weşandina hejmara yekê ji kovara Hîwayê bû egera ku nivîskarên kurd li dor wê bicivin û berhemên xwe yên rengîn jê re bikin diyarî. Bi arîkarî û palpiştiya rewşenbîrên dilsoj, kovar roj bi roj pêş de çû û derketina wê bi tertîb û rêk û pêkî berdewam bû. Me herwisa karibû du bergên pirtûka "Mêjûy Kurd û Kurdistan"ê ya Şêx Mehemed Merdûxî bi navê weşanên Hîwayê çap û belav bikin.

Piştî weşandina wan herdu bergan partiyeke erebî ya nijadperest di daxuyaniyeke xwe ya siyasî de êrişeka dijwar anî ser kovarê, ew jî ji ber nexşeya (xerîteya) Kurdistana mezin, ya ku di wê pirtûkê de hatibû çapkirin.

Çend caran zabitê emniyetê ku kurd bû û berpirsiyarê çapemeniya kurdî bû hate cem min û ji min tika kir ku em weşandina nivîsên dijwar di kovarê de kêm bikin.

Kovarê di wê jiyana xwe ya kurt de roleke pir hêja û bi rûmet di warê edebî, çandî û civakî de leyist.

Piştî serketina şoreşa Çardehê Tîrmeha 1958an li Iraqê, damezrandina Komara Iraqê û derketina destûra dewletê ya ku di benda wê ya sisiyan de digot: "Ereb û kurd di welêt de şirîk in" û piştî vegera serokê nemir Barzanî ji Sovyetê û peydabûna geşt û bayekî demokratîk li Iraqê, min hîngê ew hemî bi firseteke baş dît da ku daxwaza îcazeya derxistina kovareke din ya mehane, bi navê "Ronahî" bikim. Dîtina min ew bû ku zimanê kovarê yê serekî kurmancî be, çunkî me heta wê demê çi kovarên bi kurmancî nebûn û devera kurmancîaxêvan, di warê xwendin û nivîsandina kurdiyê de gelek paşketî bû. Lê di wê demê de qanûnê rê ne dida ku mirov di eynî wextî de sernivîskarê du kovaran be. Ji ber wê çendê min Doktor Haşim Duxrameçî qani' kir ku ew li şûna min bibe sernivîskarê kovara Hîwayê bona ku ez bikarim daxwaza destûra derxistina kovara Ronahiyê bikim.

Cihê daxê ye ku ez 19 mehan li benda îcazeya wezaretê bo derxistina kovara Ronahiyê mam. Wezîrê berpirsiyar, ku hem kurd û hem nas bû, ji min re digot: "Destûrdan ne bi destê min e, lê bi destê Hakimê Eskeriyî ye". Wezîr hate guhartin û dostekî min yê ereb bû wezîr. Ez ji bo îcazeya derxistina Ronahiyê çûm cem wî û piştî nîv saetê wî wezîrê ereb destûrdana derxistina kovarê kir destê min.

Derketina kovara Ronahiyê dengekî pir hêja li perçeyên Kurdistanê veda. Bi dehan pîrozbahî û çavronî ji derveyî Kurdistana Başûr gihaştin

kovarê; mîna pîrozbahiyên Dr. Mîr Kamîran Bedrixan, mamoste Qanatê Kurdo, mamoste Cegerxwîn, mamoste Qedrî Can û komeleyên kurdî li Ewropayê. Bi dehan şehrezayên dîrokê û zimanzanên kurd bi nivîs û lêkolînên xwe di rûpelên kovarê de beşdar bûn. Mamoste Hejar Mukiryanî roleka baş di çavdêriya çapemeniya kovarê de leyist. Kurd bi rengekî giştî bûn piştgirên kovarê.

Di demeke kurt de kovar, ji bo xortên ku şewiqdarên peyva kurdî ya petî û zimanê xwe yê şîrîn bûn, bû mîna xwendingehekê. Hejmareke wan xortan niha û nemaze li devera Behdînan fêrisên şiîr, lêkolîn û peyva kurdî ne.

Kovarên Hîwa û Ronahiyê bi hemî hêz û şiyanên xwe ketibûn ber xizmeta edeb û tora kurdî. Lê mixabin ku ew herdu kovar piştî kodetaya meha Sibata sala 1963an bi destê regezperêsên Be'sî yên ku hatibûn ser hukmî, hatin qedexekirin.

Nêzîkî çil hejmarên Hîwayê û yanzdeh hejmarên Ronahiyê di jiyê wan yê kurt de hatin weşandin. ❑

Mitirbekê bajar da hev

derziya şevê qulqulî kir cawa helbestê
ta sibehê, pal nedam xewa hefad
daketim kolanên Stenbola xalî
tirimpêl hatibûn şêlandin
civata kûçikan geriyabû
malek hatibû derevekirin
lawikekî virnî hatibû şiyarkirin
gulek hatibû jêkirin ji bexçeyekî
ku dilopek xwîn nisilîbû rîşê

bi stûşikestina gulê re şiyar bû bajar
vêk re dest çûn pejnkariyên peyrûze
da bidarizînin diziya gulekê
sed cure çek dirêjî ser mitirbê bûn
sed cure gulle berdan
laşê mehîna jar
tekerên kaşkeyê
bedena mitirbê

mitirbek; bedewqemerek, simqelişiyek
nema bajêr bide hev
ji ber wê ye gildîna sûk û kolanan

6 Tîrmeh 1998

KAWA NEMIR

Nemir

HUSEIN MUHAMMED

Tu bawer dikî ku ez ji sala 1398an heta îro xwendevan bûme? Rojekê, dema ku ewrên reş û tarî asîmanê bajarê me girtibû, baran dibarî û gurmîna birûskan bû, li pirtûkxaneya mezin ev pirs ji min hate kirin. Pirsker kurekî xort, ê ku min navê wî nedizanî lê bi serûçavan dinasî, bû. Ew hê ji min bêtir li pirtûkxaneyê dima. Dema ku beyaniyan dihatim, ew li wir bû, û dema ku êvaran vedigeriyame malê jî, hîn jî ew li wir dima. Ji ber ku min biryar dabû ku biçime zanîngehê dîrokê bixwînim, loma jî ez dihatime wir û bi xwendinê re min hinek tişt ji xwe re li ser deftereke dinivîsîn da ku di pêşerojê de min karibûya bi hêsanî ew tiştên xwendî dubare bikirana û faydeyek ji wan bidîta.

Min guman dikir ku ew jî xwendevanek e lê wî weke min pel û pênûs bi kar nedianî, wî mîkro-kompiyotereke piçûk hebû û hertiştên xwe li ser dinivîsîn. Ji ber ku rewşa wî ya aborî ji ya min pir baştir bû, ez heta hesûd jî dibûm.

"Tu çi dibêjî?" ez, ku ecêbmayî bûbûm, jê pirsîm.

"Tu bawer dikî ku ez ji sala 1398an heta îro xwendevan bûme?"

Bêjeyek tenê jî ji devê min derneket û min tenê karî serê xwe bi wateya "na" bihejînim.

"Ez derewan nakim", wî da bawerandin. "Sala 1398'an ez çûme Parîsê ku tê bikevime zanîngehê û li wir bixwînim. Sala yekem pir baş borî lê di salekê de ez wisan baş fransî fêr bûm ku min dikarî biçime bîraxane û kerxaneyan. Xwendin jî bi latînî bû û min ew ji

mêj de dizanîbû."

Paşî min piranî ji dema xwe li ciyên xweştir lê xerabtir buhurand. Êdî min nedikarî li xwendegehê li ser kursiyên req û hişk ên textîn rûbinim. Xwendina min pêşde neçû. Hevalên min xwendinên xwe kuta kirin û hinek ji wan di heman dibisranê, ya ku min lê dixwend, ders jî didan."

"Hevaleke min soz ji dayik û bavê min re dabû ku ew dê çavdêriyê li min bike heta ku ez xwendina xwe bi dawî bînim û da ku tu karên xerab nekim. Wî hevalî nikarî ku astengan li ber min dane da ku neçime ser rêya xerab û nedurust lê soz, a ku ji bo bidawîanîna xwendina min dabû, bi cî bîne. Bi awayekî yan yeke din."

"Bi dehan car wî ez bi pereyên ji girtîgehan azad kirim. Sedemên girtina min jî ew bû ku min hertim şer bi jendirmeyan re dikir. Min bi xwe her qurûşê xwe li qumar-, bîra- û kerxaneyan pûç dikir. Piranî caran ez deyndar dimam lê wî hevalî qerzên min jî didan. Carna min sond dixwar ku êdî qumarê nelîzim lê min nedikarî sonda xwe bi cî bînim. Qumarê, eraqê û jinan ez bi zorê bi aliyê xwe de dikişandim. Jiyana min bê van her sêyan rojekê tenê jî nedibû."

"Dema ku ew heval cara duyem sala 1409an weke midûrê Zanîngeha Parîsê hate hilbijartin û ez hê nebûbûme baccalaureus, wî nifrîn li min kir: -Înşallah, heta tu xwendina xwe kuta nekî, qet nemirî."

"Wê demê min jê bawer nekir. Lê min dizanî ku wî hinek ders, ên ku li wê zanîngehê nedihatine xwendin, jî xwendibûn. Dema ku dîsan ketime zîndanê, min bawer kir ku ew -weke her carên din jî- dê min jê derxîne lê mixabin ez şaş fikirîbûm."

"Dema ku binavûdengtirîn parêzvanê min êdî alîkariya min nekir, ez ji zanîngehê hatime avêtin. Ji ber ku wî hevalî hewl neda ku min ji girtîgehê azad bike û ez ji jendirmeyan re jî bûme bela, wan ez firotime xwediyê keştiyeke avî ku jê re bibime xulam. Li wir ez ji nû tê gihîştim ku nifrîna wî hevalî rast derket."

"Ji ber wan karên zor û zehmet, ên ku xulaman ji bo anîn û birina keştiyan dikirin, zilamên xweşmêr jî tenê dikarîn du-sê salan li wir bijîn. Ez li wir şanzdeh salan xebitîm. Wê demê masûlkeyên

min ewqas mezin bûn ku Arnold Schwarzenegger jî çavbar nedikir ku ez heme."

Min lê nihêrî ku ew çiqas lawaz û zayîf bû. Ew li min bişirî û got: "Ji ber bikarneanîna wan ew heliyane."

Çîroka xwe domand: "Ango masûlkeyên min mezin bûn lê tişteke din li min neqewimî. Ez qet pîr nebûm. Herçî min xwarina nesaxlem dixanê Hemûzan nîşan daye ku ez bêguneh im û loma jî min serbest berdide."

"Roja din ez gihîştime Parîsê. Li wir ez neçûme zanîngehê lê ez bi pereyên xwendevanan dijiyam. Min ew dibirine kerxane û qehbexaneyan û çi muşterî, yên ku min dianîn wan ciyan, xwediyên wan bexşîşek ji min re dida. Xwediyên xwaringeh û vexwaringehan, ji bo ku min xwendevan dibirine cem wan, xwarin û vexwarinên bi dilê min bêpere didane min. Min ew pere, yên ku di destên xwendevanan de diman jî bi qumarê ji destên wan derdixistin. Piştre, ku tê gihîştim ku min Latînî ji bîr nekiriye, min dest bi wergerandina pirtûkan ji Latînî bo Fransî kir. Bi vî awayî ez binavûdeng bûm ji ber ku xwendevanan baş Latînî nedizanî û pêwistiya wan bi pirtûkên Fransî hebû."

"Ez wisan hêdî hêdî ketime zanîngehê. Le ji ber ku heşt salan li wir mam û qet pîr nebûm, hinekan guman û şik li min kirin û ez mecbûr mam ku ji wir birevim."

Dengê birûskan, her ku diçû, zêdetir dibû. Min devê xwe tijî kir ku bibêjimê da ku fîşa kompiyoterê ji dîwêr derbixîne lê min bawer kir ew karê xwe pir baştir dizane.

"Li Spanyayê min li dij Mauriyan şer kir. Kêm mabû ku ez dê bi Kristoffer Kolumbus re biçûma Amerîkayê. Sala 1492an bû, eger neyê bîra te."

"Li dehsala 4an a sedsala 16an min anatomî li Basilê xwend lê bi resmî ez cara din li salên 70yî ya heman sedsalê çûme Zanîngeha Cenevreyê. Li wir diwanzdeh salan xwend û heta min hinek ders jî ji kursên destpêkê dan lê ji berî ku teza min amade bibe, pêwist bû ku dîsan birevim. Hevalekî min, ê dema xwendinê ya li Basilê, ez nas kirim û bi dengekî bilind qîrî ku çima qet pîr nebûme. Ew bi xwe bûbû pîretewtek lê ez hê mîna berê mabûm."

"Ji wê rojê şunde min bi her awayî hewl daye ku xwendina xwe kuta bikim lê mixabin rewşa xerab û şansê gewad rêya min nedane ku daxwaza xwe bi cî bînim."

"Li ser sedsala 18an tiştekî taybetî nîn e ku bas jê bikim. Şoreşa Fransayê, tu bi xwe dizanî. Di êrîşa ser Moskovayê de ez yek ji şervanên Napoleon bûm."

"Piştî wan bûyeran jî şanseke baş neketiye destên min. Teza min li Viyanayê dê bihata çapkirin lê sala 1848an di nerehetiyên bajêr de pûç bû. Tezeke din di şerê navxweyî yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de ji min hate standin. Sala 1871an, dema ku kommundaran kaxizên min şewitandin, teza min amade nebû. Sala 1818an ji ber sedemên birçîtiyê li Berlînê amadekarî, yên ku min kiribûn, hatine ruxandin. Şeva 23yê Adara 1836an keseke dîn li Washingtonê hinek ji perên min çirandin û hinek jî xwarin!"

"Xwarin!?" wê yekê belkî pêtirîn bala min kişande ser xwe û loma pirsîm.

"Erê, xwarin. Di dema emeliyatê de gulolikeke peran di zikê wî de bû. Spas ji bo Xwedê ku ew mir, wekî din min dê ew bikuşta."

"Tu niha çi dixwînî?" min, piştî bîskeke bêdengiyê, jê pirsî.

"Ez parapsîkolojiyê dixwînim. Ev çardeh sal in ku li vir im. Xelk şik û gumanan li min dike lê, ku min ev teza xwe amade kir, ez jî dê pîr bibim û êdî ne pêwist e ku ji vir birevim. Ez ê aniha wê tezê amade bikim."

Hê ku ew negihîştibû pesnê xwe bide û methên xwe bike û bide xuyandin ku ew bi rewşa xwe ya niha dilşad û bextiyar e, dengê birûskekê bi hêz hat û min digot ku em dê di heman demê de ji ber wî dengî kerr û gêj bibin. Lampeyên pirtûkxaneyê bi bîskeke kurt temirîn. Bîna tişteke sotî hate min. Ew, ku xemgîn dixuya, zû çû ciyê xwe û dest bi girînê kir.

Mîkroya wî bi temamî şewitîbû, bûbû komeke maden û plastîka heliyayî.

"Weyla min di devê bavê te niyayo, şanso!!!" wî bi dengekî zîz û melûl got. ❑

Xwe bibexşîne

UMAY UMAY

Xwe bibexşîne
Rûmeta xwe ya têkçûyî
bibexşîne
ji ber ku di çemandina
dawî ya vê çerxê de maye
Bibexşîne, dadgeriya ku
birayê te kuştiye
û gelo tu hîna ji şoreşê hez dikî...
Di bîra min tê,
Daxwaza mirovên dîtir
Ew jî digel te bûn
Hoseya wan
Kizgiryokên zarokan dixeniqand
Te digot;
Hiş bin û
Dûratiya pêdivî têk nebin
Îskana qehwê
ji bo me herduyan hatiye girtin
Em bi hev re hatin dîtin,
hatin girtin...
Digel şermezariya bêgunehiya
serşor...
Ew xêliya bûkaniyê ya ku
mehûyan şuştiye
Li bejna me nayê êdî
Şîretên pîrejina ku
Bi perdeyên tentene kirî

hevînî dikir, neman...
Mixabin,
Belavbûna porê te
ya xwe li ber bê
tê bîra min
fêrmiskên te
Bi rûyê min ve perçim dibûn
Sibeheke pêncşemê bû
gava ku li koşeya şikestî
yê nivînê ser piştê digefilî
Tu pesna dipeyidî
û te digot;
Dawiya çîrokan
ne ji bo bîranînê ye
Bi pijiqîna agirekî
Dê ronahiyê vekuje
Paşê jî bi dengekî
Bi ser bêdengiyeke din
Tu ê hatibûya vekirin
Ez pir giran im
Êdî pir giran im
Ji wê gava ku tu çû yî
Êdî ez nexweş im

Wergera ji tirkî: **DILDAR ŞEKO**

Wênekarê derya rengan: BAHRAM HACO

MEDENÎ FERHO

Kîşwera Asya di nava bûyer û pêhatiyên mirovaniyê de kohne bûye. Feylesofî û hunerê di kefa mista mirovan de, hin bi qeftê şûr û darê rimê, hin bi dûvikê halet û destikê dasê, ku li kîşwera kohne û kevnare bûye basimbara di nava bexçikên veşartî de; bi kêrî kesî naye. Xîret û rûmet êdî di kefika mîzênê de bi çend otilmeyên qulqulkî tê firotin. Kî bala xwe dide astarzaniya ku berî Nostardamus dest bi çêkirina nivişt û mişûran kiriye? Pîşeyekî berz û pesindarî bû, lê dema niha!.. Ji roja ku Mele Selaheddînê Helexî, di nava dilekî şikestî de çû ser dilovaniya xwe, jinebiyên Êzîdî, kevnebiyên ku mêrê wan li seferberiya xopana geliyê Çanakale mirine, nikarin niviştokan jî bidin çêkirin. Evîna bi ked û çîlekêşî nema ye, lewra hestîkên Siyabend û Xecê di nava êşeke têr tevzînokî de dilerizin. Jiyan di nava gevzeka fîtoskî de melisî, bê dunde, mûr şikestî maye. Roja ku çîrok û çîvanokên Çiyayê Qaf, Ecuc û Mecucan hew pere anîn, çîrokzanên şêwirmendiya civakê dikirin hûrik hûrik ji holê winda bûn, tovê jiyanê kete mista tortore û tawraweyên ku di stranên Miradê Kinê de zîtirk û çindirkan didin. Jiyaneke bê xwedî, ku her kes bendeyî mirinê ye. Mirin êdî bûye sîwana parastinê.

Jiyan hewqasî bê xwedî... Mirov hewqasî bê derfet û mecal?!

Ew alavên hewqasî bi hêz ku dikarîbûn jiyanê biguherin; ew alavên ku di destên mirovên çê de bêhtirîn bi hêz dibûn; hişmendiya mirovan hinekî din wêdetir dibir, dîtin û ramanê mirovan ferehtir û kûrtir dikir, xisletên nû,

derfetên nû, ramanên nû derdixistin meydanê, kanîn? Einstein ku digot: *Zanistî teva, bilî bîranîn û ramandina rojane ne tiştekî din e.* Lê kî dikare wan hunermendên ku dixwestin li ser kevnariya dilê jiyanê bi pênûs û firça xwe xaleke ramûsanî, ku hinek ji wan dîn bûn, hinek ji wan iledarî bûn, hinekan ji wan xwe kuşt, yan jî mirovên mîna Lorca hatine gulebaran kirin, paş de vegerîne? Kî dikare Pîcasso ji sergomê vegerîne? Gelo ev xisletên kujerî, têr çîlekêşî teva tov û bizrê berziya hunermandan e? Weke Apollianaire dibêje, gelo hunermend teva: *Em ji bo paşerojan, di bêtixubiyên tixuban de şer dikin.*

Di kîşwera me de, ango Asya kohne û kevnare de, ev çend sedsal in ku navên di nava nivîştokên pîrebî û kalejinan de cih bigirin dernakevin meydanê. Di demeke ku çîle tenê bûye haletê şikestîk û dîlzariya komên xelkê, hesret û hêvî nemaye xala gerdana gewreyî yarê. Di nava tiraliyeke modernîzasyona demê de, bêhtirîn ji her demê zordestî û bendetî derketiye meydanê. Modernîzma ku berhemê hunerê azadixwaz e, di nava romantîzma ne rendekirî, hovane de dipelixe. Ev westandina demê, bêkewniya bi ser dilê mirovan de welî bûye ku mirovaniya Asya, xwedî dîroka di kûraya erdê de veşartî maye, pûç kiriye. Teknolojî bi kêrî mirovên westiyayî nayê. Bikaranîna teknolojî zîrekî û keda zêde dixwaze. Zexelî, li ser bingeha tirsê rûniştiye. Katik û xulfên zexeliyê, tiralî çil tovî kiriye. Maqûltiya xwedî xisletên berz, ku di nava xeftanê gerdûnê de dikare temtêl û xemleke bijartî derbixe meydanê, hişmendiyeke hunerî ya tacîdarî, -ku huner ne tenê ji bo huner ene ji bo çend metelîkên sifrî ne derbixe meydanê, yan, ji bo reklama cawê bi cûmika Xezmika dayika Gewrîkê Fileh ku halê lûya lorandina devê wî bû, dema fîqêna zarokên Midyadê dihate guhên wî, zimanê bi halê lûya dîlan digirt, di şikefta devê wî de hişk dibû, li nav ser û guhên xwe dida ye; hemberî qalib û pîvanên zordestên demê, alavekî berxewedanê, ramanekî dijwariya xweseriya dilpenahî, mînaka çanda ku qaqilkê navneteweyî parçe parçe dike ye.

Stranên jiyan û hêviyê, di sedsala bîstan de kêm hatin gotin

Gelo ew hoy û mercên civakî nebûn ku hişmendî û ramanekî civakî, li ser xaka Mezopotamya bi rêkûpêk bike? Bo Kevirên Qatoro, ku bi destên hostenecarên mîna Gewriyê Mala Hewşo, bi naxşe û xeyalên Mezmurî dihatin

BAHRAM

xemilandin bêne parstin. Merş, tayij, berr û xalîçeyên di nava diljeniya keçikên dîlzarê evîna şikestî bêne parastin. Neqşên bi tayên hevrîşmî li ser hîzarê miçekçek, ku Şahmaran li ser dihate rûnandin jîndar bibin. Ew xaka ku Gilgamêş li ava jiyanê geriyaye, hewqasî bê dûnde nabe. Lewra dijmin pêşî dest avête huner û çanda xaka Mezopotamyayê. Hûnandina civakê ku bi ta û rîsên huner, bi şîrêz û haveynê huner, bi hişmendiya têr mirovaniyê, bi dijwariyeke mezin hate wêrankirin. Ziman qedexe kirin, alfabe winda kirin, coxrafya talan kirin, dîrok winda kirin. Sewm û selatê jiyanê kor kirin. Kor, lal, kerr, nezanî bû tovê jiyanê. Lêbelê jiyan ne hewqasî bê dunde û bê çîk e. Xencera li ser sidanê bê xîretiyê, bi çakûçê bê rumetiyê hate çêkirin û di nava ava cewherê xiyanetê de hate stewihandin, tevzînok û qolincên mirinê, winda bûnê dest pê kirin. Car din stranên têr hêvî hatin gotin, berxwedanên destanî hatin lidarxistin. Ku mirov dêhnê xwe dide xaka Mezopotamyayê, bûye pêgiha tirat û berxwedanên rizgarîxwazî û azadîxwaziyê.

Mixabin, ev tirat û berxwedan bi xemla hunerî nehatine avdan

Hestên ku sîrûştên xwezahî ji xwe re kiribûn çavkanî, bi baweriya olê ketin nava tevgereke civakî, li ser bingeha demjiyana antîk ku bi têkildariya keşkûlî be jî, xwe gihande sedsala bîstan. Lewra Darwîn hestên estetîkê bi ramanê qurmê biyolojîk ve girêdide. Asoyên huner ji hêla kesî ve bi tixûb nebûne. Taqê şikeftên di nava wêneyên xwarûpêçkî de, ku bi tozik û tevnepîrka sedsalên bi ser hevûdin de bûne şikêr, destekî teslîmî destên din kiriye, hîna bendeyî lêkolîn û şîrove kirinê ne. Wêjeya Kurdî li ber wê kevnariyê hatiye ava kirin. Rengîniya dilê mirovan, cewherê xewn û xeyalên pergala dînîtiya dijberiyê, di gola oldariyê de winda bûn. Çend mirovên mîna Ezîzkê Xirbihî, Sofîkê Kewa û Qewalên Êzîdiyan bûne xatirê micalan. Dengê wan, di nava xweliya tifikên odên bi dohnê genekê dihatin ronî kirin, qersifî ma, têk çû. Zîvkerên dora Midyadê, mîna dezgehên cumik û pûna di debaxxanê de çermê xezalan, ketin pêvejoya bazirganiyê. Her tişt kete nava bêdengiyê. Stran, neqş, tevnên bi bêhna evînê dihatin hûnandin, hatin veşartin. Lewra huner, li xaka Mezopotamyayê çarmixkirî (salibandî) ma.

Ji xwe, kêmasiya Bahram, ku ji malbateke bê kêmasî dused salî hemberî zordestî û dagirkeriya dijminê har û dirrinde berxwedan kiriye, ne xilmet kirina nîgariya asûmanê bi stêrikên di nava awazên kelogirî de bêhnefişk li

hatten des Dorfes". 140x120 cm. Öl/Acryl auf Leinwand, 1990/91.

wan dikeve ye. Bahram, yek ji wan mirovên ku xemla boyaxê di kefa mista xwe de haveyn dike û li ser tuwal û cawên spî, estetîze dike ye. Di nava derya rengan de, bi hesreteke dilşikestî, mîna her pirsa jiyan û ramanên civakî, li çareseriyê digere. Encam wê bibe çi, bersiv wê bibe çi, hîna kifş nebe jî, huner serîhildanê dike. Bahram gerok û lêkolînvanê ku di nava boyaxan de riya xwe bijartiye. Dilekî reş, hesreteke mezin, kevnariyeke kûr û dûr navê hunerê Bahram e, ku li ser Kevirê Qatoro hatine neqişandin, li ser merş, tayij, berr û xalîçên hêstirên dayikên stûxwar jîndar dibin; hemberî buxz û zordestiya Xwedayên şer, bi nasnameyeke zanistî berxwedana dîrokî dikin. Xweşikahiya bi objeyên jiyanê hatine xemilandin, dema di cewher û firşikê ramanê Bahram de gihane hev, nîgariyeke delal ku dikare bêje: jiyan xweş e, derdikeve meydanê.

Bahram

Bestikên dilê Bahram motîf û fîgurên reş diherikînin. Lê hest û ramanê Bahram, zû, ne dereng wan bestikên têr pêl ku ber bi okaynûsa jiyanê dixumihin, zû, ne dereng bi hêvî û baweriyeke hunerî spî dike. Bêguman ne tenê spî ye, rengên evînê, xemla dîlanê xwe li hev dipêçin. Cara yekem ku li atolya Bahram bûme mêvan, min pirdengiya hunerê wî, di nava diljenîyeke tevlîhev de anîbû zimên. Hinekî reş, darbeyên firçê xemgîn bûn. Bahram di nava beşûşiyeke şermokî de, wiha bersiva min dabû: *Çirîskên hêvî û baweriyê di nava diljeniya min de diçirisînin.* Bêguman, bandora reş ku li ser hunerê Bahram heye û bi giranî di tabloyên wî de xuya dikin ne reşbînî ye. Erê, mirov dikare bêje xizanî ye; lêbelê divê mirov mafdariya cewherê hunermend û stîla taybet nas bike.

Zimanê Bahram di motîfên wî de ye. Dîtina Bahram di fîgurên wî de ye. Bawerî di tevger û hûnandina rengên boyaxê ku li ser cawê spî tê rûnandin, bi xemleke delalî, kompozisyoneke hosteyî tê rûnandin. Bahram di gelek tabloyên xwe de, di nava xemgînî û xizaniya welatê xwe de, di nava êşkence û perçiqandina mezin de dinale. Ji xwe, diljeniya wî ku di nava xemla reş de derdikeve hemberî mirov ev e. Reş, li dora pira ku bi berên topa dijmin hatine hêrivandin, yan jî, di nava kevnariya demsalên bêxwedî de, di nava belengaziyeke bêçareyî de bi ser hev de dikeve, çiqasî bi rengên soreve, bi tîrêjên ronahiyê bêne parastin jî, xêr nake. Bahram diljeniya xwe nikare veşêre.

Hestên bi derbehişkan birîndar bûne di nava pêçaneke mumya şimadanî de, cih ciha parçe bûyî, cih ciha ji hev de ketî, hinekî klasîk, yan jî li ser klasîkê rûnandina modern derdikeve hemberî mirov.

Li ser vê dîtinê, min di atolyê de du tabloyên **Paul Cêzana**, *(La grande Baignade (1898-1905)* û (De Krokelende meg-la route tournante 1879-82) anîne bîra wî. Fîgûrên mirovanî, yên rûmet û xisletê jiyaneke ku mirov dikaribe pesnên xwe pê bide, yanî hinekî raperîn tê de xuya dikin. Bêyî ku mirov jê bireve, bi darbeyên faş û beloq yên cilk î pekandinê. Ew taybetiya ku psîkolojiya di hindurê mirov de dipingihe, tirş dibe, na verîşe ser caw.., Paqijiyeke ramangîrî ku mirov ber bi xeyalan, ber bi serpêhatî û bîranînên seyr dibe. Çiqasî bandora empressyonîzmê tê de hebe jî: Bersiva Bahram wiha bû: "*Bêguman bandora empressyonîzmê li ser min heye. Nexasim kesên mîna min ku ji xaka têr xemgînî û xizaniyê hatibe. Ew berzî û xemla têr delalî ku dibin nalê hespên dagirkerên hov de parçe parçe dibe, di dilê me de, dibe xalî cewhera ku li ser caw derbikeve meydanê. Hinek delalî û berziya xaka me, hinek xizanî û xemgîniya rewşa dawî tevlîhev.*"

Gelo Renoir, ku di zimanê huner de jê re dibêjin **menselijke figuur**. Bi tabloya *(Naakt in het Zolich 1875-76)*

Weke **Paul Cêzana**. Têmtêleke têr mirovanî, jiyaneke rêkûpêk, her çiqasî li bejna *(Dayika ber Dergûşê)* ku niha li ser dîwarê oda min daleqandiye neyê jî, dilpenahî û dilcoşiya mirov diqîrin. Ev dilcoşî di pêgiha raperîn û gengeşiya jiyanê de xwe nîşan dide? Car din nîrê zêrîn empressyonîzm derdikeve hemberî me.

Bersiva Bahram kurt bû: Bi enpressyonîzmê re antagonîzm

Yanî **Manet**. Dîtin û bûyerên cîhanê. Bi awireke din, ji cil û kincên xwe, berewajî sikak, kolan, yanî jiyaneke bohem; mikewniya bi destên mirovan hatiye lidarxistin, nêrîna li jiyanê. Weke ku **Manet** di tabloya *(Olympia 1863)* de bi firçeyên net, darbehişkî di nava rengenîgariya Bahram de xuya nekin jî, **kompozisyon û lêkirin**, xwe bi wê temtêlê şanî me didin. Belkî, neqş û xemla li ser kevirên Qatoro û diljeniya ronahiya çavên evîndar ku bi awireke şikestî di nava hûnandina rîs û tayên tevna merş û xalîçan de rûdinin, di nava xewn û xeyalên ne diyar de, ku bêyî Bahram di nava tevlîheviya boyaxê de xwe kifş dikin in. Bahram xwe ji mamosteyên berî xwe, naparêze,

„Trophäen des Sieges“, 120 x 140 cm, 1991

„Schweig“, 120 x 140 cm, Öl/Acryl auf Leinwand, 1991

hemberî berzî, mezinahî û hostahiyê nakeve nava parastinê, lê ji berpirsiyariyê hinekî direve. Ne ji civakê, ji rastiya xwe direve. Belkî nikare bireve. Belkî bêyî wî derdikevine hemberî wî. Ew dînîtiya huner ku hest û ramanê hunermend ku derdikevin hemberî wî, ji sikak û kolanên Tirbespiyê, ku di kûç û anîşkên tenûr li wan dihate dadan, ji ber destar û şevên hinê û dîlanên keçikên bi yarî û keşkûliya evîneke winda dilorandin, hîna di bîra Bahram de ne. Bêguman ecola hosteyên klasîk, di dibistanan de fêr bûye. Temtêla karê wan, çîleya ku di ber huner û hêrsa xwe ya gihiştina qonaxa rûmetî de fêr bûye. Lê, em teva dizanin ku rijiya di destên Bahram de ku li ser ferşik û taqên bi kilsê hatine seyandin, bi xîşkên tevlîhev wêne çêdikirin, nedane jibîrkirin. Govendên ku li ber kemançê, li ber dahol û zirnê (ev her du alav, bêyî gengeşî û guftûgoyên polîtîk yekîtiya kurdan in) bi rîtmeke nota-

yî dilerizî. Kinc û cilên rengîn, reşka çavên di nava hev de li evîna dil digeriyan, xwehdana kefa mistan û keşkûliya ku di nava remedîlka bestik û çemên jiyanê de serûbinî hev dibûn nedane jibîrkirin. Ev xislet in ku Bahram mîna **Robert Rausenberg** dibînin. Weke her wênekêşî, Bahram jî girêdayî antagonîsmê dimîne.

Bahram çiqasî bê taswîr û fantazî be jî, ez ne weke rexnegîrên din diramim. Fantaziya di nava hunerê Bahram de, bi qasî ku ew dibêjin, nîne, ez dibêjim ku bêhtirîn heye. Ku exstremîst be jî heye. Bahram qaqilkê xwe şikandiye, ji nava rekiha xwe derketiye û di nava azadiyeke hunerî de difûre. Dilekî germ û fûrek rîtma firça Bahram îdare dike. Lê, bi koka xwe ve girêdayî, di nava helwesteke modern de diçe û te.

Lewra refleksên **Van Gogh**, hostayê zerahiyê bi Bahram re dernakevin meydanê. Lê, mirov dikare lêkirina xerca **Munch Jaloezie** di hunerê Bahram de bibîne. Erê Bahram bala xwe nade **kûbîk**, yan jî hunerê **geometrîk**. Yan jî stîlên **protogeometrîk**, Dîsa mirov xemla **poemî** di karê Bahram de dibîne. Çiqasî di darbeyên **Van Gogh** de, **Munch Jaloezie** bête dîtin jî, mîna **Ernst Ludwîg Kirchner,** bi zor û bêçariyekê boyaxa xwe li ser tuwalên spî xemle nake. Teknîka zorê li cem Bahram nîne. Karakterîstîka firça Bahram ne tûj e, ne dijwar e ku çavên mirov ji ser xwe bide aliyekî. Ne beloq û ne dijwar in. Nerm in. Ew reşahiya ji xemgîniya dilê Bahram dirije carinan çavên mirov diêşîne, dilê mirov dixumîne, lê ne ji bo çavên lêkolînger û ne ji bo dilên evîndar. Çavên ku nexwazin tiştekî bibînin, nexwazin dûr û kûr binêrin, ciz dibin direvin. Di nava rîtma çêbûn û lihevketina boyaxê de nermiyeke hêsanî, ku heya bi kûçikê gundên wêrankirî, bi tenê li qeraxê xaniyekî hêrivtî, di nava xemgîniyeke tenêbûnê de xûya dike. Evîndarên bax û bostanên îrem, bi kubariyeke dilovanî, bi firçeyeke ziravik xwe li hev dipêçin. Xemla kulîlkên biharê, cih ciha winda ne, cih ciha şikestî, perçiqî, bi kevirên hêrivtî re li gastînan in, ji têhnik û ronahiya rojê dûr in; cih ciha geş in, bi tîrêjên rojê re dîlanê digirin. Dîwarên xanî, hewşên hêrivtî û sêncên di nava sotîkirina agirê bi barûdê têne kewitandin, di nava sift-bêhna kizîrê de ji wêneyên Bahram tên. Ew darbeyên firça Bahram ku ji nava xemgîniyê dipekin derve û li hev têne badan, gera Bahram, hawara Bahram, raperîna dilê Bahram in.

Perspektîf ew e ku statuka dilopên boyaxê bi rewşeke artîstîk/estetîk bêla dibin, cî digirin. Dûr û nêzîk, dîtin û mêjî, dil û ziman, mîna mîzêna xêr û

gunehan e li ber çavan. Ton ne girtî ne, ne tim vekirî ne, dil Bahram yê xoratnî, evîndar û dilê Bahram yê kevnare, ku di nava rûpelên dîrokê de geh koçberî jiya ye, geh mirin û xwîn jiya ye, geh rev û tirs û êşkence jiya ye, li ser tuwalan pîkolê dike. Li gorî fîgur û kompozisyona di serê wî de spesiyala ku daniye ber çavên xwe, tevgera xewn û xeyalan, bi şemala modern datîne ber çavan. Ne **symbolîzma Pîcasso**, ne **kompozîtoriya Cêzanne**, di nava tevgera ronahî û avakirina xemla boyaxa Bahram de xuya dikin. Karakterîstîka Bahram effekt/bandor, ji dîroka Mezopotamyayê tê. Xaleke din ku pir balkêş e: di danûstandina firça Bahram de **lîrîzm** heye. Ne tûj û ne dijwar. Nerm û xwezahî. Folklora rengîn, hîna li ser Bahram bandora xwe didomîne. Ne fotografik û di nava alegorî de pêçayî. Modern û cih ciha winda. Di van berhemên wî de rengên **Renoîre** xuya dikin. Û beramber fîgurên gera li mirovaniya di nava berjewendiyan de pelixî. Bahram erotîzmê dide. Mîna **Manet**, lê ne bi degeliya **Manet**. Degeliya **Manet** bi Bahram re xuya nake. Bazara wêne di nava civaka kurdan de nîne, car din Bahram ne bi degelî û di nava valahiyeke birçî de diçe ser erotîzmê. **Danteîzm** e. Navê erotîzma Bahram ev e. Ne xeydok, qutebir e. Ew bi destên xwe dimeşîne, serbest bernade, rê li ber firça xwe, rê li ber ramanê xwe digire. Serê memika keçika şermok, di nava reşahiya bi ser wêraniya gundên Kurdistanê de dipûnije ronahiyê nade derdoran. Û mirin, reşbîniya mirovaniyê ye. **Dînamîzma** dijî mirinê xweş xuya dike.

Dînamîzm navê raperîna hemberî mirinê ye

Bahram kesî ji ser banê xanî, serneqot, tazî ber bi kûra zerzemîn nadehlîne. Yanî mîna **William Blake**, *(De aan simonie schuldige paus ca.1825-27)*, çiqasî rekiha xwe şikandibe jî, xwe naşemirîne. Û mîna **Annîbale Carracil**, *(De Keuze van Hercules, 1595-97)*. Bi ser karê allegorîk de naçe. Peryodên modern di nava modernî û hestên Bahram yên civaka paşketî de hîna pevçûnê dikin. Lewra tabloyên wî, tivêl û temtêla rûdêna Bahram nîşanî me dikin. Bi dekoreke pratîk û xemilandî.

Êdî em nikarin nebêjin ku di nava xemla Bahram de, rastî nehatiye hûnandin, herwiha tê dîtin ku tixûbê gelek tiştan hatiye parçe kirin, ku dilê mirov têr dike. Her tişt dijî, her tişt di nava wêneyên Bahram de dijî. Diljenî, dilcoşî, ba û ta, wêranî û awahiya bi mirovan delal û xweş. Tiştekî din

ku bala min kişandiye, **sembolîzma** ku mirov ber bi îzolekirineke hişk de dibe, di wênekêşiya Bahram de xuya nake. **Sembolîzma** Fransî ku li ser textê dilê gelek wênekêşan tacîdariya xwe îlan kiriye, di hinek deman de, pirranî, berî ku azadiya xwe bike destên xwe û firça xwe bihejîne û bêje ez jî heme xuya dikir. Lêbelê piştre karê Bahram bû bi rastiyê re. Ew rastiya ku her dem sînor û tixûbên xwe parçe dike û berê xwe dide rastiyeke din, ku her dem bi sîsika xisleta xwe bi hêz dibe û li qonaxên serfiraziyê digere, Bahram pêça ye. Mîna **Davîd**, ku di tabloyên xwe de, realîzm û rastî, di rewşeke pirr balkêş de datîne ber mirov. Nexasim ji bo civaka ku mijara serbestî û azadiyê daniye ber xwe, yan jî ji bo çînên civakê ku armancên serketinê deynin ber xwe û bi armanceke pîroz û wê armancê de bişopînin. Bê guman her tevger hunermendên xwe derdixe. Têkoşîneke dûr û dirêj ku barekî gelekî giran daniye ser milên gelê kurd, bixwaze nexwaze wê hunermendên xwe derbixe. Têkoşîn û raperîn serîlêdana jiyanê ye, gera ber bi jiyanê ye. Ne jiyaneke bê wate. Jiyaneke ji kîsê xwe, ya xwe, ku çarenûsiya mirov di destên mirov bi xwe de be. Tiştê ku di hunerê wênekêşan de di dilê mirovan de rûdine jî ev e. Nosyonên jiyana ku mirov dikaribe, weke heye jiyan, weke her kesî jiyan, ji bo kurdan jî, pêwist e ku ne daxwazeke zêde be û ne gunehkariyeke mezin be. Ev gel jî, di nava hesreta azadiyê de ye. Di nava hesreta hunerê xwe de ye. Bahram jî di nava wê hesreta azadiyê de, dilê xwe yê bi xwîn, ji bo hunerekî azad û xwedî nasname li ser tuwalan nexşe dike.

Ev teva ji bo pêşerojên Bahram alternatîfên serketinê ne. ❑

Piştî çûna te

piştî çûna te
bi ser sergoyên bajêr ketibûm
dimeşiyam
ewran
hêsir dibarandin

di nav şêniyên xewnan re
kolan û kuçe dibuhurîn
porê te
li serê her kuçê
xwe berdida ser çavên cirdîxezalan
û bi xwe re dibirim wargehên jorîn

mijek çêdibû ji bejn û bala te
henûntiyê xwe berdida ser
û bi dûr diketin

çûkê ser berfê
li ber bayê zemanan
ser bermahiya evînê
min û seqemê
qala germiyanan dikirin ji hev re

piştî çûna te
gelek siwar
ji hespên xwe xeyidîbûn
gelek qop û kulek
li dû kerwanan mabûn
û reva min
bi qasî dirêjbûna gulîkên te bû
ew çend bi dûr diketim
ew çend nêzîk û dîl dihatim

piştî çûna te

CEMÎL DENLÎ

Êş

Ho dil
lêxe, lêxe lo rebeno
tu nawestî ez dizanim

xeyalên te xweş
çavên te bi hêvî
rûyê te bi ken
tu kulîlka tev biharê bûyî
niha fikrên te kûr
wekî ewrên reş
fetisandine çirûskên jiyanê

bi porê te yê spî ketiye
di berbanga sibê de
xewa şîrîn
hîn li ser çavên westiyayî
li bin dilopên baranê dimeşî
wisa reben, wisa stûxwar
çavên te şil
dilê te bi jan
kes te fêhm nake!

difikirim
tu ne meriyê do
ne jî yê îro yî
sêwiyê welatê xerîbiyê yî
tu lo...!

MUNZUR UZUN

Dilşewitiyê kultura kurdî

SILÊMAN ALÎ

Cî li wênekêşê gênc, Keserkêşê Dêreben teng bûye, rê li ber wî hatine girtin û derî hatine dadan. Feqîro nema zane bi ku de here, berê xwe bide kê.

Ev serê du salane Keserkêş hatiye xwe avêtiye bextê Almanyayê û li bende qebûlkirina xwesteka îltîcaya xwe rûniştîye û ha mehkeme derkeve û ha derkeve. Roj û meh derbas dibin, salek buhurî, wextî ya duda jî biqede û hîna jin û herdu zarokên wî, li welêt, dûrî wî mane, nikarin werin. Hatina wan, li ser peran sekinîye.

Li Almanyayê wênekêşê nûhatî li gundekî biçûk ketiye, kar lê peyda nabe û heger ew îş bibîne jî, nikare îzna xebatê bistîne. Almanya ne wek cem me ye, ji bo tu kar bikî divê îzna te hebe û tu qeydkirî be. Kes nikare li wir bi dizî îş bike. Îşê reş bi tirse û ne herkes diwêre xwe tê derxîne û her wekî me berê got, ew jî bi rehetî peyda nabe. Alîkariya, ku gerandina sosyalê mehane dide wî, têra xwarin û cixare û têlêfonên wî nake. Dêrebeno nikare tiştekî jê girêde, da jin û zarokên xwe pê bîne, bighîne Almanyayê. Li gor qanûnê, heqê wî tuneye ji gundê xwe derkeve, çimkî hîna heqê wî yê rûniştinê nîne. Heger wî karî bûya ser kêfa xwe li Almanyayê bigeriya, bêguman wê ji xwe re îşekî reş li bajarekî mezin-derekê bidestxista. Lê di vê rewşa xwe de çara wî ma ji camêrekî-nasekî perena deyn bike pê jin û zarokên xwe bîne û heya destê wî fere bibe, deynê xelkê vegerîne. Lê ka ew camêrê han kî ye û li ku ye?..

Li gora halê xwe yê ne serrast, heya jê dihat Keserkêş diçû civa-

tên kurdî, diçû şev û meş û civînan. Li wan derana wî gelek welatparêz nas dikirin û hinekan ji wan welatparêzan ew dawet dikirin malên xwe:

Were çend rojan li cem me be, em qedrê te bigrin.

Wênekêş dilşikestî bû, bêkêf bû, ne dixwest here cem tu kesî, wî timî bi edeb nabûna xwe dida.

Carekê, li cîyekî ji Almanyayê, şevek derbarî jiyan û hunera rehmetiyê Mihemed Şêxo li dar ket. Kesê ew şev amade kir û tê de xeberdanek ji yên hemiyan dirêjtir, ser huner û jiyana dengbêjê mezin xwend, miroveki gelekî jêhatî û welathiz bû. Wî camêrî kiribû kar ji xwe re, navê dengbêjê nemir hilde ezmanan û gelek pere û wext, di ber vê armanca pîroz de, dida.

Piştî semînarê dilşewitiyê Mihemed Şêxo wênekêşê nûhatî bir mala xwe. Mala wî li wî bajarî bû. Wî mêvanê xwe bi otomobîla xwe ya ku ser xebera wî, berî mehekê bi panzde hezaran kirîye, gîhand ber derî. Xanîyê wî ne xerab bû. Ev nêzîkî deh salan e ew li Awropayêye, xwedê bihêle, komek zarok çêkirine û alîkarîya sosyalê distîne, axatiya xwe pê dike. Mêrik xwedî pereye.

Wê şevê mazûbên guhê mîvên bi peyvê qul kir. Ji sedî nod û neh selef xeberdana wî ser Mihemed Şêxo û mûzîk û stranên wî bû û ya girîngtir, ser perîşanî û şerpezebûna wî bû. Mala dilşewitiyê Mihemed Şêxo tije sûret û kasêtên hunermend bûn. Xwediyê malê bi dilekî şewitî behsa jiyan û halê hozanê rehmetî, nexasim piştî vegera wî ji Îranê, dikir... behsa zordarîya hukmetê ser wî, birçîbûna zarokên wî...Muzîka kurdî xwediyê xwe xwedî nake. Hunermend li welatên mayî bi ser dikevin gava milet berhemên wan qebûl dike, lê hozanê kurd ji vê yekê mehrûm e. Maleke kurd nebû, ku kasêteke Bavê Felek tê de nebû, lê tevî wilo jî, wî û zarokên xwe têr nan ne dixwarin. Hozanê nalîna kurdan mecbûr dibû nalîna xwe bide alîkî û dakeve dawetan Sem Sem Semîralêxe, da dîlan bigere. Hukmetê di pariyê nên de şerê wî dikir û kesekî, di vî şerê bêrehm de, li aliyê wî bisekine tune bû. Nalîna Hozanê me her û her kûr bû, laşê wî yê helyayî hîna bêtir heliya, heya çira wî bi ciwanî vemirî.

Te dît bê çiqasî miletê me bêkêr e?!!- Dilşewtiyê rehmetî bi kerbeke mezin pirsî.

Bi vê pirsê mazûbên mêvanê xwe ji dûr vegerand. Dêreben ketibû fikr û xeyalan û lema bêhemdî got:

– Hee?

– Hozanekî wek wî, yê mazûban peyva xwe temam kir. Piştî ewqas kar û xebat di ber kurdan de, têr nan nedixwar. Îjar nuha, piştî mirina wî, giş dibêjin, wax û heyf.

– Erê, erê! Wênekêş serê xwe bi melûlî û qayilbûn hejand.

Bi van xeberan, bê ku zanibe, mazûbên hêviyek di dilê wênekêşê nûhatî de, çêdikir: Dilê wî yê şikestî hinekî hênik bû û çavên wî hebekî melûliya xwe şuştin. Wê gavê fikreke tenê di serê wî de bû: dawiya dawî ez li camêrekî rast hatim, lê wî ceger ne dikir zûka daxwaza xwe bîne ser zimên. Gava gotinên mazûbên xeles bûn, şev jî êdî dereng bûbû, lê ji ber ku hîna dilê wî û xewê nebû, wî peyv qulapt ser jiyan û halê mîvanê xwe:

– Xwanêye tu bi jin î? Mazûbanê dilmezin pirsî û çavên wî çûn ser tiliya wênekêş ya bi gustîlk.

– Erê, Mîvên jî li tiliya xwe nerî.

De ka carekê kebanî û zarokên xwe bîne, werin heftiyekê li cem me bin, sebra me jî bi we were. Pîreka min gelekî ji mêvanan hez dike.

– Heger pîreka min gîha Almanyayê, bi soz emê carekê werin.

Wênekêşê me ev peyv got û li çavê mazûbanê xwe nerî.

– Ma qey zarokên te hîna li welêt in? -diyar e xeberdan û nerîna Dêrebeno hinekî tirs bi xwediyê malê re çêkirin.-... Ev çiqasî te ye tu li virî?

– Wextî bibe du sal, Keserkêşo bi bersiva xwe re keserek kişand.

– Du sal?! Her ku çû pirsên mazûbên bêtir bitirs dibûn. Çi... çima heya nuha nehatine?

– Qeweta min nagihê, pere ji hatina wan re lazimin, Keserkêşî xebera xwe avêt û pirs eşkere kir tevî ku tirsa mazûbanê wî hêvîya wî êdî kêm kiribû. Bi vê xebera eşkere re tûyê mazûbên bi carekê qulipî û wî di cî de xwe ji rabûnê re tev kir. Dilê wî û berdewamkirina xeberdanê nema:

– Wax, wax, Xwedê çêke... ê de min serê te gêj kir, şev dereng bûye, bêguman xewa te jî tê, û çû oda xwe ya razanê.

Sibeha roja dinê nema mazûbên behsa Mihemed Şêxo kir û ne jî behsa mesrefa, ku li ser civandina kasêt û sûretên wî dike, kir. Wê sibehê rûyê wî ne xweş bû, wek nexweşê kêmxew bû. Ser taştê ew ket pirs û meselene din. Wî Bavê Felek ji bîr kir û derd û kulên xwe ji Keserkêşê Dêreben re rêzkirin, behsa deyndarî û xizaniya xwe kir. Wênekêş baş ket sûret de bê çiqwas deyn ji wî feqîrî tên xwestin, ji xeynî merivên wî yên li welêt, ku herroj li têlê dixînin, peran dixwazin: Kuro! fêm nakin, di fikra wan de fabrîkên me yên markan li vir hene!Yê wênekêş li ser wê taştiyê nas kir, ku birayê vî welatparêzî jinek revandiye û pere ji bo çêkirina dawê lazimin û nas kir, ku diya wî li ber mirinê ye û rebeno di ber perê textor û dermanan re nagihê. Gunehê Dêreben gelekî bi mazûbanê wî hat gava nas kir, ku feqîro nema

zane çi bike. Wê sibehê wênekêşê bêpere karî bû bi tiştekî tenê alîkarîya xwedîyê malê bike û wî texsîr ne kir. Wî zûka-zûka xatir xwest, berî ew welatparêz di bin barê tunebûnê de bi ser wî de bigrî, û got: nigno qurban.

* * *

Çend meh di wê navê re derbas bûn, Keserkêşî miroveki gelekî welatparêz li cîyekî nas kir. Wî welatparêzî çer, ku nas kir bê çi wênekêşekî jîr û jêhatî li ber wî ye, di cî de reca kir:

– Tu bi Xwedê kî, tu nikarî ji min re portrêtekî mezin ji rehmetiyê Osman Sebrî re çêkî? Ezê bi mala xwe ve kim, Apo hêja ye.

– Nuha Apê Osman bi we şêrîn bû? Wexta sax bû xelkê berê xwe jê diguherîn, yê wênekêş bi acizî peyva xwe got.

– Erê bi Xwedê, te dît? -Wî merivî pişta Keserkêşo girt.- Heya mezinên mena nemrin em qîmeta wan nizanin. Li ber me ne, di nav me de ne û bêxwedî, birçî û tazî dimrin... Piştî mirina wan em nuh dibêjin ax û of û tepan li serên xwe dixînin... Ma em dikin nuh miletê xwe yê bêkêr nas bikin, bira?!

Dilşewityê Osman Sebrî bi serhejandineke lomedar ev pirs kir û hebekî bêdeng ma, lê gava dît, ku tukes ne bi nête gotinê ji ber wî bigre yan bersivekê bide, wî peyva xwe berdewam kir û bi dirêjayî behsa girtin û xizanî û tengasiya Osman Sebrî kir. Çawa li kuçan diçû-dihat, bêkar, bêxwedî û bêpere bû. Xelkê silav li wî ne dikirin û ne dihiştin rehmetî li ber deriyên dikanên wan deh deqan rûne. Navê Apo li cem dost û li cem dijminan jî mezin bû. Her kesî ew nas dikir û lema xelk ditirsiyan hukmet wan bi tometa hevaltiya wî, bigre. Wî welatparêzî bi paye eşkere kir, ku berî mirina xwe bi du-sê salan, Apo bi xwe ji wî bi xwe re gotibû, ku heya zariyên wî li Swêdê bi cî nebûn û pere jê re neşandin, wî têr nan ne dixwar...

– Ma miletê me jî milet e? dilşewityê Osman Sebrî bi vê pirsê xeberdana xwe anî serî.

Wênekêşî serê xwe rakir, bi rûkî tal li wî kesî nerî. Diyar bû, dilşewityê nivîskar û helbestvan û siyasetvanê mezin, bi wê xeberdana

xwe, kîn di dilê wênekêşê me de çêdikir. Lê Dêrebeno tiştek negot û mêrik peyva xwe dîsa bir serî:

Çima wexta Osman Sebrî sax bû, ew ne didan ser serê xwe? Gereke çavên me li siyasî, hunermend û nivîskarên me bin, da ew tu carî motac nebin. Ez nuha kitêb, nivîsar û sûretên Apê Osman ji vir û ji wir vedihewînim, lê çi fêdeye, rehmetî ji nav me çû. Ez çiqasî jî li ser xerc bikim vala ye. Ew rojên xizanî û bênanî û bêcixaretiya Apo ji ber çavên min naçin.

Ne peyvên wî kesî û ne serhejandina wî ya pirmane ne ketin serê Dêreben. Wî êrîş kir:

– Ka ji bo çi tu vê xizmetê ji navê Osman Sebrî re dikî? Osman ne bi hacetî te ye. Navê wî berê bi kar û xebata wî bilind e, îjar ev xebata te ji bo çiye?

– Çimaaa? Yê welatparêz hem ji vê xeberê û hem ji awirên wênekêşî yên bi kîn ecêb ma. Qey mirov erkê xwe yê kurdayetiyê bike şerm e?

– Kurdayetiya çi? wênekêşê dilşikestî û kêmbawer ji kela dil got. Kurdayetî maye hew peyvên qelew û zêde...

Di vir de gotin ji dilşewityê Apo re xweş bû, wî dengê xwe hilda:

– Heyf, heyf û sedcarî heyf! Hunermendekî wek te çavên me gişkan lê ye, tiştekî ji me re bike, van ştexaliyan dibêje, heyf! Heqê te nîne bira, na.

Û dîsa bi cûrekî hostatî, serê xwe hejand.

– Na lo, mamoste piçekî aciz bû ye, yekî hazir xwe tevî xeberdanê kir. Ev du sal in ew dûrî jin û zarokên xwe ye, perê wî nînin wan bîne cem xwe, lema hebekî bêhêvî bû ye.

– Ma te kengî alîkarî ji me xwestiye û me gotiye na?

Dilşewityê Apo êrîşa xwe nesekinand.

– Na, heqê te nîne... va ye çend camêr li vir in? Te alîkarî ji me kê xwestiye?

– Hema ez nuha ji te dixwazim, heger wilo ye.

Dêreben xwest derewa wî zimandirêjî derxîne.

– Ser serê min, ser çavê min, rûyê wî welatparêzî tew ne qulipî jî û ew bû behana ku hebek bawerî bi peyva xwe li cem Keserkêşî çêkir.

– Xwedê bêje erê, ez nahêlim tu di vî halî de bimînî. Numra têla min binivîsîne û li têlê xîne.

Jê pê ve wênekêşê me nema ew zilam dît. Ji bo derew eşkere bibe, Keserkêş bi hazirbûna xelkê çend caran li têla wî xist. Hertim dengê jinê yan yê qîzê dihat:

– Halo... Ser çava... kî ye?... Na bi xwedê, ne li male... he?... Ez nizanim wê kengî bê... çwîz.(*)

* * *

Ev çîrok zûde bû. Paşê çi hat serê wî wênekêşî û çi pê re qewimî, ez baş nizanim. Demek dirêj xeber jê nebûn, lê ne zû de, xebera mirina wî hat. Ew jî bi ciwanî mir. Hat gotin, ku wî gelekî di jiyana xwe de kul û derd kişandin û ji ber nazikî û diltenikiya xwe, diqeherî û bêhesab cixare vedixwarin û hêwirî bû alkoholê. Rengê bêtir bikarhatî di sûretên wî de, rengê reş û rengên dinî tarî bûn. Wî boyaxa ronî bikar ne dianî. Tu kesî ji kurdan guh ne da wî û sûret û nîgarên wî, lê li nav Ewropayê hêdî-hêdî navê wî derdiket û qedrê wî çê dibû.

Belê dibêjin jî, ku piştî mirina Keserkêşê Dêreben, çend kurd li Ewropayê peyda bûne, dixwazin navê wî vejînin. Ew kes sûret û nîgarên wî didin hev, kopiyan ji ber digrin, dixwazin albomek xebatên wî û kitêbekê li ser jiyan û hunera wî ya bilind çap bikin. Dilşewityên rehmetî gelekî li ber wê qama bilind di hunera kurdî de dikevin, lome û gazinan ji pêşiyan dikin û dibêjin:

– Çawa hunermendekî wilo hêja di nav me de bû û me qedrê wî ne digirt, me piştgiriya wî ne dikir. Dewleta me nîne, hunermend û zanayên me xwedî bike. Heger em jî pî nedin ber wan, ma dibe? Hey heyf û sedcarî heyf, çû... ❑

1998

(*) Bi xatirê we (almanî)

Êşa kevin

Adar bû
abûra kewan bû
hey wax
ez di deriyê te de hatim girtin!
Talan bûn pê ra
gund û bajarên min,
ez bûm şagirdê derdan;
lê ew bedena nemerd
fîzek ji xwe re kir bazbend
û nekişa kozika siwarê canî-çalê
                    û mêrxasê şevê...

Halbikî hevrîşim hatibû ber livayê!

Adar bû
xemla mêrgan bû
hey wax
hêja stûr e rehê qolinca min!

REMEZAN ALAN

Nivîskarê swêdî yê ku zimanê kurdî afirand

MÛRAD CIWAN

Çendekî berê di kanalekî televîzyona swêdî de hevpeyivînek bi Mehmed Uzunî re hat kirin. Behsa hevpeyivînê nivîskarî û romannivîsiya wî bû.Televîzyona swêdî gellek caran programên xwe yên kulturî du car-sê car dike. Hevpeyivîna bi Uzunî re jî yek ji wan programan bû ku hat carîkirin. Di weşandina cara pêşîn a programê de min hay jê nebû, ez bi saya hin nas û dostan pê hesiyam. Gava min bihîst, gellek kêfa min hat, ez pê serbilind bûm.

Sebebê kêfxweşiya min jî ew bû ku, em kurd gellek caran bi bindestî, zulmlêbûyî û belengaziya xwe derdikevin pêşberî xwendevan an temaşevanên dinyayê. Gava navê kurdan tê, hema bêje tenê rebenî û perîşanî tê bîra xelkê. Lê millet nikarin tenê bi rebeniya xwe xwe bidin nasîn. Divê meriv bi aliyên xwe yên pozîtîf ên avakir jî xwe derxe meydanê, bi kultur û medeniyeta xwe, bi berhemên xwe yên di nava malbatên millettan de jî xwe bide nasîn. Loma jî derketina nivîskarekî kurd a ser televîzyona swêdî, hem jî bi romannivîsiya xwe, helbet ez kêfxweş kirim. Gava ji ber hin axaftinên Mehmed Uzunî yên di programê de hinan gazin jê kir jî bêyî ku ez programê bibînim min got "xem nake, tu însan ne mukemmel e, divê em însanên xwe bi qencî û kêmasiyên wan qebûl bikin, ji ber hin xetayên wan karên wan ên qenc jibîr nekin."

Piştre, firsend ji min re çêbû, di carîkirina programê de min jî ew temaşe kir. Rast e, program li ser Mehemd Uzunî û romannivîsiya wî bû. Li ser romanên wî, jiyana wî ya sirgûniya li Swêdê û vegera wî ya welêt

a piştî panzde salan bû. Civînên wî yên li welêt, îmzekirina pirtûkên xwe ji bo gencên nûgihayî, yek bi yek di şaşa televîzyonê de diyar dibûn. Çend xwendevanên wî bi dil û can pesnê wî didan ku wî çi xizmet ji bo ziman û edebiyata kurdî kiriye. Şanaziya herî bilind ew bû ku romannivîsê me yê tirk ê kurdnîjad Yaşar Kemal, bi rûmetdaneka gellek bilind pesnê Mehmed Uzunî dida.

Ji ber weşandina programeka wiha meriv çawa kêfxweş nabe! Lê ez rastiyê bêjim, çawa ku ez di destpêkê de bi heyecan û hêviyeka mezin li ber televîzyonê rûniştim, di dawiyê de jî ez deh qat dilşikestî, liberxweketî û heta ne hindik bi hêrs ji berê rabûm. Program çend pesn û rûmetdan bû ji bo Mehmed Uzunî, ew qas jî înkarkirin, bêbextî û heqaret bû ji bo ziman, kultur û edebiyata kurdî û xizmetkarên bi rûmet ên avakirin û geşkirina vê kultur û edebiyatê.

Bêbextiyê bi pêşkêşkera programê destpêkir ku wê Mehmed Uzun wekî danerê nesra kurdî da nasandin. Gava min ev bihîst berê ez şaş mam, lê min got qey bêhemd, bi şeqitîn ev yek ji bal swêdiyeka nasnekira ziman û kultura kurdî hatiye zimên, loma jî xem nake. Pişt re wê got ku gava Mehmed Uzun dest bi nivîskariyê kir edebiyata modern a kurdî tunebû. Bi berbipêşçûna programê, min dît ku ev tesbît ne bêhemdî hatiye kirin, armanca esasî ya programê ew e, bide nîşandan ku berî Mehmed Uzunî tiştekî nivîsandî yê kurdî tunebûye û wî bi xwe zimanê nivîskî yê vî milletî afirandiye. Mehmed Uzunî, li kamerayên televîzyonê dinihêrt û digot "gava min dest bi nivîskariyê kir ne ferhengokek ne jî tik û tenha teksteka kurdî hebû. Min zimanek afirand".

Pişt re dor hat ser Yaşar Kemalê bi nav û deng, qasî Uzunî nebe jî wî jî edebiyata kurdî reş dikir. Digot ne li Kurdistana Tirkiyê, ne li perçeyên din ne jî li Yekîtiya Sovyetan berî Mehmed Uzunî romana kurdî tunebû, heke hebûya jî hin muswede bûn, roman nedihatin hesibandin. Romana modern cara pêşîn bi Mehmed Uzunî dest pê kir.

Piştî van tesbîtan, ez gellekî fikirîm ku gelo divê ez çi bikim. Gelo diviya ez hêrs û xemgîniya xwe daqurtînim û bêjim de xem nake? Lê gellekî xem dikir. Hin merivên "mestî mezin" derketibûn ber kamerayê, bêyî ku çavên xwe biniqînin li bîbika çavên min dinihêrtin û em Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Hacîqadirê Koyî û Pîremerd deynin alîyekî, Celadet Bedirxan, Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Kamûran Bedirxan û Cîgerxwîn jî înkar dikirin.

Erebê Şemo, Aliyê Abdurrahman û Îbrahîm Ahmed înkar dikirin. Kemal Badillî, Mûsa Anter, Edîp Karahan û Mehmed Emîn Bozarslan înkar dikirin. Kemal Burkay, Malmîsanij, Nacî Kutlay, Bavê Nazê, Rojen Barnas, Hesenê Metê, Mehmûd Lewendî, Zinarê Xamo, Mahmûd Baksî, Ahmed Huseynî, Firat Cewerî, Rohat û Reşo Zîlan înkar dikirin. Evan hemuyan berî Mehmed Uzunî dest pê kiribûn bi kurdî nivîsîbûn. Bi sedan çîroknivîs, helbestvan, rojnamevan, lêkoler, zimannas û xwedî û berpirsiyarên rojname û kovarên kurdan red dikirin, bi qelemekê ew ji dîrokê dimaliştin. Kurdistan, Hawar, Roja Nû, Gelawêj, Ronahî, Tîrêj, Armanc û bi sedan kovar û rojnameyên kurdan înkar dikirin. Tarîxa hebûna zimanê kurdî ji Mehmed Uzunî dest pê dikirin. Li gor wan, berî Mehmed Uzunî hew çend dengbêjên wî yên zarbêj hebûn û hew.

Mehmed Uzunî tevî ku heta niha kitêbek jî bi swêdî nenivîsiye, digot "ez xwe nivîskarekî swêdî hesab dikim". Çawa dibû, yekî ku qet kitêbek jî bi swêdî nenivîsîbû xwe swêdî hîs dikir? Em mesela zanistî û eqlê selîmiyê bidin aliyekî, em bêjin ev hîs e, yek xwe çawa hîs bike, wê bike. Meriv nikare bibêje ku "tu çima xwe wiha hîs dikî?" Lê ku wî digot "gava min dest bi nivîskariyê kir ne ferhengokek, ne jî tik û tenha tekstekа kurdî hebû. Min zimanek afirand" lazim e em li wê derê rawestin û bipirsin ku "Mehmed Uzun ma nayê bîra te, gava te cara pêşîn tûrê nivîskariyê da ser milê xwe û tu bi rê ketî, di wî tûrî de hin meywe hebûn ku ji baxçeyê Hawarê, ji "darên biber" ên Celadet Bedirxanî hatibûn jêkirin? Ma ne xureka te ya herî pêşîn ji wî baxê dewlemend ê rengareng hatibû berhevkirin. Te çi zû ji bîr kir?"

Di programê de gellek mixabin ku şêla Yaşar Kemalî ji ya Mehmed Uzunî ne kêmtir bû. Tevî ku di wê programê de Mehmed Uzunî bi xwe digot ku "her çendîn Yaşar Kemal kurdnîjad e û bi kurdî diaxive jî ew xwendin û nivîsandina bi kurdî nizane" jî, tevî ku eşkere jî bû ku Yaşar Kemalî ne romanên Mehmed Uzunî, ne jî yên kurdên din xwendine, wî ew heq di xwe de didît ku bibêje, berî Mehmed Uzunî romana kurdî tunebû, yên ku hebûn jî mussewede bûn. Li gora Yaşar Kemêl, berê, kurdî zimanekî wiha bû ku derbasî nivîsandinê nebûbû, Mehmed Uzunî zimanekî nuh afirand. Ez qet nikarim fêhm û qebûl bikim ku nivîskarekî wekî wî, tevî ku nikare romanên kurdî bixwîne, hay ji edebiyata kurdî ya nivîskî nîne, di heqê

wan de fikrên xwe dibêje û her tiştî bi carekê de înkar dike.

Qasî ku min taqîb kiriye ji romana pêşîn û bi vir de, pêşveçûnek di nivîskariya Mehmed Uzunî de çêbûye û ew xizmetekê dide zimanê kurdî, lê hemû xwendevanên kurdîxwîn wê heq bidin min ku heke romanên li derveyî yên Mehmed Uzunî muswede bin, yên wî jî muswede ne. Çimkî ew bi naverok û teknîka xwe ji wan ne pêşdetir in.

Heta niha em dibûn şahidê wê yekê ku hin siyasiyên kurdan radibûn, tarîxa têkoşîna kurdan ji xwe dest pê dikirin, liberxwedan, fedakarî û xebatên berî xwe înkar dikirin, lê bi vê şêla Mehmed Uzunî êdî xuya ye ku mixabin em ê bibin şahidê înkarkirina ronakbîran jî. Ecêb e, ronakbîrek çawa dikare kultura milletê xwe û ronakbîrên wî înkar bike? Wekî ku meriv rabe wê firaqa (amana) jê xwariye pîs bike.

Mehmed Uzun gava dibêje ez nivîskarekî swêdî me, ew bi xwe îtîraf dike ku ne ronakbîrekî kurd e. Lê bi qenaeta min gava ew radibe hebûna kultur û edebiyata milletekî înkar dike, ew nîşan dide ku ji ronakbîriyê jî dûr e. ❑

Generalê bênefer ku xwe tiştekî dihesibîne

MEHMED UZUN

1 Ez ji xirecir û polemîkan hez nakim û bersîva wan nadim. Li ser min û berhemên min gelek tişt, bi gelek zimanan, tên nivisîn. Di nav wan de carina hin tiştên nerast û neheq jî hene, lê tevî vê ez bersîv nadim. Mîna prensîp ez li dijî kurdan jî nanivîsim. Heta îro min ne li dijî şexis, rojnamevan, nivîskar û hunermendên kurdan, ne jî li dijî rêxistin, kom, rojname, kovar û avahiyên kurdan nivîsiye. Eger rexne yan jî pêşniyareke min hebe, ez ji wan re, bi zimanekî erînî, dibêjim. Ez bi karê xwe mijûl im û tiştê ku ez lê hûr dibim, afirîna berhemên min e. Herçî berhemên min in, bi hezaran, deh hezaran însan wan dixwînin. Hin kes wan baş dibînin, hin kes nebaş, hin kes kêm, hin kes jî zêde. Xwendevan bi qîma xwe ye û însan ne mîna hev in.

2- Mirad Ciwan û girûba wî ne niha, ji panzdeh salan û vir ve ye ku li dijî min, bi xurtî, dinivîsin, dipeyivin, dixebitin. Ev jî mesela wan e, ne mesela min. Min ne li nivîsarên

wan nihêriye, ne jî hewce dîtiye ku bersîv bidim. Mîna herkesî ew jî xwedî maf in, -ku gotina xwe bibêjin. Ew ji berhemên min hez dikin, nakin, mesela wan e. Mesela min, afirîna berhemeke hêja ye. Li ser daxwaza gerîndendeyê Nûdemê û jiber hurmeta min a xwendevanên wê, ez ê îcar ku di eynî wextê de cara dawîn e, çend gotinan bibêjim. Û ji bo çêyiya Ciwan, ez ê çend tawsiyan jî lê bikim.

3- Ciwan dinivîse ku wî ji hin hevalên xwe re gotiye, "xem nake... divê em însanên xwe bi qencî û kêmasiyên wan qebûl bikin..." Kî kê qebûl dike?... Gotinên qelaw û qure ku gelek caran ji devê însanên ku desthilat, biserketî û jiber şixul û bethemên xwe yên mezin maxrûr in, derdikeve... Lê niha kesê ku van gotinan dibêje, kî ye? Mirad Ciwan. Ciwan kî ye? Însanekî ku di karê xwe de biserketî? Na. Feylesof? Na. Zimanzan? Na. Rexnegir? Na. Edebiyatnas? Na. Nivîskarê edebiyatê? Na. Pisporê tiştekî? Na... Na, na û na... Eger meriv bixwaze sedî sed sifatek ji bo Ciwan bibîne, hingî meriv dikare, bi îhtimala herî baş, jê re bibêje siyasetvan. Lê siyasetvanekî çawan? Ne hewce ye, ez vê yekê bibêjim.

Tawsiya min li Ciwan; berî ku ew weha gotinên qelew û qure ku em dev ji Ciwan berdin, însanên herî pispor û herî biserketî jî, zû bi zû, bi lêv nakin, bi kar bîne, divê ew li rewşa xwe binihêre û ji xwe bipirse; "gelo ez kî me, ji kû hatim kû?" Ciwan divê ji bîr neke, qîmeta gotinan li gora kirin û berhemên însanan e.

4- Ev polemîka Ciwan nexweşiyekê jî dîsan diyar dike; nexweşiyeke xirab di nav tevgera ronakbîrî ya kurdî de heye, -ku Ciwan û hin kesên mîna wî, mixabin, temsîlkarên wê ne; dewsa ku ew, bi xurtî û têkûzî, xwe bidin karekî, ew her karî dikin. Hinek ji vir, hinek ji wir, li vir jî, li wir jî. Hem her tişt, hem jî hîç tiştekî. Û tiştê herî trajî-komîk, gava kesên weha xwe her tişt dihesibînin, bêyî ku li rewşa xwe binihêrin, bi gotinên herî qelew, dixwazin ders û şîretan bidin hinên din, wan "ceza" bikin. Rast e, herkes li mala xwe, di nav komika xwe ya biçûk de xwe tiştekî dihesibîne. Lê pîvan, ne ev e. Pîvan, ev e; gelo kesê ku xwe tiştekî dihesibîne, bi xebat û berhemên xwe, ji bo welat, an ziman, çand, huner, felsefe, yan jî tevgera ronakbîriya wî welatî, yan jî cîhanê, bi rastî, tiştek e?

Tawsiya min li Ciwan; berî ders, şîret û heqaretan divê ew rûne û bifikire ka navê M. Ciwan ji bo tevgera ronakbîrî yan ji ziman, çand, ede-

biyat û hunera kurdan, Tirkiyê, Swêdê (welatê ku ew lê dijî) û dinyayê çi îfade dike?

5- Eger Ciwan pisporê tiştekî bûya, mesela, xwendevanekî çêtir ê edebiyatê bûya, yan jî bi zimanê swêdî hinekî baştir bizanibûya, heye ku ew bi xirecirên weha vala daneketa. Ciwan li programa TV'ê nihêriye û jê ev tişt fahm kiriye; "wî (Uzun) bi xwe zimanê nivîskî yê vî milletî afirandiye."

Piştî ku min gotinên Ciwan xwendin, min ji TV'ê rîca kir ku ew kopiyeke programê ji min re bişînin. Tevî ku ez bi arzû û daxwaza xirecir û teşqeleyên vala ya kesên mîna Ciwan dizanim, min xwest, ez careke din li programê binihêrim û fahm bikim ka min çi gotiye. Di programên weha de însan dikare şaşiyan bike, tiştên ku baş formule nebûne, bibêje. (Di rewşeke welê de, bi hêsanî, însan dikare ji temaşevanan uzir bixwaze.) Çêla programê roman, romana kurdî li Tirkiyê û romanên min bû. Careke din min li programê nihêrî. Tiştên ku min gotine, ev in;

...att skapa ett romanspråk ur ett förbjudet språk... (bi swêdî)

Û bi kurdî; *...afirandina zimanekî romanê ji zimanekî qedexekirî...*

Mebest bi zimanê qedexekirî, zimanê kurdî ye. Mebest bi zimanekî romanê, zimanê romanên min e. Her însanê heş li sêrî ku ne li pey xirecirên vala ye, dizane ku zimanê neteweyan gelekî kevn in û kollektiv in. Lê her însanê baqil dizane ku di her zimanê neteweyî de gelek celebên zimanên din, nivîskî, ne nivîskî, mîna mîsal, zimanê felsefê, huqukê, edebiyatê, siyasetê, di edebiyatê de jî zimanê şihîrê, romanê, piyesê, ceribandinê û hwd. hene. Û her însanê baqil ku ne zikreş e, dizane ku, em bibêjin, di hunera romanê de, her nivîskar xwediyê ûslib, şêwe û zimanekî xas e. Her nivîskarê ku hewl dide berhemên baş binivîse, li pey ûslib, şêwe û zimanekî xas e. Û her xwendevanekî têgihiştî dikare di berheman de vê yekê bibîne.

Di eynî programê de, ez ji bo Yaşar Kemal jî weha dibêjim; *Han har skapat ett nytt turkiskt språk* (wî zimanekî nû yê tirkî afirandiye.) Her însanê maqûl, bi hêsanî, ji vê gotina min fahm dike; mebesta min, ne zimanê tirkî, lê zimanekî nû yê romanê, romanên Yaşar Kemal e.

Bi milyonan temaşevanan weha rast fahm kiriye, lê Ciwan û çend kesên mîna wî ku naxwazin fahm bikin, bi awayekî din têdigihên. Ez dubare bikim; zimanê ku ez qal dikim, zimanê romanê ye û ne zimanê

romanên hin kesên din, zimanê romanên min. Navê kitabeke min a tirkî "Bir Dil Yaratmak" e (Afirîna Zimanekî). Tê de hevpeyvînên ku rojname û kovarên kurdî, tirkî û yên zimanên din bi min re çêkirine hene. Di wan hevpeyvînan de ez behsa ziman, zimanê romanê û zimanê xwe yê romanê dikim. Bila Ciwan wê bixwîne.

Tawsiya min li Ciwan; zimanê swêdî hîn be, bi swêdî romanan bixwîne, bibe xwendevanekî baş ê edebiyat û romanê û serê xwe hinekî jî, bi qasî zimanên din, bi zimanê edebiyatê biêşîne.

6- Ciwan dinivîse; "Mehmed Uzunî li kamerayên televizyonê dinihêrt û digot 'gava min dest bi nivîskariyê kir ne ferhengokek ne jî tik û tenha teksteka kurdî hebû'..."

Dîsan şaş. Min li kasetê guhdarî kir. Tiştê ku ez dibêjim, ev e;

- ... *jag hade varken ett riktigt lexikon eller en roman framför mig.* ..(bi swêdî)

- Û bi kurdî; ... *li ber min ne ferhengeke têkuz hebû, ne jî romanek...*

Ferqek mezin di navbera gotinên "teksteka kurdî" û romaneke kurdî de heye. Bêguman gelek tekstên kurdî beriya romanên min hebûn. Tekstên gelekî baş, girîng û hêja ku ez li her derê bi rêz û rêzdarî qal dikim. Lê roman? Heye ku beriya romanên min jî, li Tirkiyê, romanên kurdî hebûne. Ez pê nizanim, lê geriyam, lê min nikarîbû bidîta. Eger romanên weha hene, divê Ciwan wan bibîne û pêşkeşî me bike. Hingî ez ê, bi kêfxweşî, ne bi tenê uzir bixwazim, herweha spasî Ciwan jî bikim. (Û tiştekî din; gava ez dibejim, "beriya romanên min li Tirkiyê romanên kurdî nîn bûn", armanca min, ne pesn e. Pesnên weha erzan in. Armanca min, nîşandana trajediyekê ye, trajediya ku dewleta tirk bi serê kurdan de aniye, trajediya ku dewlet nahêle ku bi milyonan kurd bi zimanê xwe bixwîne binivîse, romanên xwe biafirîne. Li dinyayê miletekî ku bi qasî bîst milyonan e, li Tirkiyê, lê hê jî hejmara romanên wî bi qasî tiliyên destekî tên hejmartin, heye?)

Herçî tekstên kurdî ku li Tirkiyê, ji destpêka 1900-an heta îro, hatine nivîsîn in, di gelek cîhan de min behsa wan kiriye. Mîna mîsal di kitaba min "Destpêka Edebiyata Kurdî" de, bi kurtebirî behsa wan dibe. Bila Ciwan lê binihêre; ez bi van tekstan gelekî serbilind im. Eger ew xebat, fedakarî û tekst nebûna, îro kes ê nikaribûya tiştekî binivîsanda. Ez nikarim li ser navê kesî bipeyivim, lê ez mîna şexs, mîna nivîskar,

gelekî deyndarê wan tekstan im. Berî niha bi qasî du mehan ez li Diyarbekirê bûm. Min di gotara xwe ya Gazeteciler Cemiyeti de weha got, - bila Ciwan jî guh bidiyê; "di nivîskariya min de keda hemû çîlekêşên zimanê kurdî heye. Her kesê ku beriya min gotineke kurdî nivisiye, bi qasî min, xwediyê van berheman e..."

Tawsiya min li Ciwan; bi nefret, hêrs û hesûdî ramebe û rûmene. Ji pencereya teng a cîhaneke gelekî tarî ku ji hin mensûbên komikeke biçûk hatiye pê, li tiştan menihêre. Bihn fireh be û ya herî girîng xwe nû bike, zimanên nû, ûslib û celebên nû hîn be.

7- Ciwan gelek navên ku bi kurdî dinivîsin, li pey hev rêz dike û dibêje ku ez xebata wan nabînim û înkar dikim. Nikta jorîn vê meselê jî zelal dike. Ez behsa romanê dikim, Ciwan gotina min "teksteka kurdî" fahm dike. Piraniya van navan heval û dostên min in. Herwekî ku min li gelek cîhên din jî gotiye, xebat, berhem û afirînên wan gelekî hêja û girîng in. Ez qîmeteke gelekî mezin didim berhemên wan; berhemên wan, ji bo min, ji berhemên min bêtir biqîmet in. Her gotineke wan bi hemû cîhanê ye. Ev yeka hanê baweriya dilê min e û ne bi gotin, bi xebatên xwe ve min ev yek nîşan jî daye. Di salên 1980-an de, di rûpelên Kurdistan Press'ê de, min li ser van hevalan, xebat û berhemên wan gelek tişt nivisîne, ew dane nasîn, bi dû re jî di kitaba "Antolojiya Edebiyata Kurdî" de, ku ji du cîldan tê pê, ew, yek bi yek û bi firehî, tevî danasîn û berhemên wan, pêşkêşî xwendevanên kurdên Tirkiyê kirine. (Di vê kitabê de çend mensûbên grûba Ciwan jî hene.) Hebûna van hevalan, ji bo zimanê kurdî ku evçend diperçiqe û di bin xetereke gelekî giran de ye, zahf girîng e. Ev heval hem zêrînger hem jî çîlekêşên zimanê kurdî ne.

Ez dikarim, li vir, ji Ciwan û kesên mîna wî bipirsim ka wan ji bo van navan çi kiriye? (Eger em zimandirêjî, hesûdî û devavêtinê nehesibînin...) Lê ez ê vê yekê, jiber du sebeban, nepirsim, ew bi karên girîngtir, bi hilweşandin û têkbirina rêxistin, kom, komele, hevaltî û pêwendiyan mijûl bûn û pêwendiya wan a edebiyatê bi qasî dostî û mensûbiyeta wan e. Eger însan nêzîk an jî mensûbî wan û îdeolojiya wan be, hingî her tişt baş e, naxêr xirab e. Evçend basîd...

Tawsiya min li Ciwan; dewsa xirecirên weha, bikeve nav kûrahiya cîhana paqij a edebiyatê û navên ku

tu behs dikî, bide nasîn, nav û berhemên wan belav bike, xizmeteke pozîtiv ji bo ziman û edebiyata kurdî bike.

8- Herçî ew gotinên ku Ciwan li ser Yaşar Kemal dibeje, mîna gelek gotinên wî yên din, gotinên vala ne, - eger ez nebêjim, demagojîk. Yaşar Kemal ne behsa min, behsa romanên min dike. Dewsa gotinên weha divê Ciwan here û hin romanên din ku li Tirkiyê, bi zimanê kurdî, di salên 1910-20-30-40-50-60-70 û 80-an de hatine nivisîn, peyda bike û bîne. Hingî Ciwan ê çêyiyeke mezin li me hemûyan, li edebiyata kurdî, li xwendevanên kurd û li Yaşar Kemal bike. Ez bawer im,Yaşar Kemal ku hemû umrê xwe daye edebiyat û romanê û her gotinê ji bo herkesî nabêje, dê bi keşfeke weha, gelekî kêfxweş be, qedr û qîmeteke mezin bidiyê.

9- Ez niviskarê kê me, çi me? Welê dixuye ku Ciwan serê xwe gelekî bi vê yekê jî diêşîne. Ne hewce ye, bila ew serê xwe pê neêşîne, lê bixwîne. Berhem dipeyivin. Nivîskar jî dibêje, bila bibêje, çi îdîa dike, bila bike, ev hemû vala ne. Pîvan berhem e, berhema li holê nîşan dide ka nivîskarê berhemê, nivîskarê kê ye, çi ye. Lê eger Ciwan dixwaze serê xwe ji mij û dûmana tecrubeyên xwe yên kevn hinekî zelal bike, hingî ew dikare here û ji berpirsiyarên kitabxana taxa xwe bipirse ka M. Uzun nivîskarê kê ye, çi ye. Yan jî Ciwan dikare ji xismekî xwe yê Diyarbekirê, ji xwendevanekî tirk ê bajarekî Tirkiyê bipirse. Heye ku Ciwan, ji bo zelaliyê, bixwaze hin nivîsaran jî bibîne, hingî ez dikarim ji weşanxaneyeke xwe rîca bikim ku ew kopiya çend nivisarên ku li ser kitabên min hatine nivisîn, ji Ciwan re bişînin.

Ez di programê de dibejim, *"jag upplever mig som en svensk författare ocksâ..."* (bi swêdî)

Bi kurdî; ez xwe mîna nivîskarekî swêdî jî hîs dikim.

Mîna tiştên xwe yên jorîn, Ciwan vê yekê jî şaş fahm dike. Ez naxwazim rûpelên *Nûdemê* bi tiştên weha tijî bikim. Ez gelek tiştan ji xwendevanên xwe yên dilsoz re, bi kêfxweşî, îzeh dikim. Îzeh, carina, pêwist in. Eger Ciwan were û bi dilsozî bipirse, ez ê jê re jî, bi firehî îzeh bikim ka qesta min bi vê gotinê çi ye.

Tawsiya min li Ciwan; gotina edebî mîna zêran e, ew di binê axê de jî bimîne, dîsan zêr e. Quweta tu dewletê, rejîmê, rêxistin, kom, komik û şexsên çavnebar bi qasî quweta gotina edebî nabe. Gotina edebî dimîne, fireh dibe, bêtir tê xwendin, dikeve

dilê bi hezaran, deh hezaran însanan. Lê xirecir, teşqele, berberî, êrîş, tevî ku carina ew bi quwet bin jî, mehkûmî windabûnê ne. Bila Ciwan guh bide gotina edebî, hem bi kurdî hem bi zimanên din, ne gotinên çêr, hesûdî, berberî û dijminahiyê...

10- Gotina dawîn. Ciwan dinivîse; "qasî ku min taqîp kiriye ji romana pêşîn û bi vir de, pêşveçûnek di nivîskariya Mehmed Uzunî de çêbûye..." Ez vê gotinê jî mîna gotina xwendevanekî xwe dihesibînim. Xwendevanên min dikarin, bi serbestî, her daxwaza dilê xwe bibêjin, rexne, şaşî, kêmanî jî, rêz, pesn, danasîn jî. Lê bi şertê ku di gotinê de dilsozî hebe. Her gotina xwendevanên min ên dilsoz, bi qewlê bav û kalan, li ser serê min û çavê min e.

Ez hêvîdar im ku ez ê bikaribim berhemên hîn çêtir binivîsim û Ciwan ê jî, hêdî hêdî, bibe yek ji xwendevanên min ên dilsoz û sadiq ku hêz û quwetê didin min. ❑

Firatê bira,   17.02.99, Stockholm

Min nivîsara li ser polemîka M. Ciwan ku şandiye, nivîsî. Lê ne bi kêfxweşî. Tu dizanî, ez, bi rastî, ji tiştên weha hez nakim. Ez wan însanan fahm nakim. Çima Ciwan an ji yek-dudo ji grûba wî, dewsa tiştê weha hîç û pûç, rûnanin û romaneke kurdî nanivîsînin? Romanek ku ji romanên min gelekî çêtir, xweştir û bêjatir e. Bawer bike, hingî ez ê herim û bi dilxweşî, bi kêfxweşî wan pîroz bikim. Lê na, heye tune xirecir... Ev tam panzdeh sal in ku ew eynî tiştî tekrar dikin. Lê tevî vê israra wan rewş li meydanê ye. Dewsa vê yekê, di nav van panzdeh salan de, heye ku wan bikaribûya hin romanên baş biafirandina.

Ez nivîsarê dişînim. Lê ez hew dixwazim ku ew bê weşandin. Çaxa min ev nivîsar nivîsî, bûyera A. Öcalan qewimî. Di demeke weha giş û xirab de, ne wexta tiştên weha hîç û pûç in. Kurd ji me hemûyan tiştên hîn bêjatir dipên. Ez dizanim, sibê roj gava xwendevanên Nûdemê polemîka Ciwan û bersiva wî bixwînin, ew ê gelekî li hev kevin û bipirsin, "malmîratno, ma wexta van tiştan e?"

Eger tu dixwazî polemîka Ciwan biweşînî, biweşîne, tu bi kêfa xwe yî.

Lê pêşniyara min; rûpelên Nûdemê, di vê dema giş de, bi tiştên weha vala neherimîne. Nivîsara min ji Ciwan re bişîne. Bersiva wî tê de heye. Lê eger hê ji ew tatmîn nabe yan ji pirsên wî hebin, ew dikare, bi wasita te, yan ji raste rast, bi min bigihîne. Ez bi kêfxweşî. dîsan bersiva wî didim.

Tevî silavên min ên germ

Mehmed Uzun

Bipê

Bipê Amed bipê
Şervana azadiyê bipê
Bi sûra xwe ya qewî
Bi mizgeft û dêrên xwe
Bi qehwexane û kuçên xwe
Bi birçîbûnî û perîşaniya xwe
Bi sêwiyên xwe yên li ber dîwaran
Bi şehîdên xwe yên nemir
Bi evîndarê xwe yê bêmirad
Bi zîndana xwe ya bûbû kela bexwedanê
Bi çemê xwe yê Dîcle ku îro melûl diherike
Bi serhildanên xwe
Bi mêrxasên xwe
Bi trajediya xwe ya dîrokî
Bipê Amed bipê
Şervana azadiyê bipê

ZEKÎ SEYDA

Jiyan û ramanên Celadet Bedir-Xan

N. ZAXURANÎ

Beriya niha bi çendekî berhema Konê reş ya bi navê "Celadet Bedir-Xan - jiyan û ramanên wî -" kete destê min. Wê gavê pêre pêre kêfa min jê re hat. Lewra, gava ku min li nav rûpelên wê çavê xwe gerandin, min dît ku berhem li ser birrekî dîroka me ya nêzîk hatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê jî, min xwest ku ramanên xwe li ser vê berhema Konê Reş bi awayekî bi rêk û pêk raxim ber çavê xwendevanan. Berhem ji aliyê "Weşanên Jina Nû " ve hatiye weşandin û ji 111 rûpelan pêk tê. Ji bo ku nivîskarî, bi rêz Konê Reş hewl daye ku ligel ramanên xwe di serpêhatina hûnandina berhema xwe de naveroka berhema xwe bi alîkariya wêneyên Celadet Bedir-Xan ligel yên malbat, heval û hogirên wî bineqişîne, bi bîr û baweriya min berhema wî bêtir rengîn bûye.

Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku naveroka berhemê ligel kar û barê Celadet Bedir-Xan yên politîkî, rêxistinî û çandî, dîroka me kurdan ya nêzîk di nav rûpelên xwe de bi cih dike. Ji ber vê yekê jî, ez dixwazim ku sernivîsên berhemê di çerçewa sê beşan de li hev kom bikim. Beşê yekê, dîroka Bedir-Xaniyan, yê diduwan, raman û xebatên Celadet Bedir-Xan, yê siyan jî, ji ber çi Celadet Bedir-Xan di demeke kurt de hate jibîrkirin?

Dîroka Bedir-Xaniyan

Di van sernivîsên xwe de nivîskar, birêz Konê Reş hewl daye ku dîroka Bedir-Xaniyan ya ku sergom û berxwedanê di va xwe de bi cih dike, bi awayekî bi rêk û pêk raxîne ber çavê xwendevanan, da ku bi vî awayî jî jiyan û ramanên Celadet Bedir-Xan di serpêhatina dem û dewranan de bê zelal kirin. Lê belê, gava mirov hewl dide ku van sernivîsan bi xwîne, wî çaxî mirov bi hêsanî dibîne ku hingî Konê Reş serê xwe bi gelek alî li ser van sernivîsan êşandiye, kar û barên Celadet Bedir-Xan ligel ramanên wî parîkî tên mij û moran kirin.

Weke ku di hevokên jorîn de jî hate destnîşankirin, dîroka Bedir-Xaniyan beşek ji dîroka me kurdan ya nêzîk e. Bi rastî jî, gava ku haya mirov di serpêhatina dem û dewranan de ji vî beşê dîroka welatê me ya Kurdistanê hebe, wî çaxî ji mirovî ve tê xuyakirin, bê Bedir-Xaniyan mîna aktorên sereke çi roleke girîng î bi rûmet tê de leyistine. Lewra, Bedir-Xaniyan hê ji salên 1585an ve hewl dane ku axa, beg, şêx, gundî û hejarên Kurdistanê li dora xwe bicivînin, da ku bi alîkariya vê yekê bikaribin Kurdistaneke rizgargirî û yekgirtî damezrînin. Bi qasî ku tê zanîn, mîrê ku ji bo pêkanîna vê yekê hewl daye, kar û barên dijwar û hêja li dar xistiye, Mîr Bedir-Xan kurê Evdilxaliqê Evdil Xan e. Mîr Bedir-Xan hê di 18 saliya xwe de bi dest mîritiyê kiriye.

Gava mirov rûpelên dîroka Kurdistanê ya serdema wî dixwîne, mirov bi çavên xwe dibîne bê Mîr Bedir-Xan çi mirovekî çeleng û di ser xwe re bû ji bo bicihkirina hunera siyasî û birêvebirina kar û barê dewletî. Ji ber ku wî bi hemû hêza xwe hewl dida ku bingehê dewletê di warê hemû jiyanê de bavêje da ku bi alîkariya vê yekê bikaribe rê li ber hêzên dagirker yên mîna Osmaniyan bigre. Ji bo ku Mîr Bedir-Xan rind dizanî ku civata Kurdistanê ji aliyê ol û zimên ve civateke rengîn e, bi awayekî têgihiştî rêbazên xwe yên politîkî li gora vê rengîniya civata Kurdistanê afirandiye. Wî bi hemû hêza xwe hewl daye ku fitne û fesadiya di navbera musilman, yêzîdî, cihû û filehan de rake. Ji ber ku hêzên dagirker yên biyanî nakokî û aloziyên di navbere misilman, yêzîdî û filehan de ji bo kar û barên xwe yên bi qirêj bi kar tanîn. Weke ku bi hêsanî ji dîroka me ya kevnar û nûjen tê têgihiştin, ji ber vê fitne û gelaciya hêzên dagirker pevçûn û dijwariyên bêserûber di navbera ol û mezhebên ji hev cuda de dihatin pê. Ji bo van pevçûn û xirûciran jî, civata Kurdistanê ser û binî hev dibû, bîr û baweriya netewî, olî û civakî pirr qels û lawaz dibû.

Ji bilî vê jîrîtiya Mîr Bedir-Xan, mirov taybetmendiyên mirovê dewletmendî di kar û barê konevantiya Mîr Bedir-Xan de ya ku ji bo damezrandina dewletê pêwîst bû, dibîne. Lewra, Mîr

Bedir-Xan, ji alîkî ve, hewl dida ku sînorê mîrektiya xwe roj bi roj firehtir bike, ji aliyê din ve jî, kar û barekî hêja li dar dixist ji bo ku bikaribe dezgehên çekan peyde bike, da ku bi alîkariya vê yekê bingehê mîrektiya xwe bi hêztir bike. Herweha, Mîr Bedir-Xan ji bo ku xwe bi gelê xwe bide pesend (qabûl) kirin, Xutba înê hema bibêje li hawirdorê Cizîra Botan li ser navê xwe dida xwendin. Ji bilî vê yekê, Mîr Bedir-Xan ji bo ku di warê navnetewî de li hemberî Paşayên Osmaniyan bi tenê nemîne, peywendiyên xwe bi Îbrahîm Paşayê Misrî re danîn.

Ji ber vê yekê jî, Paşayên Osmaniyan ji vî kar û barê Mîr Bedir-Xan gelekî ditirsiyan û xwestin ku bi fen û fûtan Mîrektiya Mîr Bedir-Xan ji meydana dîrokê rakin. Bêguman, Paşayên Osmaniyan ji bo vê yekê zehf hewl dan, da ku Mîr Bedir-Xan bi fen û xapan ji rê bibin, lê Mîr Bedir-Xan bi van fen û fûtên Paşayên Osmaniyan nehate xapandin, qet xwe nesiparte wan. Vêca, ji bêzarî Siltanê Osmaniyan rabû hêzeke leşkerî bi serkêşa Osman Paşa bi rê kir ser Kurdistanê. Kurdan bi serdariya Mîr Bedir-Xan xwe ji êrîşa wan re amade kirin. Herdu hêz li dorbera Ormiyê li ba Çemê Zeytûnê hatin pêşberî hev. Di navbera van herdu hêzan de şerekî dijwar hate pê. Hêzên Osmaniyan yên bi serkêşiya Osman Paşa kirin û nekirin zora Mîr Bedir-Xan nebirin. Lê mixabin, di vê kêliyê de dîsa nukertiya kurdan ku mîna êşeke kevnar ketiye laşê me kurdan rabû ser lapan. Xwarzê û pismamê Mîr Bedir-Xan, Mir Yezdanşêr ligel çend hevalên xwe xwe parestine Paşayê Osmaniyan. Wî hêvî dikir ku piştî têkbirina Mîr Bedir-Xan ya di cengê de, dê Siltanê Osmaniyan Mîrektiya Botanê bide wî. Lê wî nizanîbû ku ev xapandineke Siltanê Osmaniyan e, ku Siltanê Osmaniyan hewl dide ku wan ji hev biqetîne û bi alîkariya vê yekê hebûna xwe li heremê xurttir bike. Ligel vê yekê jî, Paşayê Osmaniyan di cengê de zora Mîr Bedir-Xan nebir. Mîr Bedir-Xan xwe li ber cenga Paşayê Osmaniyan girt û hemû fen û fûtên wan pûç kirin. Mîr Bedir-Xan ligel hêza xwe ya leşkerî di Keleha Eruxê de bi cih û war bû. Di vê kelehê de cenga xwe li hemberî Paşayê Osmaniyan domand.

Berxwedana Mîr Bedir-Xan ya di Keleha Eruxê de li pêşberî Paşayê Osmaniyan bi mehan domand. Paşayê Osmaniyan kir û nekirin zora wî nebir. Ji bo vê yekê jî, Paşayê Osmaniyan taktîka xwe ya cengê guhertin, dîsa mîna hercar destê xwe avêtin çeka xwe ya hercar: Ol. Paşayê Osmaniyan rabû çend kurtanê qantiran bi ayatê Quranê xemilandin û di kêliya cengê de dane pêşiya xwe. Ji ber vê yekê jî, leşkerên Mîr Bedir-Xan ji ber pîrozbûna ayatên Quranê di cengê de destê xwe li hemberî ayatên Quranê hilneda. Bi carekê re dev ji şer

Yên rûniştî: Emîn Alî Bedir-Xan, Alî Şamil Bedir-Xan û Miqdad Mîthed Bedir-Xan

berdan. Paşayê Osmaniyan bi alîkariya vê fen û xapa bi reng olî zora Mîr Bedir-Xan bir. Leşkerê wî ji hev hate belavkirin. Ew bi xwe weke dîl kete destê Paşayê Osmaniyan.

Siltanê Osmaniyan ji bo vê serketina xwe ya di Cenga Kurdistanê de medalyên "Cenga Kurdistanê" li leşker û serfermandarên xwe mîna xelat belav kirin. Li rexekî medalyê "Cenga Kurdistanê" hatibû kolandin, li rexê din yê wê jî wêneya "Keleha Eruxê" hatibû resm kirin. Serfermandarê Siltanê Osmaniyan Mîr Bedir-Xan bi xwe re bir sergomê û li Girava Girîtê xistine ber çavan. Hê ji hingê ve sergomkirina Mala Bedir-Xaniyan heta roja me didomîne.

Mîna ku ji naveroka vê berhemê û yên din ku li ser dîroka kurdan hatine nivîsandin, tê fêhmkirin ku mirov dikare hinek encaman derxîne ku ji bo pêşeroja me gelekî girîng û bi reng dirokî ne. Encama yekê ew e ku karbidestên dewletên ku welatê me di nav xwe de parve kirine, herdem ol(dîn) ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne. Bi saya vê yekê jî, tevgêrên gelê me yên bi reng netewî ji hev perçe kirine û meremên xwe yên bi qirêj î kolonyalîstî bi cih kirine. Ji bo vê yekê jî, divê ku siyaset-

mend û rewşenbîrên me rastiya Kurdistanê ya bi gelek alî baş tê bighin û li gor rastiya welatê me ya rengîn rêbazên xwe yên polîtîkî li dar bixînin. Ji ber ku hêzên dewletên dagirker diho û îro jî ji rastiya Kurdistanê ya rengîn î bi zehf alî ji xwe re bi kar tênin û mîna xefk û davkan ji bo serkutkirina tevgêra me ya netewî di destê xwe de hiştine. Ma ne bi alîkariya van xefk û davkan hêzên Paşayên Osmaniyan li pêşberî tevgêra Mîr Bedir-Xan qantir bi ayatê Quranê xemilandin û tevgêra wî têk birin. Îro jî karbidestên Komara Tirkiyê dibin sîwana olî de hêzên paramîlîter yên bi navê " Hizbî Kontra" bi rê dixin û li bajar, gund, çiya û newalên Kurdistanê keç û lawên gelê kurd yên herî têgihiştî roj bi nîvro dikujin.

Bêguman, di vî warî de gava mirov li dîroka tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê dinere, mirov dibîne ku serkêşên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê yên mîna Şêx Mahmûd û Mîr Bedir-Xan haya wan ji xefkên bi reng olî yên ku ji aliyê birêvebirên dewletên dagirker ve ji bo serkutkirina tevgêra netewî bi kar tanîn, hebû. Ji ber vê yekê jî, wan cihekî gelekî girîng daye kesên asûrî, ermenî û yêzîdî di nav dezgehên xwe yên bi reng dewletî de. Îro jî gava ku mirov li nav refên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê dimeyzêne, mirov di nav kar û barê wan yên rêxistînî, polîtîkî, weşanî û kulturî de dibîne ku rêxistin û dezgehên me yên polîtîkî û çandî ji bo ku bikaribin rê li ber vê nakokiya olî bigirin, di kovar û weşanên xwe de bi bîrewerî biratiya kêmenetewe û olên Kurdistanê yên ji hev cida diparêzin. Lê, ma gelo vê yekê rê li ber fen û fûtên berpirsiyarên dewletî girtine?

Alozî û sergêjiya din ya ku di serpêhatina dem û dewranan de herdem di nava refên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê de bûye sedema lawazî li pêşberî hêzên dagirker, nukertî û xayintiya ku ji nav civata me kurdan peyde dibe, bi xwe ye. Lewra dema ku haya mirov ji dîroka tevgêra rizgarîxwaz hebe, wî çaxî mirov rind hîn dibe ku pirraniya serhildanên me yên netewî - çi di dîroka kevnar de û çi jî di dîroka me ya îroyîn de - ji ber nukertî û xiyanata di nav refên tevgêra rizgarîxwaz de têk çûne. Bêguman di vî warî de mirov dikare pirr mînakan bide, lê mînakên herî berbiçav mînaka Yezdanşêr ya di dema Mîr Bedir-Xan de û mînaka Reber ya di çaxê Seyid Riza de ne. Weke ku tê zanîn, nukertiya Yezdanşêr derbayeke mezin li tevgêra Mîr Bedir-Xan xist û herweha bê gotûbêj xiyaneta Reberî ya bi barberên kemalîst re jî tevgera Seyîd Riza gelekî qels kir. Ji bo ku di dema me ya îroyîn de rê li ber hemû cure nukertiyê bê girtin, divê ku siyasetmend û rewşenbîrên me bi awayekî zanistî û bîrewerî di dema birêvebirina siyaseta xwe ya netewî de xwedî taktîk û şêwe-

Emîn Alî Bedir-Xan

yên kar û xebatê yên bi reng siyasî bin, da ku bi alîkariya vê yekê mirov bikaribe tovê nukertî û hemû awayên xiyanetê yên rizî ji nav refên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê biqelîne.

Bi têkçûna serîhildana Mîr Bedir-Xan re penaherî û sergoma Bedir-Xaniyan dest pê kir. Siltanê Osmaniyan bi alîkariya vê yekê, ji alîkî ve Bedir-Xanî ji welatê wan dûr dixistin, da ku xwe li hev

Bedir-Xaniyan tu carî dev ji ya xwe bernedan û berdem hewl dan ku li welatê xwe vegerin.

Yên rûniştî: Memduh Selîm, Celadet û Kamiran Bedir-Xan

Raman û xebatên Celadet Bedir-Xan

Konê Reş di van sernivîsên xwe de bewl daye ku raman û xebatên Celadet Bedir-Xanî yên rengîn - çi yên polîtîkî, rêxistinî û çi yên kulturî - zehf bi alî vebêje.

Bi rastî jî, mîna ku rind tê zanîn, Celadet Bedir-Xan lawê malbateke arîstokrat î nas e. Nebiyê Mîr Bedir-Xan e. Lawê Emîn Alî Bedir-Xan e, yê ku di prosesa sergomê ya dijwar de zar û zêçên xwe bi alîkariya ozan, dengbêj û çîrokbêjên Kurdistanê bi kultura botanî xwedî kirine. Bi saya vê yekê Celadet Bedir-Xan mîna gelek Bedir-Xaniyên ku di jiyana sergomê de çavên xwe vekirin, zimanê xwe yê zikmakî ji bîr nekir, hînî gelek zimanên din

nedin hev û dîsa li hemberî Împeratoriya Osmaniyan serî ranekin, ji aliyê din ve jî, Siltanê Osmaniyan hewl didan ku wan li dora xwe bide hev û bi alîkariya vê yekê jî, desthilatdariya xwe li navça wan xurttir bike. Lê, mîna ku tê zanîn,

yên biyanî bû. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku Celadet Bedir-Xan ji alîkî ve siyasetmendekî di ser xwe re bû, ji aliyê din ve jî ew kulturmendekî bêhempa yê bi kapasîte bû.

Ji bo ku birêz Konê Reş di serpêhatina hûnandina berhema xwe de bi gelek alî mîna ku mirov ta bi derziyê ve bike, li ser dîroka malbata wî rawestiyaye, ez dixwazim ku ji dîroka Malbata Bedir-Xaniyan bêtir li jiyana Celadet Bedir-Xan ya polîtîkî û ramanî rawestim. Bi qasî ku ji vê berhemê û gelek nivîsandinên din yên ku li ser jiyana Celadet Bedir-Xan hatine nivîsandin, tê fêhmkirin, Celadet Bedir-Xan herdem di warê jiyana polîtîkî de mirovekî jîr bû. Ji bo ku bikaribe ramanên xwe yên polîtîkî di warê jiyana civakî ya Kurdistanê de bi cih bike, herdem hewl daye ku komele û rêxistinên polîtîkî û kulturî damezrêne, da ku bi alîkariya vê yekê mîna rêberekî kurdan daxwaz û hêviyên gelê xwe bi cih bîne. Di vî warî de kar û xebatên wî yên polîtîkî û rêxistinî xwe di dema damezrandina Xoybûnê de didine xuyakirin. Mîna ku baş tê zanîn, rêxistina Xoybûnê bi rêbertiya Celadet Bedir-Xan ligel axa, giregir û zanyarên kurdan yên wê demê ve hatibû damezrandin. Îro jî gava mirov mîna rêxistineke polîtîkî li ser prensîp û hevbeşdariya wê ya polîtîkî dirame, mirov dibîne ku Xoybûn rêxistineke bi reng - ligel kêmaniyên wê yên rêxistinî - Kurdistanî bû. Lewra rêberên wê Kurdistaneke serbixwe ji xwe re kiribûn amanc. Ji ber vê amanca wan jî, kar û barê wan yê siyasî li gor vê amanca wan dihate birêvebirin. Ji aliyê din ve jî, mirov dikare bibêje ku di tevgêra dîroka me ya polîtîk ya nêzîk de Xoybûn rêxistineke herî yekte bû ku ligel kar û xebata xwe ya polîtîkî û rêxistînî kar û barê kulturî jî li gor îmkanên xwe di nava rafên gel de bi rê ve dibir. Ji ber vê yekê jî, Xoybûn di gelek waran de ji rêxistinên piştî xwe yên ku bi awayekî rap û rût kar û barê polîtîkî bi yek alî bi rê ve dibirin, bêtir bi jiyana civakî ya Kurdistanê re digunciya. Ango, mirov bixwaze vê yekê bi awayekî din vebêje, mirov dikare weha birame: Xoybûn xwediyê siyaseteke netewî bû.

Gava haya mirov ji kar û barê Celadet Bedir-Xan yê polîtîkî hebe, wî çaxî mirov tê digihê ku Celadet Bedir-Xan di warê jiyana polîtîkî de çi mirovekî têgihiştî û jîr bû. Ji ber gava ew dibîne ku Şoreşa Şêx Seîd ji aliyê Kemalîstan ve bi awayekî hov tê perçiqandin, hema ew pêre pêre axa, giregir û zanayên kurdan li Libnanê li hev dicivîne û bingehê Xoybûnê davêje. Amanca wî bi damezrandina Xoybûnê ew bû ku endam û layengirên xwe li ser hev kom bikin, da ku bi awayekî xurt li herêma Torê ji bo piştgiriya Şoreşa Agriyê eniyekê li dar bixin.

Lê, weke ku tê zanîn, ji ber ku di wê

demê de navbera Dewleta Tirk û Desthilatdariya Fransî xweş bû, Desthilatdariya Fransî li ser daxwaza Dewleta Tirk rê li ber welatparêzên kurd girt û ji ber vê yekê jî welatperwerên kurd tu fersend nedîtin ku di herêma Torê de eniyekê vekin û bi vî awayî jî bibin alîkar ji bo Şoreşa Agiriyê.

Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xuyakirin, Xoybûn di dîroka tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ya nêzîk de rûpelekî nûjen e. Hêja ye ku mirov serê xwe li ser vî rûpelê dîroka gelê Kurdistanê bi gelek alî biêşîne, da ku mirov bi alîkariya vê yekê bikaribe rêxistina Xoybûnê mîna tevgêreke polîtîkî raxe ber çavan. Ma gelo ne heyf bû ku Celadet Bedir-Xan kevneşopiya Xoybûnê nedomand? Ji ber ku Xoybûn bi hevbeşiya xwe ya civakî, bi nerîna xwe ya Kurdistanî, bi çalakî û kar û barên xwe yên polîtîkî û yên çandî gelekî balkêş bû. Bi rastî jî, mirov dibîne ku di felsefa serkêş û rêberên Xoybûnê de amadakarî ji bo vegera li welêt heye.

Ji aliyê din ve jî, heger ku kevneşopiya Xoybûnê mîna mînakeke rêxistinî ya polîtîkî heta dema me hatiba jiyandin, dê nivşê salên heftêyî xwediyê mîraseke bingehîn ba di warê damezrandina rêxistinên Kurdistanî yên civakî û netewî de. Ji ber ku nivşê salên heftêyî di zaningehên Tirkiyê de ligel refên çapê tirkan şiklê xwe yê siyasî girtin, hema bibêje li ser mîraseke xwedî bingehekî gelekî lewaz rêbaz û tevgêrên xwe yên bi reng polîtîkî li Kurdistanê li dar xistin. Ji ber vê mîrasa lewaz ya polîtîkî beşek ji rêxistinên me bi ser vî aliyê "sosyalîst" de, beşê din jî bi ser aliyê din yê "sosyalîst" ve çûn, lê ya hevbeş ji bo rêxistinên me ev bû ku di warê siyaseta netewî de gelekî lawaz î qals bûn.

Lê, ji aliyê din ve jî, gava ku mirov li jiyana Celadet Bedir-Xan dikole, mirov dibîne ku wî hê ji dema xortaniya xwe ve hewl dida ku xwe ji bo rizgarkirina welatê xwe di warê polîtîkî û cangorî de perwerde bike. Lewra, dema ew ligel birayê xwe ji bêzarî bi ser riya Almanyayê dikevin, hewl dida ku xwe li Almanyayê hînî jiyana cenga gerîla bike. Amanca wî bi vê yekê ew bû ku li Kurdistanê vegere û bikaribe rêbertiya tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê bike.

Lê, ji aliyê din ve jî, gava ku mirov guhdarî Konê Reş dike "Ji roja ku Mîr Celadet Bedir-Xan li Şamê bi cî bû, di 1930 î de di rewş û halê kurdan de ponijî û tu hêviyên nêzîk di warê şer û cengê ku wê kurd rizgar bibin, nedidît, nemaze pîştî ku Şoreşa Şêx Seîd û Şoreşa Agiriyê beravêtî bûn." êdî " Weha Mîr Celadet xweş nas kiribû ku xebateke dûr û dirêj gerek e ji şiyarbîna gelê kurd re...." Bi qasî ku ji bi rêz nivîskarî tê fêhmkirin " Bi vê hincetê Mîr Celadet ew elfeba xwe ku di sala 1919an de dest bi xebata wê kiribû ku kovarekê pêre derxîne..." li ser kar û xebateke bê-

Celadet Bedir-Xan (Rûniştî, ji milê rastê yê duduwan) bi endamên Xoybûnê re

hempa li dar dixe. Lê, Celadet Bedir-Xan ji vê yekê wir de hêdî bi hêdî ji kar û xebata polîtîkî ya rêxistinî dûr dikeve û bi hemû hêza xwe li ser kar û xebata çandî mijûl dibe. Bêguman, divê ku mirov bibêje ku ev mijûlbîneke rengîn û pîroz e.

Lê, ji aliyê din ve jî divê neyê jibîrkirin ku di welatekî dabaşkirî de mirov nikare bê alîkariya dezgehên polîtîkî wî welatê wêrankirî ji bindestî û rebeniya ku ji nezantiyê diafire, rizgar bike. Ji bo vê yekê jî, mirov bi cih nizane, bê sarbûna Celadet Bedir-Xan ji kar û barê polîtîkî bîr û baweriya wî ye, an jî şîrovekirina nivîskarê berhemê ye. Bi peyveke din mirov parîkî şaş dimîne: Ma gelo ji ber çi miroveki mîna Celadet Bedir-Xan ku di warê jiyana polîtîkî de herî aktîf bû, bi carekê re dev ji kar û barê xwe yê polîtîkî berdide û bi yek alî hewl dide ku bi kar û xebata çandî ve mijûl bibe?

Bi qasî ku Celadet Bedir-Xan di warê polîtîkaya netewî de jîr bû, ew wilqasî jî kulturmendekî tegihiştî bû. Lewra, Cekadet Bedir-Xan di ber kar û barê xwe yê siyasî û rêxistinî re li ser ziman, wêje

û folklora kurdî bêrawestan hewl dida ku şirove, lêkolîn û berhevkirinan li dar bixe. Dema ku wî ligel heval û hogirên xwe li ba mala Haco Axa li gundê Mizgeftê ku ser bi Tilbesbiyê ve ye, ji alîkî ve hewl didan ku ji bo piştgiriya Şoreşa Agiriyê eniyekê li Herêma Torê vekin, da ku bi alîkariya vê yekê leşkerê tirkan lawaz bikin, ji aliyê din ve jî, wî bêhedan hewl dida ku li ser elfeba kurdî ya latînî kar û xebata xwe bi gelek alî bi rê ve bibe.

Ji xwe, divê rind bê zanîn ku afirandina elfebaya kurdî ya bi tîpên latînî ji aliyê Celadet Bedir-Xan ve bi serê xwe şoreşeke kulturî ye, ji bo zimanê kurdî. Ji ber ku ji alîkî ve elfebaya kurdî ya latînî bêtir bi fonetîka zimanê kurdî dikeve, ji aliyê din ve jî, zimanê kurdi dibe zimanekî nivîskî yê serbixwe. Bêguman, bi alîkariya vê yekê zimanê kurdî li xwe vedigere, li ser dînamîkên xwe yên netewî û civakî bêtir bi xwîn û can dibe. Ji bin bandora zimanên cîran derdikeve. Hêdî bî hêdî ber bi geşbûn û balbûnê ve diçe.

Bi rastî jî, gava ku mirov li ser kar û barê Celadet Bedir-Xan yê ku ji bo berhemkirina elfebaya kurdî ya latînî li dar xistiye, dirame, mirov bi hêsanî têdigihê ku Celadet Bedir-Xan zimanzanekî di ser xwe re bû. Lewra, gava ku wî hewl daye ku hîmê elfeba kurdî ya latînî deyne, li ser zimanê kurdî bi gelek alî mijûl bûye. Zimanê kurdî bi zimanên biyanî yên mîna yewnanî, almanî, tirkî û ingilîzî re bi gelek alî di gelek war û mijaran de muqayese kiriye. Piştî kar û xebateke weha ya bi rêk û pêk ya ku bi salan domandiye, wî hêdî bi hêdî hewl daye ku hîmê elfeba kurdî ya latînî ya ku îro em pê dinivîsînin, daniye. Bêguman, ev xelata herî bi rûmet e ku Celadet Bedir-Xan diyarî gelê Kurdistanê kiriye.

Bêguman, Celadet Bedir-Xan ji bo ku elfeba kurdî ya latînî di nava kurdan de bide naskirin, kar û xebata xwe ya bi reng kulturî bi alîkariya kovarên mîna Hawar û Ronahiyê rengîntir kiriye. Ligel desttengî û dijwariyên dema wî, wî her hewl daye ku bêrawestan kar û barê xwe yê çandî hema bibêje di warê hemû jiyana civakî de bidomîne. Îro heger ku em bi hêsanî dikarin li ser pirsgirêkên xwe yên çandî, zimannasî, rêxistînî, polîtîkî, civakî, netewî û ronakbîriyê bi zimanê xwe gotûbêjan çi di warê nivîskî û çi di warê devkî li dar bixin, bêgûman bi saya ekola Hawarê ya ku Celadet Bedir-Xan di saxitiya xwe de rêbertî jê re kiriye. Ya ku îro ji me tê xwestin ew e ku em bikaribin kar û xebata xwe ya çandî li ser hîmê ekola Hawarê geş bikin, da ku bi alîkariya vê yekê çanda me ya netewî hebûna xwe di warê hamû jiyana civakî de bidomîne.

Ma gelo ji ber çi Celadet Bedir-Xan di nava me kurdan de hate ji bîr kirin?!!!

Li ser jibîrkirina Celadet Bedir-Xan

di nava me kurdan de Konê Reş dixwaze ku di serpêhatina hûnandina hinak sernivîsên xwe de bi alîkariya hoyên jêrîn pirsgirêkê şirove bike.

Yek ji sedemên wî ew e ku "Di wê heyamê de Partiya Komunîst a Sûriyê jî cihê xwe di Sûriyê de girtibû û armancên xwe yên sosyalîstiyê, zanîn û wekheviyê şanî tev gelan dida. Vêca, kurd bi taybetî bûn endamê vê partiyê, ji ber ku bêtir nêzîkî armanc û daxwazên wan bû, nemaze ew kesên jîr û zîrek di Şamê de." Li gor nivîskarî, vê "Partiya Kumunîsta Sûriyê" ya ku bi peyvên wî xwediyê "..... armancên xwe yên sosyalîstiyê, zanîn û wekheviyê şanî tev gelan dida.", bû sersebebê herî sereke yê ku Celadet Bedir-Xan di nava kurdan de bê ji bîr kirin. Ligel vê yekê jî, her çi hikmet e ku "Partiya Kumunîsta Sûriyê" "...bêtir nêzîkî amanc û daxwazên wan bû, nemaze ew kesên jîr û zîrek ...." Bi rastî jî, mirov nizane bê çi ji birêz nivîskarî re bibeje! Lewra dê partiyek li pêşberî ronakbîrê kurdan wilqasî roleke negatîf bileyize, dîsa jî, dê ew partî mîna partiyeke xwedî amancên zanîn û wekheviya gelan şanî mirovî dida bê destnîşan kirin. Mîna ku nivîskar bi xwe dibêje:" ji ber ku akama wê bi xurtî di windabûn û ji bîr kirina navê Mîr Celadet Bedir-Xan de hebû."

Bêguman, para rastiyê di vê nêrîna nivîskarî ya ku jibîrkirina navê Mîr Celadet Bedir-Xan ya di nava kurdan de bi xurtbûna "Partiya Kumûnîsta Sûriyê" ve girê dide, heye. Lê ya ku mirov diheyirîne ew e ku hê nivîskar vê partiyê mîna partiyeke sosyalîst û xwdî amancên zanîn û wekheviya gelan şanî dide, bi xwe ye. Ma gelo "Partiya Kumûnîsta Sûriyê" li pêşberî dewleta xwe çend caran mafê gelê kurd yê netewî û civakî parastiye? Ji bo geşbûna çand û zimanê kurdî çi kar û xebat li dar dixist? Heger ku mirov bi çavakî nirxandina polîtîkî li dîroka "Partiya Kumûnîsta Sûriyê" bikole, wî çaxî mirov bi hêsanî dikare wê mîna partiyeke şovenîst destnîşan bike. Ji ber ku wê tu carî mafê netewa û kêmanetewan yên ku di bin pîkoliya dewleta serdestên wê de dinalin, neparast. Bi ser de jî, wê bi hemû hêza xwe li himberî şoreşgerên netewa û kêmanetewan qaşo di bin perda navnetewayiyê de xebateke şovenîstî li dar xist.

Sedema diduwan ya ku nivîskar Konê Reş ji bo jibîrkirina Celadet Bedir-Xan ya ku di nava kurdan de destnîşan dike, ew e ku "û ji rexekî din ve piştî ku Mîr Celadet çû ber dilovaniya Xwedê, nema wan nivîskarên kurd, ewên ku pêre kar û xebat dikirin li ser rê û şopa wî meşiyan û ji riya wî dageriyan. Hin ji wan komunîst bûn û dijî kebeniya wî sekinîn û hîna jî di vê dema dawîn de digotin, me Kovara Hawarê derdixist!" Ma gelo mirov dikare çi bibêje ji heval û hogirên wiha yên dilovan î dilşewat re!!! Bêguman, mîna ku nivîskar û xani-

ma Celadet Bedir-Xan, Rewşen Xanim jî gilî û gazinên xwe dike, kêmaniyeke herî mezin e ji bo heval û hogirên wî yên ku pêre karên polîtîkî û çandî li dar dixistin. Lewra Rewşen Xanim dibêje: "Di sal 1951ê û pê ve min rojên dijwar yên çetîn di jiyana xwe de buhurandine û kesî ji kurdan li şûnwarê Mîr Celadet Bedir-Xan nepirsî. Ev kêmaniyeke me kurdan e!"

Baş e, mirov dikare bi çi awayî vê "kêmaniya me kurdan" binirxîne? Lewra, gava ku mirov li dîroka ronakbîriya me - çi ya kevnar û çi ya nêzîk - dikole, mirov dibîne ku ku gelek rewşenbîrên me di nava hejartî û rebentiyê de mirine û di demeke kin de di nava kurdan de hatine jibîrkirin. Ma gelo mîna ku nivîskar, birêz Konê Reş dibêje: Em ê vê ji bîrkirinê bixne situyê "Partiya Kumûnîsta Sûriyê" an jî em ê bixne stukra çend heval û hogirên ku mîna ji wan dihate xwestin, li hevalê xwe yê ronakbîr xwedî derneketin? Bêguman, rola wan di jibîrkirina wî de heye. Lê, gelo mirov dikare wan mîna faktorên herî sereke destnîşan bike? Bi ya min NA!

Lê belê dikare bê pirskrin: Ma gelo faktora herî sereke çi bû ku Celadet Bedir-Xan di nava kurdan de di demeke kurt de hate jibîrkirin?

Bêguman, mirov dikare di vê mijarê de gelek faktoran li ser hev rêz bike. Lê, li gora min faktora herî sereke rewşa welatê me bi xwe ye.

Di wê demê de li bakurê welatê me mîna ku ji bav û kalê me dihate xwestin xwe baş organîze - çi diwarê netewî û çi di warê navnetewî de - nekirin. Ji bo vê yekê jî, serhildanên me yên netewî li Koçkirî, Amed, Agirî û Dêrsimê li pey ji aliyê kemalîstên kolonyalîst ve bi awayekî hov hatine perçiqandin. Lê heçî kemalîst bûn pêşiyapêşî bav û kalên me bi say dirûtiya xwe xapandin. Dûv re, peywendiyên xwe bi hêzên cîhanê yên wê demê - Sovyet, ‹ngilîsîtan û Fransa - re bi hêztir kirin. Li hemberî vê yekê, bav û kalê me bi qasî ku ji aliyê kemalîstan ve hatine xapandin, wilqasî jî ji aliyê hêzên cîhanê ve jî hatine şêlandin. Ango, hêzên cîhanê yên wê demê dixwestin ku bav û kalê me ji bo berjewendiyên xwe li hemberî dijberên xwe bi kar bînîn. Vêca, bi saya vê yekê kemalîstan piştî ku ji nû ve bakurê welatê me dagir kirin, asimîlasyona xwe çi di warê kulturî, siyasî û çi di warê eborî de bi awayekî dijwar bi rê ve birin. Mirov dikare bibêje ku welatê me Kurdistan di warê hemû jiyanê de serûbînî hev bû. Kevir li ser kevir nema. Bi carekê re hate wêrankirin.

Ji ber vê hovîtiya kemalîstên barbar siyasetmend û ronakbîrên me dev ji welêt berdan û mîna penebêrên polîtîkî li Sûrî û Libnanê bi cih bûn. Roj bi roj têkiliyên wan bi welêt re lawaz bûn. Kar û barê wan yê kulturî, rêxistinî û politîkî êdî mîna berê nema digiha we-

lêt. Ji ber vê yekê jî, kar û barê Xoybûnê çi yê polîtîkî û çi yê çandî ji demên berê qalstir bû. Mirov dikare bibêje ku Xoybûn ji neçarî ber bi dawiya xwe ve çû.

Ji xwe, mîna ku tê zanîn, bêdengî û qarîtiya dûvdirêj li bakurê welatê me heta destpêka salên heftêyî di warê hemû jiyanê de zal bû. Ji ber vê bêdengiyê jî, li bakurê welatê me nifşê wê demê ji çanda xwe hate bidûrxistin. Ronakbîr û siyasetmendên me yên ku di nav rafên Xoybûnê de çalak bûn, dev ji kar û barê xwe yê siyasî berdan. Ji bê rêxistinî, pirrê wan di nava hejartî û belengaziyê de çûn ber dilovaniya xwe. Vêca, heger ku di atmosfereke weha ya dijwar de ronakbîr û siyasetmendên me yên herî hilbijartî û têkoşer di nava me kurdan de bêne jibîrkirin, divê ku bi mirov parîkî "normal" bê.

Dema ku li bakurê welêt kemalîstan "Kurdistana xeyal" binax dikirin, li başurê welatê me jî serhildana Şêx Mahmûd ji aliyê îngilîzan ve bi firokan dihate serkûtkirin. Li vî perçê welatê me jî ewrên reş bi ser gelê me de şax û perên xwe berdidan. Herweha li rojhilatê welatê me jî, Komara Mehabadê ya ku xwedêgiravî bi alîkariya dewleta Sovyetê hatibû damezrandin, ji ber berjewendiyên wê dewletê yên li navçê ji aliyê Şahê Îranê ve hate ruxandin.

Vêca, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ji ber vê rewşa welatê me ya wêran û kambax ku wî çaxî li ser esmanê welatê me zal bû, ronakbîrên me yên mîna Celadet Bedir-Xan, Memduh Selîm Begê û gelekên din hatin jibîrkirin.

Lê çi heye ku zarokên "Kurdistana Xeyal" ya ku qaşo kemalîstên nîjadperest binerd kiribûn, hinekî dereng be jî bi xwe hesiyan û xwîsiya kemalîstên kolonyalîst di qirika wan de hiştin.

Bi rastî jî, gava ku mirov li tevgêra dîroka ronakbîriya me ya salên nêzîk yên piştî heştêyî bi hemû aliyên wê bi rêk û pêk analîz dike, mirov dibîne ku careke din Celadet Bedir-Xan li ser dika kulturê di nav kar û xebata ronakbîrên me de bi hemû heybet û têgihiştina xwe tê xuyakirin. Mirov dikare bibêje ku ev xuyakirina wî ya li ser dika çanda me ji serdema saxîtiya wî bêtir bi kêfxweşî ji aliyê ronakbîrên me hate pêşîwaz kirin.

Baş e, mirov dikare çawa vê yekê ronî bike? Divê bê zanîn ku gelek ronakbîr piştî ku ji vê dinya me bar dikin, qedr û qîmetê wan tê zanîn. Mirov dikare ji bo zelalkirina wê gelek sedeman bi rêz bike û li ser wan raweste. Sedema pêşî ya ku tê bîra mirovî ev e: Pirsgirêkên me yên netewî û civakî yên ku Celadet Bedir-Xan di jiyana xwe de hewl da ku li ser wan raweste, piştî mirina wî bi dehên salan ronakbîrên me bi girîngiya wan hesiyan û dîtin ku çareserkirina wan pirsgirêkan ji bo pêşeroja netewa me bi reng jiyanî ne. Ji bo vê yekê jî, ronakbîrên me yên ku piştî salên heştêyî ji ber

barbariya cûnta kolonyalîst derketin derveyî welêt bi qedr û qîmetê kar û xebata Celadet Bedir-Xanî ya bi kulturî hesiyan û bi bayê bezê xwe li dore wî dane hev, lê bi yek alî. Ji ber ku têkoşîna Celadet Bedir-Xan ya polîtîkî neheta bîra wan!

Bi rastî jî, gava ku mirov îro li nav rûpelên kovar û rojnameyên ku ji alî ronakbîrên me ve têne derxistin, dinere, mirov liqayî nivîsên ku li ser jiyana gorbihiştî ya rengîn têne nivîsandin, tê. Ji vê yekê wirdetir, berhemên gorbihiştî ji nû ve têne çapkirin. Ango ew bi kulturmendiya xwe ya dewlemend û payabilind ji nû ve li ser dika kultura me mîna heyva çardehan li me dihile.

Beriya ki mirov li ser jiyana Celadet Bedir-Xanî bi rêk û pêk mijûl bibe, divê ku mirov hinekî li ser guhertinên dîrokî yên ku di welatê me de têne pê, raweste. Ma gelo îro li welatê me çi guhertin li dar in, ku ronakbîrên me li Celadet Bedir-Xanî vedigerin? Bêguman, di van deh salên dawî de li welatê me çi di warê kulturî û çi diwarê siyasî de guhertinên gelekî payebilind hatine pê. Pêlên welatperweriyê di nava rafên gelê Kurdistanê yên ji hev cuda de mîna pêlên Firat û Dicleyê bilind dibin. Li derveyî welêt jî pirsgirêka gelê Kkurdistanê çi di warê diplomasî û çi di warê demokratîkî de ji demên berê bêtir aktuel bû. Bêguman, gava ku mirov di vê perspektîfê de li ser jiyana Celadet Bedir-Xanî mijûl dibe, mirov dibîne ku wî her hewl daye ku sentezeke ramanî ya dema xwe li dar bixe. Pirrê caran unsurên vê senteza ranamanî bi mirov mîna jiyana ronakbîrî ligel hemû rengîbûna wê tê xuyakirin. Di bingehê xwe de ev yeka ha weha nayê pê. Ji ber ku ronakbîr di serpêhatina jiyana xwe ya civakî de gava ku bûyerên dîrokî yên serdema xwe analîz dike û hinek encaman ji wan derdixe, bi tenê bi alîkariya bîr û baweriya xwe nagihê van encaman. Mîna ku tê zanîn, bîr û baweriya her ronakbîrî di nav çerçeweke netewî de tê pê. Bi vî awayî jî, dibe mal û milkê hemû kesên ku di civata ronakbîrî de dijîn. Ji bo vê yekê jî, encamên ku ji aliyê ronakbîrî ve herine destnîşankirin, bivê nevê bala mirov dikişînin.

Vêca, heger ku mirov vê yekê li dorbera ramanên Celadet Bedir-Xan bi awayekî rê û pêk şirove bike, mirov ê bibîne bê çima kar û xebata Celadet Bedir-Xan ya ku li dorbera ramanên wî hatine lidarxistin, ji bo pêşeroja welatê me çiqasî girîng in. Ji ber ku ji du sed salî vir de pirsgirêka me ya herî girîng ew e ku welatê me ji bin nîrê kolonyalîzmê were rizgarkirin. Bêguman bav û kalên me ji bo çareserkirina vê pirsgirêka netewî gelekî bedelên giran dane û hê jî em didin. Lewra, îro jî ev pisrgirêka me ya netewî bi hemû dijwariya xwe serê dewletên dagirker têşîne. Gava ku mirov ji vî alî ve li ser berhemên Cela-

det Bedir-Xan mijûl dibe, mirov bi hêsanî dibîne ku kar û xebata -çi ya kulturî û çi ya polîtîkî - Celadet Bedir-Xan ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê hatiye li dar xistin. Ji bo vê yekê jî, heta ku ev pirsgirêka me ya netewî neyê çareserkirin, dê ramanên Celadet Bedir-Xan her bijîn. ❑

Koç û koçberî

Kpêxîla kurdan bernade, bi taybetî jî di pêvajoya şer û serîhildanan de her tim kurd hewcedarî koçberiyê dibin. Lê koça mezin koça van salên dawiyê ye. Şewitandina bi hezaran gund, zilm û zordariya li ser gundiyan ew hewcedarî koçberiyê kirine. Silêman Demir jî koçek ji van koçên dawiyê kiriye mijara kitêba xwe. Xelo, ku qehremanê romanê ye û dengbêjê herêmê ye bi du pismamên xwe re, perçeyek dilê xwe, yanî welatê xwe li dû xwe dihêlin, pêşî diçin Stenbolê û ji wir jî xwe digihînin Almanyayê. Ev koça Xelo ji ber şaşî û zilma Gur e. Gur berpirsiyarê "Siwariyan" yê herêma Botan e. Lê zalim e, bi zalimtiya xwe di herêmê de nav daye. Xelo û pismamên xwe gund ji zilma wî re dihêlin û diçin. Diçin, lê ji problem û berberiyan xelas nabin. Bi hev dikevin, ji hev dixeyidin, bêriya welêt dikin; carinan kul û keserên xwe bi stranan ditemirînin. Lê venagerin...



Silêman Demir
KOÇ
Weşanên Roja Nû

Peyxamberê Ummetê Hz. MUHEMMED

ZEYNELABIDÎN ZINAR



Berî niha bi du-sê hefteyan pirtûkek bi navê "Peyxamberê Ummetê Hz. MUHEMMED" ji aliyê kovara Nûbiharê ve bo min diyarî hatibû şandin. Dema ku min pirtûk vekir û rûpelên wê di ber çavan re bihurandin, ew gotina Xwedayê dilovan ku gotiye ango wî ji her miletî pêxemberek rakiriye û pê erênî û neyêniyên xwe bi zimanê wî miletî daye diyarkirin, dîsan di mejiyê min de geredor bû.

Pirtûk çawa ku bergê pêşî di wêne de jî tê dîtin, ji kaxezê sipî û ji bergekî nermik hatiye holê, tevek 190 rûpel e. Tê de pênc beş hene, her beşek ji çend xalên cuda pêk hatiye. Pêşgotina nivîskêr jî du rûpel in.

Zimanê pirtûkê gelekî zelal, safî û paqij e. Dema ku mirov dest bi xwendina wê dike, bi rastî jî mirov naxwaze dev jê berde, ji ber ku heta niha kêm pirtûk bi vî rengê han û bi vê naveroka dewlemend hatine amadekirin. Giringiyeke wê ya taybetî ew e ku ev pirtûk mifteya bi dehcildan pirtûkên *Siyerê* ye. Ev yek diyar e ku heta niha tenê feqe, mele, şêx û kurdên ku bi zimanê erebî dizanibûm, ageh ji vê naveroka dewlemend hebûne. Lê niha êdî her kurdek bi saya vê pirtûkê dikare jiyana Mihemed Pêxember ji berî pêxembertiya wî hetanî dawiya pêxembertiyê bixwîne û serpêhati-

ya wî bizanibe û ku ka çi bûyer lê rûdane, wî pêxembertiya xwe çawan li dinyayê belav kiriye û siqûmatên ku lê çi ciriyane bi tevekan serwext dibe.

Ez li vê derê dîtina xwe ya şexsî li ser naveroka pirtûkê pêşkêşê xwendevanan nakim, lê ez ê hemû xalên naveroka pirtûkê binivisînim û pêşkêşê wan bikim. Piştre bila ew biryara xwe li ser bidin û kêşana wê ya giranbihatiyê bidin diyarkirin. Naverok ev e:

- "Pêşgotin/ Destpêk."
- "BEŞA YEKEM, JIYANA BERÎ PEYXAMBERTIYÊ: Wîladet/ dema şîrmijandinê/ bûyerek xerîb/ wefata dayîka wî/ sefera Şamê/ xortanî û jiyana kar/ zewaca wî bi Xedîce re/ peymana qencan (Hulfulfudûl)/ beşdariya Avakirina Ke'ba Şerîf."

"BEŞA DUYEM, JI PEYXAMBERTIYÊ HETA HICRETÊ: Gerdûna Mirovan û Peyxambertî/ Nîşanên Peyxambertiyê/ Destpêka Wehyê/ Destpêka De'wê/ Misilmanbûna Xedîce/ Misilmanbûna Elî kurê Ebû Talib û Zeyd Kurê Harîse/ Misilmanbûna Ebûbekir/ Eşkerekirina De'wê/ Înada Qureyşiyan/ Bazara Qureyşiyan Bi Ebû Talib re/ Îşkence û Neyartî li Peyxamber/ Îşkence li Misilmanan/ Siyaseta Lihevhatinê û Bazarî/ Hicreta Hebeşîstanê/ Misilmanbûna Hz. Umer/ Vegera Misilmanan ji Hebeşîstanê/ Ambargo/ Wefata Ebû Talib û Xedîce/ Zewaca Peyxamber bi Sewda Amirî re/ Peyxamber û Gelê Taîfê/ Misilmanbûna Filehên Hebeşîstanê/ Îsrar û Mî'rac/ Peyxamber De'wa xwe Pêşkêşî Qebîlan Dike/ Destpêka Misilmanbûna Ensariyan/ Gelê Medînê/ Bey'eta 'Eqebe I/ Bey'eta 'Eqebe II/ Hicreta Medînê û Pîlana Şeytanî/ Kutrebêjiya Karê Peyxamber li Mekkê."

"BEŞA SÊYEM, AVAKIRINA DEWLETA ÎSLAMÊ: Bingeha Civak û Dewleta Îslamê/ Wesîqa Medînê û Metna Wê/ Guhertina Qîblê."

"BEŞA ÇAREM, MUCADELA PARASTINA CIVAKA ÎSLAMÎ Û CÎHAD: Destûra Cîhadê/ Destpêka Cîhadê/ Rojiya Remezanê û sedeqa Fitrê/ Ferzbûna Zikatê/ Herba Bedrê (Roja Furqanê)/ Biratiya Dînî ser Biratiya Nesebê re ye/ Nezra Ebû Sufyan/ Xiyaneta Cihûyan/ Herba Qeynûqiyan/ Kuştina Ke'b Kurê Eşref/ Herba Uhudê/ Di Rêya De'wê de/ Bêbextiya Nedîriyan/ Herba Necdê/ Herba Muste'lîqîyan/ Bûyera Ifkê/ Herba Xendekê/ Herba Qureyşiyan."

"BEŞA PÊNCEM, FETH Û FÊKIYÊN DE'WÊ: Aşîtiya (Sulha) Hudeybiye/ Axaftinên Aşîtiyê/ Wesîqa Aşîtiyê/ Gerîllayên Misliman/ Aşîtî bû Serkeftin/ Fetha Xeyberê/ Nameyên Peyxember (s.x.l.) ji Serokên Cîhanê re/ Qezakirina Umrê/ Herba Mûteyê/ Fetha Mekkeyê/ Herba Huneynê/ Herba Taîfê/ Herba Tebûkê/ Munafiq û Mescida Dîrar/ Ferzbûna Hecê/ Mislimanbûna Gelê Taîfê/ Di

Mislimanbûnê de Bazarî Tune ye/ Mislimanbûna Qebîlên Ereban/ Mislimanbûna 'Ediy Kurê Hatemê Taî/ Mebûsên Peyxamber (s.x.l.)/ Heca Peyxamber (s.x.l.)/ Xudba Xatirxwestinê/ Nexweşiya Peyxamber (s.x.l.) û Wefata wî.", "Bibliyografya."

Pêşgotina nivîskarê pirtûkê birêz Evdilhadî Botî

"Di şeşê zayînê de Erebistanê di derqûşa xwe de zarokek wisa mezin kir, ewî bi de'wa xwe ji nû ve heyat da dinyayê. Ronahiya de'wa wî, beşeriyet bi çav kir da ku pêş de here, tarîtî û ronahiyê, rastî û şaşîtiyê ji hev veqetîne.

Ev meriv, Peyxamberê ummetê Hz. Muhemmed (s.x.l.-silava Xwedê li ser be) bû. Dunyayê; biratî, wekhevî, azadî, dadmendî, izzet, şeref û her cûre qencî bi wî nas kir û ji wî hîn bû. Feqîran bi wî rêya dewlemediyê dîtin. Koleyan azadî bi wî nas kirin. Cahilan navê xwendin û ilmê ji wî seh kirin. Mirovên di şaşîtiya ramanî û exlaqî de noq bûbûn, bi wî ji xeniqandinê xilas bûn. Zarok û piçûkan, merhemet û hezjêkirin li bal wî dîtin. Jin bi wî gihaştin şeref û izzeta xwe û bi wî ji koletiya mêran azad bûn. Dewlemend û xwedîhêzan, feqîr û bêkes bi wî nas kirin... Welhasil, qenciyên wî li beşeriyetê bêhed û bêhesab in.

Ew, zilamê her cûre jiyana însaniyetê bû, zilamê heyata dînî, civakî, aborî, leşkerî, siyasî û hwd. bû. Ewî mecra tarîxê guherand. Dunya heta îro di bin bandûra hereket û de'wa wî de ye û wê heta qiyametê jî wisa dewam bike.

Divê were zanîn ku ev raman û prensîb ne mehsûlê jîrîtî, zeka û dahîtiya Muhemmed (s.x.l.-silava Xwedê li ser be) tenê bûn. Evana digel vê, bi bêhtirî mehsûlên wehyê bûn. Mezinahiya Peyxamber (s.x.l.-silava Xwedê li ser be) bi wehya ku nazilê ser dibûye. Ji lewra ew ne meriveki mîna me gunehkar û marûzê xeletiya ne û ne jî jibilî beşeriyetê di meqameki dîtir de ye.

Ji bona vê giringiya şexsiyeta Hz. Muhemmed pêwîst e ku mirov tevde li ser naskirina wî bisekine û jiyana wî ji xwe re mînak bigire. Bi taybetî mirovên bawerî pê anîn, û ew ji xwe re peyxamber qebûl kirine.

Gelê kurd heta îro Peyxamberê xwe Hz. Muhemmed, bi sehkirin û bi guhdarkirinê nas dike, xusûsen li ser jiyana wî nesekiniye û bi zimanê xwe jiyana wî nexwendiye. Ev heqîqeteke pir tehl e ez dibêjim, lêbelê va ye êdî wê kurd jiyana Peyxamberê xwe bi zimanê xwe bixwînin û wê bi zimanê xwe vî şexsiyetê giring nas bikin. Lêbelê gerek e were zanîn ku ev ne qenciya min e, min tenê wezîfa xwe kiriye. Ev di heqîqetê de qenciya *Nûbiharê*ye...

Erê rast e ku mirov eger bi zimanekî ku pê nizanibe perestinî ji Xwedê re bike, ew perestiniya mirov li haşê diçe û winda di-

be, tenê zehmetiya mirov bi mirov dimîne. Herweha eger perwerdekirina olî jî ku ne bi zimanê mirov bête kirin, mirov hîç pê serwext û zana nabe.

Ev pirtûka han mirov pir disêwirîne ku çima nivîskarê wê birêz Evdilhadî Botî zehmet daye xwe û jiyana pêxemberê dawîn Hz. Mihemed bi zimanê kurdî/devoka kurmancî û bi tîpên latênî pexşende kiriye.

Ev pirtûk girîng e, hem jî pir girîng e. Bi baweriya min, ne tenê ji bo kurdên bisilman, herweha ji bo kurdên Fileh, Êzîdî, Cihû û Elewî re jî girîng e. Ji vê zêdetir, ji ber ku tê de gelek çavkanî hene ku ji bo lêkolînvanan jî pêgirîne girîng in.

Di pirtûkê de hin peyam jî bo neteweyên Bisilman xasma jî ji bo van welatên ku welatê zimanê pirtûkê di navbera xwe de dabeş kirine re hene. Weke:

a) Mirov dikare ola xwe bi zimanê kurdî jî bixwîne û Xweda, Pêxember û tiştên olî fêr bibe.

b) Zimanê kurdî jî şan û şerefeke Yezdanê mezin e ku li Rojhilata Navîn Neteweyê wî di binê destên çar dewletên bisilman de dîl maye û weke ku bêje: De fermo, binerin, ev naveroka girîng bi vî zimanê qedexekirî hatiye nivîsandin!

c) Xwedîderketina li zimanê kurdî, ne tenê êdî berpirsyariya rêxistinan, ya siyasetmedaran, ya kesên çep û bêolan e, lê ew berpirsyarî êdî ketiye ser milên kesên oldar jî. Wek nimûne, ha ev pirtûk û gelek Evdilhadiyên bawermendên din jî.

Pirtûk bi hostatiyeke pir mezin hatiye amadekirin. Hevokên wê gelekî kurt, bêjeyên zelal, naverokeke bê xişûxal û ji bêjeyên rojane ku ew hertim ji aliyê xelkê ve têne bikaranîn hatiye hazirkirin.

Ji aliyekî ve kêmasiyên pirtûkê jî hene ku hêja ye mirov behs bike weke ya daçekan û ya rastnivîsandinê ku hindik be jî xwe tê de didin eşkerekirin. Yeke din jî ev e ku nivîskêr hin bêjeyên erebî bi kar anîne, lê wî dikaribû eynî wate bêjeyên kurdî nivisandibûna.

Tiştê zêde ku bala min kişandiye ev e: Ji paşnavê nivîskêr diyar dibe ku ew ji herêma Botan e. Lê wî devoka Botan tê de bi kar neaniye û wek Rêzimana Medresê libikiye.

Em bi dil û can nivîskarê hêja birêz Evdilhadî Botî pîroz dikin û di kar û xebatên wî de serkeftinê dixwazin. ❑

Kurdên Stenbola kevin

MEHMET AKTAŞ

Carina mirov lêkolînekê an jî pirtûkeke dîrokî, wek romaneke çawa diherike, wisan dixwîne. Berhemên dokumenter yên wisan, li gel babetên balkêş, bi uslubên xwe yên heweskar ve mirovan di nav rûpelên xwe de girtî dihêlin.

Min pîrtûka Rohat Alakom ya nû: "*Kurdên Stenbola Kevn*" (Eski Istanbul Kürtleri) bi hîseke wisan ve xwend. Rohat Alakom di dîroka bajarê Stenbolê de pey şopa kurdan ketiye û di bajarekî efsunkirî de nasiya me dide dîrokeke kurdan ya veşartî, me bi hev dide nasîn. Di talde û nepeniyên dîrokî yên Stenbolê de em rastî Elî Şamîl Paşayê Bedirxanî, Hecî Qadir Koyî, Pîremêrd, Seyîd Evdilqadir, Seîdê Kurdî û gelek şexsiyetên nejibîrkirî yên dîroka me tên.

Dema gera me ya dîrokî di nav rûpelên pirtûkê de berdewam dike, di qewexaneke kurdan li taxa *Sirkeciyê* em bîna xwe derdixin. Li hemberî me bi hemû heybeta xwe ve Zaro Axa sekiniye...

Dema em li Boxazê (Bosporê) li pey şopa kurdan dikevin, berbi Kabataşê dimeşin, em rastî zarokekî eşîrê yê sermakirî tên.

Bi saya rêberiya Rohat Alakom, ew bendên dildariyê ku di navbera me û Stenbolê de hene, bi zad-xwarinên dîrokî ve xurt dibin.

Belê! dema em pirtûka "*Kurdên Stenbola*

Ahmet Cemil Asena, sernivîskarê *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesiyê* bû, ku di sala 1908an de li Stenbol derdiket.

Mehmet Mihri Helav, berpirsiyarê rojnameya *Kurdistanê* bû, ku di sala 1919an de li Stenbolê derdiket

Kevn" dixwînim, em tenê dîroka "*ne-resmî*" ya Stenbolê naxwînin, wisan jî em naveroka gotinên Apê Musa (Musa Anter): "*Ava Firatê diherike Marmarayê dibe*" (Firat Suyu Marmara'ya Akar) baştir fam dikin.

Di her çilqê edebiyata tirkî de bi temamî "Pirtûkxana Stenbolê" heye. Ev bajarê muhteşem, hertim ji bo nivîskaran, helbestvanan bûye yek ji wan xalên balkêşiyê

Ew bajarê xewn-xeyalan yê ku xweyê heft giran e, ne tenê bi boxazên xwe, bi behrên xwe, bi dîroka xwe ya dewlemend, wisan jî, bi rûçikê xwe yê "*pir-çandî*" (multikulturel) ve tê naskirin.

Nostaljiya Stenbolê hertim ji bo edebiyata tirkî bûye yek ji wan babetên hezkirî. Aliyê Stenbolê yên din wek derbajar (taşra) hatiye hesibîn.

Lê belê nivîskarên kevn û nû, ev struktura "*pir-netewî*" ya Stenbolê înkar kirin. Halbukî ji *Dîyarê Rûm* vir de, ev bajara bi temamî wek bajarekî "*Deriyê Qewman*" hatiye hesibîn. Avakarên bajêr hurim bûn, paşê ermenî, aArnavud, çerkez, cihû, qereçî, ereb û bêguman kurd bûn...

Ji ber sedemên tên zanîn, "*rûyê qemer*" yê vî bajarî, ango aliyê Stenbolê yê kurd hertim nehate xwestin ku bê dîtin.

Aliyê demografîk yê bajêr derkete ronahiyê, ev yeka ne tenê bîna Komara Tirkiyê, bîna ronakbîrên tirk jî teng dike. Tu dibêjî dema ev aliyê Stenbolê derkeve ronahiyê, hemû efsûna bajêr wê bê belav kirin.

Gelek dewlemendiyên bajêr yên etnîkî ku bîn û hebûna bajêr pêk tînin, hatin inkarkirin an jî bi kêmanî û xeletî hatin vegotinê.

Halbukî tiştê ku bajarekî jîndar dike, wî

bajarî baş û xirab dike, bi piranî mirovên wî bajarî nin in?

Ji ber vê yekê xebata Rohat Alakom ya bi navê *"Kurdên Stenbola Kevn"* ji navnasa (identity) Stenbolê re berhegekî gelek nû bi dest dixe.

Ev xebata, hafiza vî bajarî ya dîrokî dewlemend dike û li ser Stenbola jîndar ji nû ve îmkana fikirînê dide me. Bingehên dîrokî yên keserkişandina me ya bi meqema *"Kurdi-ül Hicazkar"* jî derdixe holê.

Angorî wan çavkaniyên dîrokî yên ku Rohat Alakom bi kar anîne, macera kurdan ya Stenbolê, tam 546 berê bi *"Fetha Stenbolê"* ve destpêkiriye. Gundên kurdan yên pêşin Danişmendlu, Depeviran û Işikli di vê dewrê de tên avakirin.

Berê ew di dawiya koçên di nav sînorên Imparatotiya Osmanî de tên cîwar dibin. Kurdên şerkar ku tevî şerên Imparatoriyê bûne û ulemaya kurdan wan teqîp dikin. Lê belê koçberiya kurdan ya bingehîn berbi Stenbolê, di dawiya sirgûn û koçên piştî tevkuştin şer û berxwedanên netewî li Kurdistanê, derdikevin holê.

Kesên ku ji bo bajêr :*"Kevir û erdê wî zêr e"* dibêjin an jî hejmara kesên ku bi armanca xwendinê ji her koşê Kurdistanê hatine bajêr jî, her diçin zêde dibin.

Ji ber vê yekê hejmara nifûsê kurdan ku di destpêka sedsala 20'an de li Stenbolê 30 hezar kes tê texmîn kirin, di dawiya vê sedsalê de digihêje 3 mîlyonan.

Angorî lêkolîna Rohat Alakom, kurd piştî serhildanên ku di destpêka sedsalê de pêk hatine, di salên avakirina Komara Tirkiyê de wek pêlan bi armanca cîwarbûnê koçî Stenbolê dikin.

Di salên 1950'yî û 1990'î de kurd bi kîtlevî tên Stenbolê. Bê guman ev koçberiyên dawîn bi polîtîkaya şerê qirêj ku bi destê dewleta tirk li Kurdistanê pêk tê, raste-rast bi wê ve girêdayî ye.

Stenbolê ji ronakbîriya kurdan û ji pêkhatina nasyonalîzma kurdan ya modern, heta îro roleke giring lîstiye. Rohat Alakom di lêkolîna xwe de cîhekî mezin dide vê babetê jî.

Em di lêkolînê de ji mamosteyê Padîşahê Osmanî-Fatîh Sultan Mehmed, Melle Goranî bigre heta Bedirxaniyan macereya gelek ronakbîr û şexsiyetên kurd yên giring bi baldarî dixwînin.

Li gel Mekteba Eşîretê ku ji aliyê Siltan Evdilhemîd de hatibû vekirin û derbarê sazgehên ku bîzzat ji aliyê kurdan de saz bibûn, di vê pirtûka bi navê *"Kurdên Stenbola Kevn"* de zaniyarî û agahdariyên têra xwe hene.

Lêkolînvan Rohat Alakom, di dawiyê de digihêje wê baweriyê ku çawa îro, wisan jî di rabihur de, Stenbol bûye navendeke giring ya nasyonalîzma kurd.

Babeta *Cimaeta Hemalên Kurd* li Stenbolê yek ji wan beşên balkêş yên pirtûkê pêk tîne, hejmara wan di destpêka sedsala me gihiştiye 10 hezaran.

Ew beşa ku qala maceraya hemal Zaro Axa dike bi temamî wek jîndariya çîrokekê ye. Zaro Axa li cîhanê wek mirovê herî kal hatiye hilbijartin.

Rohat Alakom çavkaniyên kurdî, tirkî û biyanî yên ku nivîskar xwe gihandinê, şe dike û vê lêkolînê pêşkêşî xwendvanan dike.

Abdullah Cevdet û jina xwe Fatma xanim. A. Cevdet berpirsiyarê kovara *İçtihat* bû ku piraniya hejmarên wê li Stenbolê derketine.

Dema vî karî pêk tîne, ew jî wek her lêkolînvanekî kurd ku rastî dijwariyan tê, para xwe ji van dijwariyan digre. Bêguman pirtûk bi serê xwe têra derxistina sûretê serboriya 500 saliya kurdan nake. Lê belê ev pirtûka Rohat Alakom ji bo derxistina holê ya vî sûretî, bêguman wê roleke nifte (kilît) bilîze.

Rohat Alakom di lêkolîna xwe de nêrîneke giring jî dubare dike. Lêkolînvan piştî ku gelek zaniyariyan dinirxîne, digihêje vê nêrînê: "*Stenbol li cîhanê bajarê kurdan yê herî mezin e*". Rohat Alakom; argumanên dîrokî yên dîtinên akademîsyenên kurd wek Mehard Izady û Ahmed Ozer ku dibêjin: "*Li Stenbolê 3 mîlyon kurd hene*" jî, di vê xebata xwe de derdixe holê.

Nivîskarê "*Kurdên Stenbola Kevn*" di vê xebata xwe de wisan jî mizgînîkê dide me. Babeta xebata wî ya piştî vê lêkolînê, wek nivîskar dibêje wê bibe: "*Kurdên Stenbola Nû*". Çimkî ew lêkolîna wî ya ku hatiye weşandin tenê ji serboriya kurdan ya ji sala Fetihkirina Stenbolê 1453 heta sala 1925'an pêk tê.

Bêguman ev xebata wî ya nû jî wek ya pêşin wê bala xwendevanan bikşîne. Di vê navberê de divê vê yekê jî bêjim. Pirtûka "*Kurdên Stenbola Kevn*" ji bo nivîskar xaleke vegerê ye. Di van salên dawîn de Rohat Alakom îmza xwe avîtiye gelek xebatên balkêş. Rohat Alakom di vê xebata xwe de lazim e em bêjin ku gihiştiye zimanekî akademîk yê ku zêde kemaltir e.

Belê, pirtûka Rohat Alakom ya bi navê "*Kurdên Stenbola Kevn*" ne tenê hafiza me dewlemend dike. Pirtûk, ji xebatên derbarê dîroka kurd û tirkan re jî alîkarîke giring pêşkêş dike. Ew "*çoyê kurd*" ku Rohat Alakom xistiye nav sîtila Stenbolê, çawa ji bo Stenbolê wisan jî derbarê dîroka kurd û tirk de giringiyeke wê heye. ❑

Rohat Alakom
Eski İstanbul Kürtleri (1453-1925)
Weşanên Avesta, 1998, Stenbol

Granatäppelblomning

INGMAR BJÖRKSTÉN

Zêde naye nasîn, lê li belediya taxa Stockholmê, Sundbybergê, bi xurtî, avahiyeke edebî ya tijî huner, ku edebiyateke neteweyî ava dike, pêk tê. Û neteweyek ku di nexşan de navê wî nîn e, bi tenê navekî yekgirtî ye, Kurdistan -li Rojhelata Navîn navçeyekî çiyan- navçeyek ku



çemên Firat û Dicleyê jê dizên û tê re diherikin, çiyayê Araratê ku keştiya Nûh lê venişt û meriv divê ji bîr neke, tovên yekemîn ên medeniyeta Rojava tê de hêşîn hat.

Kurdistan. Li vî welatî "Gelê kurd" ku şagirtê Sokrates Xenefon di "Anabasis" de qal dike, kêmanî ji 300 sal beriya Îsa û vir ve dijî. Lê ev gelê ku bi zimanê xwe yê Îndu-awrûpayî dipeyive, hîç wextekê yekîtiya welat û neteweyî pêk nehaniye. Malwêraniya kurdan ev e. Ji ber vê yekê Kurdistan ne realiteyeke polîtîk e, bi tenê navê xewnekê ye ku di demên dawîn de derketiye pêş. Axa kurdan, cografîk, piştî ku destbilatiya Osmaniyan bi dû şerê yekemîn ê dinyayê re têk çû, di navbera Tirkiye, Îran, Irak û Sûriyê de hate perçekirin.

Di nav van dewletên ku hatine çêkirin de ya herî êrîşker û nasiyonalîst Tirkiye ye. Li Turkiyê desthilat zahf, bi

xwîn, bi bîr û baweriya Hegel, miletek-dewletek, bawer in. Kesê ku vekirî gotina Kurdistan bi lêv dike, xwe davêje nav xetera cezayên xedar. Tevî ku li Tirkiyê bi qasî heyşt milyon kurd -ku ne tirk in, ne jî ereb- dijîn, retorika resmî ya Tirkiyê hebûna kurdan jî qebûl nake û bi derewên tirkî yên *newspeak a la Orwell* kurdan mîna "tirkên çiyayî" bi nav dike û ji holê radike. Wisan xuyaye ku dinya jî, Swêd tê de, îro bala xwe nade vê realpolitika tirkî ku bûye sebeba hilweşandin, zulim û koçkirina gelê kurd. Diyar e, Yogoslavya kevn hîn nêzîktirê me ye!

Lê Tegner di dema zaferên Napolyon de nîşanî me dabû; tiştê ku şîdet diafirîne, şaş û temenkurt e. Li milê din tiştê ku gotin diafirîne dikare di bîr û heşê merivahiyê de bête neqişkirin. Mehmed Uzun, kurdekî ji sed hezaran kurdên ku realpolîtîka tirkî kiriye penaber, yek ji hosteyên avaker ên edebiyatê ye ku bîr û heş (tarîxê) diparêze. Ji bîst salan û vir ve, ew li Swêdê dijî, li Sundbybergê. Uzun li Swêdê, bi herdu zimanên xwe, kurdî û tirkî, tevî hevalên xwe yên etnîkî û yên bêgav, bi xurtî, dixebite û bi berhemên xwe alîkarî dike da ku Kurdistan bibe xwediyê edebiyateke bedew a bi kalite.

Lîsta berhemên Mehmed Uzun, ku li dora 50 salî ye, her gav bi roman û ceribandinên nû dewlemendtir dibe. Par weşanxana swêdî Ordfrontê ji bo wî û ji bo ehlê swêdî ku li pey kuştina Palme û sûcdarkirina PKK, li dijî kurdan bû, xizmeteke mezin kir û "Granatäppelblomning," (Gulên hinaran) ku ceribandinên li ser vegotin, hesret û janê ne, weşand. Ev, kitaba yekemîn a Mehmed Uzun e ku bi swêdî diweşe. Navê kitabê, semboleke musîkî û bi aheng e ku gelek tiştan dibêje.

Di kitabê de Uzun behsa wezîfa herî muhîm a edebiyatê dike; ew xwendevanên xwe yên swêdî -ez hêvîdar im ku ew gelek in- hildigire û dibe cîhana xwe ya heremî ku bi alîkariya bîr û heş, ji nû ve hatiye afirandin û li wir ew aliyên global ên vê cîhanê nîşanî me dide; cîhana ku ya me tevan û hemû merivahiyê ye. Kitab bi sûret, hîs, pejn û rewşan ku perçeyên mîraseke kulturî ne, tijî ye ku em hemû dibînin ku bi zulim, zordarî û asimilasyona li ser kurdan, bi taybetî li Kurdistana Tirkiyê, roj bi roj winda dibe. Uzun di eynî wextê de li pey dewrên windabûyî ye jî. Keser û huzina mîrasên ku winda dibin, pexşana Uzun a poetîk, seranser, dadigirin. Zimanê wî alikariya wî dike ku ew bikaribe jiyanine edebî bide tiştên ku li ber xetera windabûnê de ne; welat û axa bedew a kurdan hê berî ku ew welat bi navê Kurdistanê bi nav bibe, berî ku diz û keleşên tirkan sala 1071'an werin û rê li tirkên din Osmaniyan, ku li dora 1300'an hatin, vekin, kurd lê dijiyan û diçandin.

Tevî van êrîşên tirkan, kurd, kurd man û li ser axa xwe mîna kurd jiyan. Ev yeka hanê heta şerê cîhanê ê yekemîn û têkçûna dewleta Osmanî dewam kir. Avakerê dewleta Tirkiye Kemal Atatürk, bi nasyonalîsmeke zahf xurt, di salên 1920'an de, Anatoliya kurdan xiste nav Tirkiya "xwe."

Nivîskariya Uzun, nesîra wî ya poetîk hêz û quweta xwe ji welatê kurdan, çanda wan a hezar salan werdigire ku îro desthilatên tirk ku bi nasyonalîsmeke xedar, pê lê dikin û diperçiqînin.

....

Ji *"Nässlorna blomma"* [1] û vir ve tu nivîsareke edebî ku bi bîr û heş hatiye avakirin, mîna nivîsarên xurt ên poetik û zimanê -herweha wergera Claire B. Kaustell û Ulla Roseen- harmonîk û bi musîkê hûnandî yê kitaba Uzun *Granatäppelblomning* evçend bi xurtî tesîr li min û hîsên min nekiriye. Hê di destpêka kitabê, ceribandina yekemîn Granatäppelblomning de ku navê xwe daye kitabê, ev xurtî diyar dibe. Ceribandin cîhanekê berpêşî xwendevan dike ku xwendevanên swêdî nas nakin û neditine. Penaberiya Uzun hîç wextekê reh û rêçên wî di nav tevîheviya do û îro de winda nekiriye. Uzun hêza xwe ya afirînê di nav cîhana kurdî ya do ya windabûyî de û ya ku îro bi darê zora nasyonalîstên zordar winda dibe de peyda dike. Zordar bi desthilatiyeke fanatîk mafê jiyana kurdan ji destê wan digirin, lê ew nikarin xwe bi ruhê çanda kurdî bigihînin. ❑

[1] Nässlorna blomma, 1944, romana nivîskarê swêdî Harry Martinson e. Martinson sala 1974'an, tevî Eyvind Johnson, xelata edebî ya Nobelê girtiye.

Ingmar Björkstén, 62 salî, nivîskar, rojnamevanê çandî, şefê çandî yê rojnama Svenska Dagbladet, 1981-1991, kulturataşê Swêdê li Washingtonê, 1991-1995.

Kurdiskt författarskap och kurdisk bokutgivning

Ev kitêba M. Tayfun bi zimanê swêdî ye û li ser nivîskariya kurdî û weşanên kurdî yên ku li swêdê derdikevin e. Mîna tê zanîn, Swêd yek ji welatên cîhanê ye ku herî pir kitêbên kurdî lê hatine weşandin. Tayfun, bi kurtî dîroka kurdan, sebebên hatina kurdan ya Swêdê, rewşa ziman û edebiyata kurdî û bi statîstîkî wêneyekî weşanê kurdî li Swêdê radixe ber çavan. ❑

M. Tayfun
Kurdiskt författarskap och kurdisk bokutgivning
Weşanên APEC

Cûreyên nûçeyên rojnamegeriyê

Herçiqas kurd bêdewlet bin û herçiqas zimanê kurdî bi demên dirêj di bin nîrê zordestiyê de mabe jî, dîsan kurdan hewl dane ku kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî derxin û zimanê kurdî bikişînin qada çapemenî û entelektueliyê. Mîna tê zanîn bi kêmanî ev sed sal in ku kurd bi amatorî vî karî dimeşînin. Lê van salên dawiyê, bi pirbûna kovar û rojnameyên kurdî re ber bi profesyonalîzmê hin gav têne avêtin. Loma, êdî di warê teorî û cidiyeta vî karî de jî hin xebat têne kirin. Yek ji van xebatan kitêba Medeni Marsil e. Marsil di vê kitêba xwe de balê dikişîne ser rojnamgeriya kurdî û ilmê rojnamgeriyê bi giştî. Ev kitêba ku bi mînakan rojnamegeriyê, weşanên peryodîk, cûreyên nûçeyan, ferqa nûçe û nivîsên nûçegihaniyê, ferqa meqale û nûçegihaniyê, roportaj û taybetiyên wê û gelek babetên din radiweste, dikare bi kêrî xebatkarên kovar û rojnameyên kurdan were. ❑

Medebi Marsil
Cûreyên nûçeyên rojnamegeriyê
Weşanên APEC

Nalîna Şevê

Herçiqas Seracettin Kirici mîna siyasetvan were naskirin jî, ew ne dûrî edebiyatê ye jî. Lê ew edebiyatê jî bi zimanê kurdî dinivîsîne. Kitêba wî ya şiîran ku gihîştiye me, ew tê de li ser evînê, li ser hêrîkirinê, li ser tenêtiyê û herweha li ser azadî û têkoşîna azadiyê dilê xwe vedike. Seracettin Kirici di şiîreke xwe ya bi navê *Pêla Evînê* de wilo bang evîndara xwe dike:

Kebaniya min
Evîna dilê xemgîn
Were îşev hewara min be
Were îşev agirê dilê min be
Were îşev
Ji nû ve dergistiya min be
Were îşev fermana min be...

Were îşev em bi hev re
Ji nav hîva wê şevê
Di nav pêla evînê re derbas bin.

Nalîna Şevê
Seracettin Kirici
Weşanên Sor

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER HEWESA TE LI SER HELBEST, ÇÎROK, ROMAN, HEVPEYVÎN, LÊKOLÎN, HUNER, SÎNEMA Û HWD. HEBE, PÊŞNIYAZEKE ME HEYE; BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER TU DIXWAZÎ JI TEVGERA HUNER Û EDEBIYATÊ YA HER ÇAR PERÇEYÊN WELÊT HAYDAR BIBÎ Û EDEBIYATA DINYAYÊ YA KEVNAR Û NÛJEN BI ZIMANÊ KURDÎ BIXWÎNÎ, DÎSAN BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

NÛDEM DIXWAZE JI AVAKIRINA EDEBIYATA KURDÎ RE BIBE ALÎKAR, TU JÎ ALÎKARIYA WÊ BIKE, BIBE ABONE!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê/aboneya Nûdemê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek, Skandinavya 280 Sek, Ewrûpa 100 DM, Amerîka, Austaralya û Kanada 50 $.

Nav û paşnav..

Navnîşan..

Vê kartê dagirin û kopya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin.


HAWAR DENGÊ ZANINÊ YE
HAWAR
2
Hejmar 24-57
HAWAR
1
HAWAR
2
Xwe ji zanînê bêpar mehêle!